



K.T

ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

DAÇEK DI DEVOKA SEMSÛRÊ DE

(Nimûneya Deverên Sincik, Aldûş û Kûmîrê)

Haşim ESEN

16711008

Şêwirmend

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mêrdîn- 2019

K.T

ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

DAÇEK DI DEVOKA SEMSÛRÊ DE
(Nimûneya Deverên Sincik, Aldûş û Kûmîrê)

Haşim ESEN

16711008

Şêwirmend

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mêrdîn- 2019

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Daçek di Devoka Semsûrê de (Nimûneya Deverên Sincik, Aldûş û Kûmîrê)” adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- ☐ Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- ☐ Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- ☐ Tezimin/Projemin 3 yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

.../.../...

Haşim ESEN

KABUL VE ONAY

Haşim ESEN tarafından hazırlanan “Daçek di Devoka Semsûrê de, Nimûneya Deverên Sincik, Aldûş û Kûmîrê” adındaki çalışma 20/06/2019 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Bilim Dalında **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği ile kabul edilmiştir.

[İ m z a]

[Doç. Dr. Mustafa ASLAN] (Başkan)

[İ m z a]

[Dr. Öğretim Üyesi Abdurrahim ÖZMEN] (Üye)

[İ m z a]

[Prof. Dr. Abdurrahman ADAK] (Üye)

PÊŞGOTIN

Ji sedsala hijdemîn û vir ve li ser rêzimana kurmancî gelek xebat û lêkolîn têne kirin. Xebatên destpêkê bi piranî ji hêla mîsyoneran ve hatine kirin. Lê belê roja îroyîn ji hêla lêkolînerên kurd ve jî gelek lêkolîn têne kirin û gelek xalên rêzimana kurmancî dibin mijara lêkolînê. Mijara daçekan jî yek ji van mijaran e. Daçek di kurdî de mijareke pir berfireh û dewlemend e. Daçekên kurdî digel fonksîyana xwe ya daçekî bi fonksîyona peyvçekerîyê jî radibin. Bêyî ku em têkevin nîqaşên der barê binavkirin, dabeşkirin, cih û wateya daçekan di vê xebatê de daçek, li gor Baran (2018) hatine dabeşkirin û bikaranîna daçekan di devoka Semsûrê de hatîye analîzkirin.

Ev xebat ji çar beşan pêk tê. Di beşa yekem de, bi giştî qala mijar, armanc, girîngîya lêkolînê, sînor û çarçoveya tezê, rê û rêbazên ku hatine bikaranîn û her wiha astengîyên li ber nivîsîna xebatê hatîye kirin.

Di beşa duyem de, der barê daçek, cureyên wan, wateyên ku didin hevokan, têkilîya daçek û tewangê de bi berfirehî agahî hatine dayîn. Di çarçoveya fonksîyona daçekan ya peyvçekerîyê de jî di derbarê cureyên peyvan yên wekî navdêr, cihnav, lêker, rengdêr, hoker û gihanekan de agahî bi kurtî hatine dayîn û mijar bi mînakên hatine vegotin. Ev mînak ji berhemên edebîyata kurdî ya kurmancî hatine wergirtin.

Di beşa seyem de, bi kurtî qala Semsûrê û devoka Semsûrê hatîye kirin. Piştî bi mînakên ku ji çîrokên gelerî û axaftinên rojane hatine girtin daçek, bi taybetîyên bikaranîna daçekan ya di devoka Semsûrê de hatîye vegotin. Piştî mînakên daçekan ên peyvçekerîyê li gor cureyên peyvan bi mînakên hatine nîşandan.

Di beşa çarem de, xalên hevpar û cuda yên daçekan di navbera kurmancîya standart û devoka Semsûrê de li gor sernavên beşa yekem hatine berawirdkirin. Pêşî xalên hevpar piştî jî xalên cuda yên daçekan hatine diyarkirin.

Di dawîyê de jî sê nimûneyên çîrokan ku her yek temsîla deverê ye cih digire. Di gel pêvekê encamên ku ji tezê hatine derxistin, çavkanîyên tezê û vebijêrên çîrokan hatine nivîsîn.

Di amadekirina vê tezê de piştgirî û alîkarîya gelek kesan çêbû. Di serî de spasîya şewirmendê xwe Prof. Dr. Abdurrahman Adak dikim. Her wiha hevalên min ên hêja Aynur Ili û Şukran Coşkun bi pêşniyazên xwe gelekî alîkariya min kirin, ez

spasîyên xwe ji wan re dikim. Her wiha hevalê min ê ezîz Eyûp Subaşi di pêvajoya amadekirina tezê û ji bo nimûneyên çîrokan yên herêma Aldûşê gelekî ji min re bû alîkar, ez ji wî re jî spasîyên xwe pêşkêş dikim.

Her wiha di serî de spasdarê dayika xwe Hanim Esen, bavê xwe Yusuf Esen û kesên din ku ev çîrok ji min re bi germahî parvekirin û pirsên min bersivandin..

Hevjîna min Dîcleyê û her sê kulîlkên min Solîn, Lîza û Rozayê di amadekirina vê xebatê de sebreke mezin nîşanî min dan. Ji bo ku barê min siviktir bikin hewleke bêhempa xerc kirin. Spasîyeke ji dil û can ji bo her sêyan.



Haşim ESEN

Mêrdîn, 2019

KURTE

DAÇEK DI DEVOKA SEMSÛRÊ DE

(Nimûneya Deverên Sincik, Aldûş û Kûmîrê)

Haşîm ESEN

Li ser zimanê kurdî gelek xebat tên kirin û mijarên rêzimên dibin qada lêkolînê. Daçek jî mijareke rêzimana kurdî ye ku ev xebat li ser hatîye kirin. Pirtûkên ku li ser rêzimana kurmançî hatine amadekirin di warê daçekan ne xwedî perspektîfeke berfireh in. Nivîskarên van pirtûkan yan devoka herema xwe yan jî pirtûkên rêzimên yên berî xwe ji xwe re kirine bingeş. Lewma taybetîyên gelek devokên kurmançî di van xebatan de cih nedîtîye. Devoka Semsûrê jî yek ji van devokan e. Lewma ev xebat li ser kurmançîya Semsûrê hatîye kirin. Ji bo vê xebatê sê heremên bingeşin (Kûmîr, Sincik û Aldûş) hatine dîyarkirin. Lêkolîn li ser devoka van her sê herêman hatîye kirin. Wek keresteyên xebatê çîrokên gelêrî û axaftinên rojane hatine bikaranîn. Armanca vê yeke jî ew e ku taybetîyên devoka Semsûrê bi awayekî resen bîr nîşandan.

Her wekî ku hatîye gotin ev xebat li ser daçekên devoka Semsûrê hatîye kirin. Xebat ji çar beşan pêk tê. Di beşa ewil de mijar, armanc, girîngî, rêbaz û pirsgrêkên li ber lêkolînê, di beşa duyem de li ser daçekan agahîyên teorîk, di beşa sêyem de mînakên daçekan yên devoka Semsûrê û di beşa dawî de taybetîyên daçekên kurmançî û yên devoka Semsûrê hatine berawirdkirin. Piştî her çar beşan encam, çavkanî û jêder hatine nivîsîn.

Peyvên Sereke: Daçek, Daçekên Xwerû, Daçekên Navî, Daçekên Hevdudanî, devoka Semsûrê

ÖZET

ADİYAMAN KÜRTÇESİNDE EDATLAR

(Sincik, Gerger ve Kömür Bölgeleri Örneğinde)

Haşim ESEN

Kürtçe üzerine bir çok çalışma yapılmakta ve dilbilgisi konuları çalışma alanı olmaktadır. Edatlar da bu çalışmanın yapıldığı dilbilgisi konularından birisidir. Kürtçe dilbilgisi üzerine hazırlanan kitaplar edatlar konusunda geniş kapsamlı değildir. Bu kitapların yazarları ya yaşadıkları bölgenin kürtçesini (ağzını) ya da daha önce yazılmış olan dilbilgisi kitaplarını kendi çalışmaları için esas almışlardır. Bu yüzden kürtçenin bir çok ağzının özellikleri bu kitaplarda yer almamıştır. Adıyaman ağzı da bu kitaplarda yer almayan ağızlardan birisidir. Bu nedenle bu çalışma Adıyaman ağzı üzerine yapılmıştır. Bu çalışma için üç temel bölge (Kömür, Sincik, Gerger) belirlenmiştir. Çalışma belirlenen bölgelerin kürtçeleri üzerinde yürütülmüştür. Çalışmalarda kullanılan materyaller halk masalları ve günlük konuşmalardan derlenmiştir. Bununla Adıyaman ağzının özellikleri orijinal bir şekilde gösterilmek istenmiştir.

Daha önce de belirtildiği gibi bu çalışma Adıyaman kürtçesi üzerine yapılmıştır. Bu çalışma dört bölümden meydana gelmektedir. Birinci bölümde konu, amaç, önem, yöntem – teknikler ve çalışmanın önündeki engeller, ikinci bölümde edatlar ile ilgili genel bilgiler, üçüncü bölümde Adıyaman ağızındaki edat örnekleri ve özellikleri, dördüncü bölümde ise kürtçedeki edatlar ile Adıyaman ağızındaki edatlar karşılaştırılmıştır. Dördüncü bölümün sonunda da çalışmadan çıkarılan sonuçlar ile çalışmada yararlanılan kaynak kitaplar ve kaynak kişilerin listesi verilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Edat, Yalın Edatlar, İsim Soylu Edatlar, Bileşik Edatlar, Adıyaman Ağzı.

ABSTRACT

ADPOSITION OF SEMSÛR KURMANJI

(The Sample of Regions Sincik, Aldûş and Kômûr)

Haşim ESEN

There are many studies on the Kurdish language and grammar topics becomes to the research field. Adposition is also a topic of Kurdish grammar that this work has been done on it. Books that are prepared on grammar of Kurmanji dialect are not a comprehensive perspective in terms of preposition. The authors of these books based on either dialect of own region or grammar books before them. Because many different features of Kurmanji are not available in these works. The Semsûr subdialect is one of these dialects. Because this work has been done on the Semsûr Kurmanji subdialect. For this purpose, three main areas (Kûmîr, Sincik and Aldûş) were reported. The research has been conducted on each of these areas. As source, it has been used daily talks and folk tales. The goal of this is that the features of the Semsûr dialect are displayed mainly and correctly.

As stated, this work has been done on adposition of the Semsûr subdialect. The work consists of four sections. In the first part of the chapter, topics, goals, significance, methods and problems in the research, in the second section, theoretical information on adposition, and the third section includes adposition examples in of the Semsûr subdialect and in the last part, it is compared adposition features of the Kurmanji dialect and the Semsûr subdialect.. After each of the four sections, result, sources and sources of tales have been written.

Key Words: Adposition, Simple Adpositions, Noun Adpositions, Compound Adpositions, Semsûr Subdialect

NAVEROK

PÊŞGOTIN	i
KURTE	iii
ÖZET.....	iv
ABSTRACT.....	v
NAVEROK	vi
KURTEPEYV	ix
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM	4
MIJAR, ARMANC, RÊBAZ	4
1.1. Mijar	4
1.2. Armanc û Girîngî	5
1.3. Sînor û Çarçoveya Lêkolînê.....	5
1.4. Rêbaz û Teknîkên Lêkolînê	6
1.5. Pirsgirêkên Lêkolînê	7
BEŞA DUYEM.....	8
ÇARÇOVEYA TÊGEHÎ Û TEORÎK	8
2.1. Daçek.....	8
2.1.1. Cureyên Daçekan	11
2.1.1.2. Daçekên Xwerû	11
2.1.1.3. Daçekên Navî	21
2.1.1.4. Daçekên Hevdudanî	27
2.2. Daçek û Tewang.....	33
2.3. Daçek di Çêkirina Peyvan de	34
2.3.1. Daçek di Çêkirina Navdêran de	35
2.3.2. Daçek di Çêkirina Lêkeran de	35
2.3.3. Daçek di Çêkirina Cihnavan de.....	38

2.3.4. Daçek di Çêkirina Rengdêran de.....	42
2.3.5. Daçek di Çêkirina Gihanekan de.....	43
2.3.6. Daçek di Çêkirina Hokeran de	46
BEŞA SÊYEM	47
Di DEVOKA SEMSÛRÊ De DAÇEK û MÎNAKÊN WAN.....	47
3. Semsûr û Devoka Semsûrê	47
3.1. Derbarê Semsûrê de Agahîyên Giştî	47
3.2. Devoka Semsûrê.....	48
3.3. Mînakên Daçekan di Devoka Semsûrê de	52
3.3.1. Daçekên Xwerû	52
3.3.2. Daçekên Navî	60
3.3.3. Daçekên Hevdudanî	66
3.4. Daçek û Tewang.....	72
3.5. Daçek di Çêkirina Peyvan de	73
3.5.3. Daçek di Çêkirina Cihnavan de.....	74
3.5.3.1. Cihnavên Lihevxiştî	74
3.5.4. Daçek di Çêkirina Rengdêran de.....	77
3.5.5. Daçek di Çêkirina Gihanekan de.....	78
3.5.6. Daçek di Çêkirina Hokeran de	79
BEŞA ÇAREM	81
BERAWIRDKIRINA DAÇEKÊN DEVOKA SEMSÛRÊ û KURMANCÎYA STANDART	81
4.1. Daçekên Xwerû.....	81
4.2. Daçekên Navî.....	84
4.3. Daçekên Hevdudanî	86
4.3.1. Daçekên Hevdudanî yên Koma Yekem	86
4.3.2. Daçekên Hevdudanî yên Koma Duyem	87

4.4. Daçek û Tewang	89
4.5. Daçek di Çêkirina Peyvan de.....	89
4.5.1. Daçek di Çêkirina Navdêran de	89
4.5.2. Daçek Di Çêkirina Lêkeran de	89
4.5.3. Daçek di Çêkirina Cihnavan de.....	90
4.5.4. Daçek di Çêkirina Rengdêran de.....	90
4.5.6. Daçek di Çêkirina Gihanekan de.....	91
4.5.7. Daçek di Çêkirina Hokeran de	91
ENCAM	92
ÇAVKANÎ	97
PÊVEK	102
Nimûneyên Çîrokan	102
Hesnûn	102
Pîr û Rêvi	111
Qeraşê Ber Aşan.....	114

KURTEPEYV

amd. Amadekar
bnr. binêre
hb. heman berhem
hjm. hejmar
r. rûpel
wer. werger
vghz. veguhêzer



DESTPÊK

Rojhilata Naverast ji gelek gelan re bûye warê şaristanî û hebûnê. Kurd jî yek ji wan gelan e. Kurd, hezar sal in tevî çand, ziman û kevneşopîyên xwe li ser vê xakê dijîn. Zimanê kurdî zimanekî ji koma zimanên Hînd – Ewropî ye. Kurdî di vê komê de jî dikeve malbata zimanên hîndî û ji malbata zimanên hîndî jî dikeve binbeşa zimanên îranî.

Li ser rêzimana kurmançî ji sedsala hijdemîn vir ve xebat tên kirin û lêkolîner li ser vê qadê mijûl dibin. Bê guman her xebata ku li ser rêzimana kurmançî tê kirin girîng e û ji bo standartbûna rêzimana kurmançî roleke mezin dilîze. Standartbûna zimên jî ji bo têgihiştina xwîner, axivêr û her ferdê/a ku zimên bi kar tîne dibe xala hevpar. Ji ber erdnîgarîya kurdan ya fireh, welatên cur bi cur ku kurd lê dijîn û nebûna pergaleke perwerdehîyê bûye sedema pir-devokî û pir-zaravabûna zimanê kurdî. Wisa dîyar e ku hebûna zarava û devokên cuda ji bo hemû zimanan tiştekî ji rêzê ye. Lê belê pîrbûna devok û zaravayan jî heta astekê ji hêla têgihiştinê ve ferdên civakê ji hev dûr dixe. Her çend ku zarava û devokên kurmançî bi demê re derketibin jî kembûna sazî û polîtîkayên zimên û nebûna pergala perwerdehîyê bi kurmançî jihevfarîkirina ferdên civaka kurmançîaxêv zehmettir dike. Digel vê yekê pêvajoya standartbûnê jî zehmettir û derengtir dike. Kêmbûna van saziyan dibe sedema jihevdûrketina devokên kurmançî jî. Loma xebatên ku li ser rêzimana kurmançî tên kirin ji hêla standartkirina zimên ve xwedî wateyeke mezin in.

Lêkolînerên ku li ser rêzimana kurdî xebitîne di xebatên xwe de cih dane mijara daçekan jî. Têgeha “daçek” ê cara pêşî ji hêla Celadet Bedirxan ve hatîye bikaranîn. Piştî Celadet Bedirxan jî kesên ku li ser rêzimana kurmançî xebitîne bêtir ev têgeh bikar anîne. Herwekî ku hat gotin, gelek kes li ser rêzimana kurmançî xebitîye û hîn jî dixebitin. Ji wan kesan yê ku herî zêde li ser daçekan sekinî Celadet Bedirxan, Qanadê Kurdo, Kadri Yıldırım û Bahoz Baran in. Bedirxan û Yıldırım yek bi yek li ser daçekan û wateyên wan sekinîne, Kurdo, ji hêla morfolojîk ve daçek dabeş û analîz kirine, Baran jî bi perspektîfeke nû di çapa pirtûka xwe ya dawî ya rêzimên de daçek ji hêla semantîk û morfolojîk ve vegotine. Dîsa li ser daçekan Bahattîn Taman di sala 2018an de tezek nivîsîye. Di vê tezê de daçek ji hêla “cîh”, “sazbûn”, “wate”, “peywir” û “dengani”yê ve hatine veçirandin.

Daçek xerca hevokan in. Bêyî daçek ne gengaz e ku hevokên tam û durist bîn sazkin. Digel rola daçekan ya pêwendîyê û rola wateyên nû ku li hevokan bar dîkin, daçek di çêkirina navdêr, cihnav, lêker, rengdêr, hoker û gihanekan de jî weke pêşgir û paşgir rolên girîng dilîzin. Ev taybetîyên daçekan wan dixin nav mijarên sereke yê rêzîmên. Di vê xebatê de jî bîyî ku em têkevin nava nîqaşên li ser dabeşkirina daçekan, li gor Baran (2018) daçek hatin dabeşkirin û di çarçoveyên mînakên di devoka Semsûrê de daçek hatin nirxandin. Mînakên di devoka Semsûrê jî ji çîrokên gelêrî û ji axaftinên rojane hatin girtin da ku derbarê bikaranîna şewaza daçekan de tabloyeke giştî derkeve. Di dawîya xebatê de digel lîsteya çîrokan wekî mînak ji çîrokên ku hatine bikaranîn sê çîrok, ku her yek temsîla devereke cuda dike hatine dayîn.

Her çend ku rêzimana kurmancî ji ber hin egerên sîyasî û civakî negihaştibe standartekê jî di nivîsîna daçekan de standartek derketîye holê. Gava li berhemên ku bi kurmancî tên weşandin bîn venêrîn dê bê dîtin ku li ser awayê nivîsîna paşdaçekan û paşdaçekan lihevkarîneke giştî çêbûye. Li ser nivîsîna paşdaçekan jî herçend ku nîqaş heta astekê hebin jî piranîya pirtûkên ku ji weşanxaneyan dertên forma wan ya “de”, “re” û “ve” yê tercîh dîkin û pirtûkan bi vî awayî çap dîkin. Rewşa daçekan di pirtûkên rêzîmên de jî nêzîkê ye. Kesên ku li ser rêzimana kurmancî xebitîne wek tîbînî forma “da”, “ra” û “ve” yê dane û dîsa forma “de”, “re” û “ve” yê bikar anîne. Lewma mirov dikare bibêje ku di warê nivîsîna daçekan de standartek çêbûye. Di vê xebatê de jî berawirdkirina daçekên devoka Semsûrê dê bi daçekên kurmancîya standart re bê kirin. Di vir de qesta kurmancîya standart nivîsîna daçekan ya di pirtûkên rêzîmên û berhemên edebî de ku tên weşandin e.

Devoka Semsûrê ji hêla xebatê ve qadeke bakîr e. Ne tenê li ser daçekan, li ser mijarên din ên rêzimanî jî xebat nehatine kirin. Li gor agahîyên li ber destên me rasterast li ser daçekên kurmancî tenê xebatek (tezek) ji hêla Bahattîn Taman (2018) ve hatîye kirin ku ew jî ne li ser tu devokan e. Taman di teza xwe de bi awayekî berfireh li ser daçekan sekinîye û bi nêrîneke nuh daçek vegotine. Ji bilî vê xebatê wekî beşeke rêzimanî di pirtûkên rêzimana kurmancî de daçek tên dîtin.

Ev xebat dê ji çar beşan pêk bibe. Di beşa yekem de dê qala mijar, armanc, girîngî, rê û rêbazên lêkolînê, çarçove û sînorên lêkolînê û astengîyên li ber lêkolînê bibe kirin. Di beşa duyem de dê daçek yek bi yek bîn dabeşkirin û bi mînakên ku ji

berhemên edebî û pirtûkên rêzimana kurmancî bîn girtin mijar dê bê vegotin. Hin mînak jî – ku rêjeya wan gelek kêr e- ji hêla xebatkarê tezê ve dê bîn nivîsîn. Di beşa sêyem de mînakên di çîrokên gelêrî û yê axaftinên rojane li gor sernavên beşa yekem yek bi yek dê bîn nivîsîn û vegotin. Di beşa sêyem de jî hin mînak (ku pêwistî pê hebe) dê ji hêla lêkolînerê xebatê ve bîn nivîsîn. Beşa çarem jî beşa berawirdkirinê ye. Di vê beşê de taybetîyên daçekan yê devoka Semsûrê bi kurmancîya standart re dê bîn berawirdkirin. Pêşî xalên hevpar piştê jî taybetîyên cuda ku tenê di devoka Semsûrê de ne dê bîn dîyarîkirin. Di encamê de jî xalên hevpar û cuda, daçekên ku li Semsûrê tên bikaranîn û nayên bikaranîn bi kurtî dê bîn vegotin. Di beşa duyem û sêyem û çarem de rola daçeka peyvçêkerîyê jî dê li ber çavan bê girtin û bi vê yekê ve girêdayî li ser vê mijarê jî dê bê rawestîn.



BEŞA YEKEM

MIJAR, ARMANC, RÊBAZ

Di vê beşê de bi giştî qala, mijar, armanc, girîngîya lêkolînê, sînor û çarçoveya tezê, rê û rêbazên ku hatine bikaranîn û her wiha astengîyên li ber nivîsîna xebatê hatiye kirin.

1.1. Mijar

Mijara vê xebatê rewşa bikaranîna daçekan li Semsûrê de vera Kûmîr û navçeyên Sincik û Aldûşê ye. Ev xebat li ser devoka zaravayê kurmancî ya Berferatî hatiye kirin. Ev xebat ji çar beşan pêk tê. Di beşa ewil de mijar, armanc, girîngîya lêkolînê, sînor û çarçoveya tezê, rê û rêbazên ku hatine bikaranîn û astengîyên li ber xebate hatine vegotin. Di beşa duyem de li gor agahîyên di pirtûkên rêzimana kurmancî de ku li ser daçekan hatine vegotin, rewşa bikaranîna daçek û cureyên daçekan bi mînakên ji berhemên edebîyata kurdî ya kurmancî hatiye dîyarkirin. Di beşa sêyem de jî mînakên di devoka Semsûrê de hatine destnîşankirin. Di beşa çaremîn de bikaranîna daçekan ya li Semsûrê bi kurmancîya standart re hatiye berawirdkirin û xalên hevpar û cuda hatine dîyarkirin. Ev xebat di çarçoveya van pirsan de hatiye birêvebirin.

- Gelo curê û bikaranînên daçekan li van deverên Semsûrê -Kûmîr, Sincik, Aldûş- çiqas li bikaranîna daçekan ya kurmancîya standart tê?
- Di bikaranîna daçekan de, li Semsûrê çi guherîn çêdibin?
- Daçek, di çêkirina peyvên din de roleke çawa dilîzin?

Di çarçoveya van pirsan de li gor mînakên cudatî û xalên hevpar di navbera bikaranîna daçekan di devoka Semsûrê û pirtûkên rêzimana kurmancî de xal bi xal hatine vegotin û şîrove kirin.

1.2. Armanç û Girîngî

Armanca vê xebatê ew e ku bê dîyarkirin, gelo hevgirtinek di navbera bikaranîna daçekan li vê heremê û bikaranîna standart de heye yan na ? Gelo cudatî yan jî xalên hevpar hene, ku hebin jî ev xal çi ne?

Girîngîya vê xebatê ew e ku kesên li ser rêzimana kurmançî xebitîne bêtir li ser herêma ku lê dijîn xebitîne yan jî rêzimana Celadet Bedirxan ji xebata xwe re kirine bingeş. Ji ber vê yekê taybetîyên devoka vê heremê di van çavkanîyan de nayên dîtîn. Ji bo tesbîtkirin û derxistina taybetîyên devokê ew xebat hatîye kirin. Xebatên rêzimanî li ser devokan ji bo destnîşankirina tabloyeke giştî van xebatan girîngtir dike. Bi saya xebatên li ser devokan, lêkolîner dikarin derbarê qeîdeyên rêzimanî de xalên hevpar hêsanîr dîyarbikin. Bi vê jî rêya ber zimanekî hevgirtî û standart hêsanîr û kurttir dibe.

1.3. Sînor û Çarçoveya Lêkolînê

Ev xebat bi devoka Semsûrê hatîye sînorkirin. Her çend ku li Semsûrê zaza û çend gundên ji eşîra Şêxbizînî – ku di eslê xwe de Soran in- hebin jî ev xebat li ser kurmançîya devoka Semsûrê hatîye kirin. Dema ku mirov cografyaya Semsûrê li ber çavan digire, dibîne ku ji alîyê rojava ve digihêje Mereşê, alîyê rojhilat ve Amed, alîyê bakur ve Meletî, alîyê başûr ve jî Riha û Entabê. Ev yek jî dibe sedema ku her alîyekê Semsûrê ji hêla axaftinê ve xwedî taybetîyên cuda be. Lewma di vê xebatê de bêtir herema Sincik, Aldûş û derdorên Kûmîrê wek bingeş hatîye dîyarkirin ku ew dever jî devoka Berferatî bikar tînin.

Di vê xebatê de beşa teorîk li gor pirtûkên rêzimana kurmançî hatîye amadekirin. Bêyî ku em têkevin nîqaşên li ser daçekan, daçek li gor Baran (2018) hatine dabeşkirin û piranîya mînakên ji berhemên ku bi kurmançî hatine çapkirin hatine wergirtin. Beşa ku li ser devoka Semsûrê hatîye nivîsîn jî, bi wî awayî hatîye dabeşkirin. Ji bo mînakên jî yekemîn çavkanî çîrokên gelêrî hatine hîlbijartin û dîyalogên rojane jî wekî çavkanîyên duyemîn hatine bikaranîn. Ji bo hin xalan ku di van her du çavkanîyan de mînak nehatibin dîtîn jî mînak ji hêla lêkolînerê xebatê ve hatine nivîsîn. Sedema vê yekê jî ew e ku, lêkolîner li Kûmîrê – ev gund bi ser navenda Semsûrê ve ye - dijî û axivêrê devoka Semsûrê ye.

1.4. Rêbaz û Teknîkên Lêkolînê

Ji bo xebatên zanistî rê û rêbazên zanistî divê bên şopandin. Lazim e her xebata zanistî pala xwe bide rê û rêbazên zanistî. Li gor pêwistîyê di xebatên zanistî de teknîkek an jî çend teknîk dikarin bi hev re bên bikaranîn. Di vê xebatê de jî çend teknîk bi hev re hatin bikaranîn.

Di vê xebatê de, ji bo beşa teorîk daçek li gor dabeşkirina Baran (2018) hatin dabeşkirin. Di şîrovekirina beşên daçekan de ji pirtûkên li ser rêzimana kurdî sûd hatîye wergirtin. Ji bo mînakên beşa teorîk jî rêbaza description (teswîrî) hatiye bikaranîn. Bi vê rêbazê ji berhemên edebîyata kurdîya kurmancî mînak hatine wergirtin. Di beşa sêyemîn ya xebatê de digel rêbaza teswîrî rêbaza çavderîyê jî hatîye bikaranîn û ji qadê materyalên tezê hatine berhevkirin. Ev berhevkirin carinan bi awayê berhevkirina çîrokekê carinan jî bi berhevkirina hevokek bi daçek çêbûye. Digel van di beşa çarem de rêbaza berawirdkirinê hatîye bikaranîn di çarçoveya mînakan de ku ji qadê hatine berhevkirin xalên hevpar û cuda yên bikaranîna daçekan di devoka Semsûrê û kurmancîya standart de hatine berawirdkirin.

Di vê xebatê de ji 44 pirtûk, 8 gotar, 13 jêderan û 2 tezan sûd hatîye wergirtin. Ji van pirtûkan 19 pirtûk li ser rêzimana kurdî, 5 pirtûk li ser Semsûrê, zimên û dîyalektan in, 20 pirtûk jî ji roman, helbest û çîrokên modern ku bi kurmancî hatine çapkirin pêk tên, ji van pirtûkan jî mînakên daçekan hatine wergirtin. Ji bilî van tezeke çapnekirî û projeyek - ku tê de 6 çîrokên gelêrî hene - û 17 çîrokên gelêrî ku ji qadê hatine berhevkirin û gelek hevokên ji axaftinên rojane ku ji jêderan hatine wergirtin hatin bikaranîn.

Ji bo vê xebatê bi giştî ji 23 çîrokên gelêrî sûd hatîye wergirtin. Ji van çîrokan 6 heb weke projeyekê hatine amadekirin û di çarçoveya projeyê de hatine çapkirin. Çîrokên din (17) jî qeyda wan hatîye girtin û bo vê xebatê hatine bikaranîn. Ev hevdeh çîrok berî vê xebatê li tu deran nehatine çapkirin.

Çîrok û hevokên ku di vê lêkolînê de hatine bikaranîn ji 13 jêderan hatine wergirtin. Kûnyenameya jêderan li pey çavkanîyan hatîye dayîn. Hevokên ku ji jêderan hatine wergirtin dema ku di nav tezê de bên bikaranîn dê li gor rêza jêderan bi tîpa Ç yê (Çavkanî) û hejmara rêza wan bê bikaranîn.

Hewce ye bê gotin ku çîrokên hatine berhevkirin li gor rê û rêbazên zanistî hatine berhevkirin. Ji bo parastina devoka Semsûrê destekarî bi zimanê wan nehatîye kirin. Di beşa sêyem de di mînakên de hin peyvên ku di devoka Semsûrê de hene weke jêrenot hatine nivîsîn û derbarê wan de bi kurtî agahî hatine dayîn.

1.5. Pirsgirêkên Lêkolînê

Zehmetî û pirsgirêka li ber vê xebatê kêmbûna lêkolînên li ser devoka Semsûrê ne. Ne tenê devoka Semsûrê bi giştî li ser devokên kurmancî jî xebatên ku hatine kirin gelek kêr in.

Ev xebat bêtir pala xwe dide xebatên qadî. Lewre tespîtkirina jêderan, berhevkirina keresteyên xebatê zehmetîyên herî girîng in. Kêmbûn an jî nebûna xebatên li ser devoka Semsûrê jî astengîyeke din ya li ber vê xebatê ye. Ji bo analîzkirina daçekan di devoka Semsûrê de li ser çîrokên gelêrî xebat hatîye kirin. Ji hêla çend nivîskaran ve li ser çîrokên devera Semsûrê xebat hatine kirin û gelek çîrok hatine berhevkirin. Ji ber ku ev çîrokên ku hatine berhevkirin bi rê û rêbazên akademîk nehatine berhevkirin û resenîya çîrokan ji hêla mijarên rêzimanê ve hatîye paşguhkirin. Çîrokên berhevkirî bi edîsyoneke rêzimanî hatine weşandin û hem taybetîyên devokî hem jî yên rêzimanî di standartê re derbas bûne. Lewma ew berhemên çîrokan wekî materyalên xebatê ne gengaz e ku bîrê bikaranînin. Di vê xebatê de analîz û tesbîtên derbarê mijarê de li ser çîrokên gelêrî û diyalogên rojane hatine kirin.

Ji hêla teorîya mijarê ve jî pirsgirêka herî mêzin ew bû ku pirtûkên ku li ser rêzimana kurmancî hatine amadekirin xwedî çarçoveyeke teng in. Van pirtûkan yan rêzimana Celadet Bedirxan ji xwe re kirine bîngeh yan jî nivîskaran devoka xwe ji pirtûkên xwe re kirine bîngeh. Ji ber wê, ne gengaz e ku taybetîyên hemî devokan di wan pirtûkan de bîrê dîtin.

Di pey van gotinan re divê kêmasîyên xebatê jî bîrê gotin. Ji ber nebûna derfetan me nekarî ji her deverên Semsûrê çîrokan berhev bikin û li ser wan bixebitin. Tenê li ber destên me çîrokên ku ji navçeyên Sincik û Aldûşê û herêma Kûmîrê hatine berhevkirin hebûn û ev xebat li ser van çîrokan û diyalogên rojane yên vê heremê hatîye kirin.

BEŞA DUYEM

ÇARÇOVEYA TÊGEHÎ Û TEORÎK

Di vê beşê de der barê daçek, cureyên wan, wateyên ku didin hevokan, têkilîya daçek û tewangê de bi berfirehî agahî hatine dayîn. Di çarçoveya fonksîyona daçekan ya peyvçêkerîyê de jî di derbarê cureyên peyvên yê wekî navdêr, cihnav, lêker, rengdêr, hoker û gihanekan de agahî bi kurtî hatine dayîn û mijar bi mînakên hatine vegotin.

2.1. Daçek

Daçek hêmanên rêzimanî yê bê wate ne. Her çend ku daçek weke peyv bi tena serê xwe bê wate bin jî ji hêla erkî ve xwedî gelek peywîr in. Hevokên bê daçek ango hevokên kêmdaçek ji hêla wateyê ve qels û kêmtir in. Tan di pirtûka xwe de ji bo daçekan wiha dibêje: “Daçek ji cureyên bêjeyan ên erkî ne. Daçekên xwerû bi xwe ne xwedîyê tu wateyê ne, lê di nav hevokê de beşên din ên peyvê ji aliyê wateyê ve sergîhayî dikin” (Tan, 2011: 187). Daçek wateyên cur be cur ji hevokan zêde dikin. “Bêtir wateyên wek mayîn, berpêbûn, derketin û pêrebûnê li peyvên bar dikin (Baran 2012: 107). Taş di pirtûka xwe de ji bo girîngîya daçekan wiha dibêje: “...bi serê xwe ne xwedîyê tu wateyê ne. Lê ji ber ku daçek wateya wekhevî, dijberî, sedem, cih û bergehê didine peyvê an jî hevokê xwedî risteke mezin in” (Taş, 2013: 156). Gündüz di rêzimana Zazakî de ji bo daçekan wiha dibêje: “Bêjeyên ku di peywîra bikaranîna nava hevokê de dibin xwedî wate û di navbera têgehan de têkilîyên wateyî çêdikin û tena serê xwe bê wate ne” (Taş, 2013: 154). Veroj ji bo daçekan pênaseyeke berfirehtir dike û wiha dibêje: “Daçek bi serê xwe peyvên bê wate ne: ne ciyê navek, ne ciyê rengdêrek, ne ciyê kirinek û ne jî ciyê peyveke din digirin. Wexta ku edat di cumleyê de bi nav û peyvên din re bête nivîsîn di navbera wan de têkilîyeke peyda dikin, maneyek dide wan û yan jî mana wan dişidîne” (Veroj, 2014: 258). Yıldırım ji bo daçekan pênaseyeke gelekî kurt û sade dike û wiha dibêje: “Bêjeyên ku tena serê

xwe tîn nivîsîn lê belê tena serê xwe ne xwedîyê tu wateyan wek daçek tîn zanîn” (Yıldıırım, 2012: 267). Digel van pênasayan carinan jî daçek tenê bi fonksîyona wan ya dîyarkirina navdêran hatine pênasekirin. A. Balî li ser vê yekê wiha dibêje: “Daçek tîn pêşî û paşîya navdêran û rewşa navdêran dîyar dîkin” (Balî, 1992: 156). Her wiha pênaseyeke bi vî awayî ji bo danasîna daçekan gelekî qels e.

Hin lêkolîner jî bêtir fonksîyona daçekan ya peyvçêkerîyê derdixin pêş wekî mînak Karaağaç; dema ku pênasaya daçekan dike rola wan a peyvçêkerîyê derdixe pêş û wiha dibêje:

“Di zimanan de digel yekeyên bingehîn yekeyên ku peyvên nû çê dîkin ango yekeyên ku peyvên tînin gel hev jî hene. Ev, yekeyên girêdayî ne. Yekeyên girêdayî bi tena serê xwe bê wate ne û bikaranîna wan nîne lê ev yeke tîn kok û gewdeya peyvên û peyvên nuh çê dîkin” (Karaağaç, 2009: 157).

Digel qewînkirina wateya hevokê carinan jî daçek di çêkirina lêker, cihnav, gihanek û rengdêran de cih digirin û digel vê yekê peywira, hoker û gihanekan jî digirin ser xwe. Ji bo vê yekê Mûrad Ciwan wiha dibêje: “Daçek ji xeynî peywira xwe ya esil, bi navdêr, rengdêr, lêker, cihnav û hokeran ra jî tîn bikaranîn û rengdêr, lêker û hokerên nû jî çêdikin.” (Ciwan, 1992: 139).

Dema ku mirov bala xwe dide agahîyên li jor, dibîne ku pênasayên daçekan ji hev cûda ne. Her wiha pênasayên daçekan kêr in jî. Ev yek tenê di nav lêkolînerên kurd de nîn e. Di nav lêkolînerên cihanê de jî li ser pênasê û fonksiyona daçekan lihevkiyên giştî nîne. Ji bo vê yekê Dennis Kurzon û Silvia Adler ji bo daçekan pêşî û pênasayê didin: “Daçek bi gelemperî wek hêmanên neguher ku berî an piştî temamkera navdêr sirûştî tîn û wan bi hêmanên din yê hevokê ve girê didin tîn pênasekirin” (Kurzon & Adler, 2008 : 2). Pişt re dewam dîkin û wiha dibêjin : “lê belê pênasayên daçekan ên sade yê bi vî awayî bi şêwazeke zanebûnî daçekan ji fonksîyona semantîk dûr dixin û dibe ku der barê daçekan de dîmenek giştî/temam jî nedin” (Kurzon & Adler, 2008 : 2). Pişt re van gotinên xwe bi agahiyên Hagège ku li ser daçeka frensî “de” yê ku li ser fonksîyona wê ya têkildarkirinê û pevgerîdanê piştrast dîkin.

Di çarçoveya agahîyên li jor, ji bo daçekan dikare bê gotin ku daçek: hêmanên rezimanî yê bê wate ne, ku bi bikaranîna di nav hevokê de dibin xwedî wate, hevokê ji hêla wateyê ve temam dîkin û digel van di çêkirina lêker, rengdêr û cihnavan de cih

digrin û carinan jî peywira hoker û gihanekan digirin ser xwe, di navbera hêmanên risteyê de girêdan û têkilîyê çêdikin. Daçek li gor bikaranînê hevokê ji hêla wateyên cur bi cur ve temam dikan. Daçek di eslê xwe de ji cureyên peyvên din yê weke navdêr, rengdêr û lêkeran hatine dariştin û bi demê re ketine forma xwe ya daçekî.

Lêkolînerên ku li ser rêzimana kurmançî xebitîne daçek li gor nêrînên cuda cuda veçirandine û dabeş kirine. Di çavkanîyên li ber destê me de daçek wiha hatine dabeşkirin:

Celadet Bedîrxan û Roger Lescot (2013) di pirtûka xwe de daçek kirine sê beş: pêşdaçek, paşdaçek û komdaçek.

Samî Tan (2011) daçekan dike sê beş: daçekên xwerû, daçekên hevedudanî û hin daçekên din¹.

Bahoz Baran (2012) di pirtûka xwe de daçekan dike du beş: daçekên peyvî û yê qertafî. Nivîskar heman pirtûkê di sala 2018 an de bi awayekî berfirehkirî çap dike û di vê çapê de daçekan bi nêrîneke nû dabeş dike. Di çapa dawî ya pirtûkê de daçekan dike sê beş: daçekên xwerû, daçekên hevdudanî û daçekên navî.

Bahattîn Taman (2018) tezek li ser daçekan nivîsîye û di vê tezê de daçek kirine sê beş : daçekên xwerû, yê navî û yê hevdûdanî. Bi berfirehî li ser ava bûn, cih, peywir û guherîna dengên daçekan sekinîye.

Qanadê Kurdo (2013) daçekan bi awayekî morfolojîk dabeş dike û daçekan dike çar beş: daçekên xwerû yê beşa yekem, daçekên xwerû yê beşa duyem, daçekên navî û yê nexwerû.

Çetîn Taş (2013) daçekan dike du beş: daçekên xwerû daçekên hevdudanî.

Deniz Gunduz (2013) di pirtûka li ser rêzimana zazakî de daçekan dike sê beş: pêşdaçek, paşdaçek û pêşdaçek û paşdaçek bi hev re.

Seîd Veroj (2014) di pirtûka xwe de ya ku gramera zazakî û kurmançî hevber dike daçekan dike sê beş: pêşdaçek, paşdaçek û komdaçek.

¹Vê beşa daçekan jî bi binbeşên daçekên şibandinê, yê sedemîn, yê agahdariyê û yê hevrûkirinê dabeş dike. Ji bo agahiyên berfireh bnr. r. 189-190

Mûrad Ciwan (1992) daçekan dike du beş: beşa yekem daçekên pêşîn û yên paşîn, beşa duyem jî hin daçekên din.

A. Balî (1992) daçekan dike sê beş û ji bo daçekan terma *bernav* bi kar tîne. Dabeşkirina Balî wiha ye: *bernavên* kevn, *yên nû* û *bernavên* bi cot.

Kadrî Yıldırım (2012) daçekan dike du beş: pêşdaçek- paşdaçek û kom daçek.

L. O. Fossum ku mîsyonerekî amerîkî ye di xebata xwe ya li ser gramera kurdî bi navê *A Practical Kurdish Grammar* (Rêzimana Kurdî ya Pratîk) de li ser daçekan disekine. Her çend ku daçekan wek lêkolînerên kurdî dabeş nake jî, ji bo daçekên kurdî wiha dibêje: “Hinek daçek paşdaçekan digirin, hinek tenê ne, hinek bi bêjeya pêy xwe re tîr girêdan, hinek cuda tîr nivîsîn: û çend paşgirên daçekî jî hene” (Fossum, 1919: 209).

Dîyar e ku di warê dabeşkirina daçekan de lêkolîneran li gor fikr û ramanên xwe daçek dabeş û şîrove kirine. Loma li ser dabeşkirina daçekên kurmançî lihevkirineke giştî nayê ditîn. Di vê xebatê de bîyî ku em têkevin nava van nîqaşan daçek li gor dabeşkirina Baran (2018) hatin dabeşkirin û şîrovekirin.

2.1.1. Cureyên Daçekan

Her wekî ku li jor jî hatîye qalkirin lêkolîneran daçek ji hev cuda cuda dabeşkirine. “Daçek li gorî sazûna xwe bi sê awayan tîr dabeşkirin. Daçekên xwerû, daçekên navî û daçekên hevdundanî” (Baran, 2018: 115). Daçek li gor vê dabeşkirinê hatine şîrovekirin û mînakên daçekan hatine dayîn.

2.1.1.2. Daçekên Xwerû

Daçekên xwerû ew in: “bi, bê, di, ji, li”. Ji xeynî “li”yê û “bê” yê daçekên din carinan digel paşdaçekên wek “re”, “de” û “ve”yê tîr bikaranîn. “Daçekên “li, ji, di” û “bi”yê di nav daçekên jorîn de ji alîyê erkên xwe ve ji hemûyan çalaktir in û ji wan jî kevintir in” (Kurdo, 2013: 257). Daçekên xwerû wekî daçekên din hem ji hêla wateyê ve hevokê temam dikin hem jî di nav hêmanên hevokê de ji hêla têkilîyê ve girêdanê çêdikin. “Ev daçek, hinek jê wekî pêşdaçek bi tena serê xwe tîr bikaranîn, hinek ji wan jî dibin bazinedaçek û peyv di nava her du daçekan da cih digire. Daçekên xwerû, gelek caran bi daçekên din ra jî tîr bikaranîn” (Taman, 2018: 13).

Deçekên xwerû bi sê awayan derdikevin pêşîya me:

a- Pêşdaçek

Pêşdaçekên kurmancî “bi, bê, di, ji, li” ne. “Pêşdaçek, hêmanên daçekî ên xwerû ne û tên pêşîya peyvên, bi wan ra dibin qalib û tesîrê li wan dikin” (Taman, 2018: 9). Pêşdaçek dema ku tên bikaranîn wateyên cur bi cur li hevokan zêde dikin. Ev wateyên ku pêşdaçek li hevokan zêde dikin bi gelemperî ev in;

“Bi Fikra pêrebûn, digel û navgînê,
Bê Fikra neyînîya daçeka “bi”yê
Di Fikra karîn, qebîlîyet, hundir û hewandinê ,
Ji Fikra dûrketin, jêkirin û çûnê,
Li Fikra dayîn, barkirin û cihê dide.” (Bedir Xan û Lescot, 2013: 279).

Her wekî ku tê zanîn ji van daçekan “li” û “bê” bêtir paşdaçek tên bikaranîn ango bazindaçekan çênakin. Pêşdaçeka “bê”yê neyînîya pêşdaçeka “bi”yê ye. Pêşdaçekên din “bi, “di” û “ji” jî hem bi tena serê xwe hem jî bi paşdaçekan re tên bikaranîn.

b- Paşdaçek

Paşdaçekên kurmancî “de, re û ve” ne. “Di gelek devokên kurmancî de, bi taybetî li Rojava paşdaçekên “de, re, ve” yê dibin “da, ra, va” (Bedîrxan & Lescot, 2013: 280). Her çend ku formek paşdaçekan bi vî awayî hebe jî piranîya kesên ku li ser daçekan xebitîne formên wan yên “de, re, ve” yê tercîh kirine.

Di kurmancî de pêşdaçek dikarin bi tena serê xwe bîn bikaranîn lê belê paşdaçek jî bilî çend mînakên wek “dûre, piştre” bêtir pêşdaçek nayên bikaranîn.

Paşdaçek û wateyên ku paşdaçek didin hevokan ev in;

“...de Fikra mayîn- man, têdabûn, tevgerê,
...re Fikra dayîn-dan, tevgerê,
...ve Fikra pêrebûn, tevger, aîdîyet, zeliqînê dide (Bedîrxan & Lescot, 2018: 280).

c- Bazindaçek

Dema ku pêşdaçek û paşdaçek bi hev re tên bikaranîn bazindaçek çêdibin. Di bazindaçekan de peyv dikevin navbera pêşdaçek û paşdaçekê. “Bazindaçekên ku jî pêşdaçek û paşdaçekan pêk tînin, peyvê digirin nav xwe. Peyv û qaliba ku dikeve nav

bazinedaçekan lazim e pir dirêj nebe û gotin ji paşdaçeka wê pir dûr nekeve” (Taman, 2018: 10). Bazindaçekên kurmancî ev in:

Bi...de

Bi...re

Bi...ve

Di...de

Di...re

Ji...de

Ji...re

Ji...ve.

Daçekên xwerû û peywirên wan ev in:

a) Daçeka Xwerû “Bi” ;

Daçeka “bi”yê xwedî gelek fonksîyonan e. “... a ku herî pir tê bikaranîn û gelek wateyan dihevwîne, daçeka “bi”yê ye” (Taman, 2018: 10). Dema ku ev daçek di hevokê de tê bikaranîn, wateyên cur bi cur li hevokan zêde dike. Ew wateyên ku li hevokan zêde dike ev in:

- i. Daçeka “bi”yê di hevokê de wateya “bikaranîna alav û amûran” dide. “Tê ber navgîna ku kar pê tê kirin û sergihayî dike. Karek bi çî tê kirin wê nîşan dide” (Tan, 2011: 191).

- (1) (a) Min ê **bi** kulmeke tenê ew bêxista erdê (Fîlîk, 2015: 23).
- (b) ...ew ê **bi** zenda min bigire û min bikişîne hundur (Metê, 2014: 56).
- (c) ...**bi** kevçiyê darîn li pey hev çend caran wê şorbeya mayî...(Metê, 2014: 23).
- (d) ...**bi** xençer, **bi** rim û **bi** şûran bi nav van ketine...(Metê, 2014: 64).
- ii. Daçeka “ bi ” yê di hin bikarînan de tê ber cihnavên tewandî û wateya “li gorî” yê dide hevokan. Carinan jî dîsa ev daçek tê ber cihnavên dîyarkirî û bi saya vê daçekê ew dibin têrker û bireser.

(2) (a) Ev peyvika wî ya dawîn hinekî **bi min** seyr tê (Metê, 2014: 74).

(b) Hîn di wan deman de **bi min** welê dihat ku Xwedê ez ji bona xwe çêkirime (Metê, 2013: 7).

(c) **Bi min** tu baş dizanî (Balî, 1992: 157).

(d) Lawik **bi wê** bawer bû (Baran, 2012: 108).

iii. Dema ku ev daçek dikeve navbera hejmaran, wateya “dabeşbûnê” û “kombûnê” dide hevokan.

(3) (a) ...min **yek bi yek** cihê peykeran didît... (Dilken, 2016: 34).

(b) Şaneyên min **yek bi yek** vedikin derfeyên xwe (Zeraq, 2009: 11).

(c) ...rûyê rêwîyan **yek bi yek** dialast û paşê jî... (Çifçi, 2016: 34).

(d) Leşker **deh bi deh** dimeşin.

iv. Daçeka “bi”yê di sondan de tê bikaranîn.

(4) (a) ...keçê **bi** wî xwedeyî be ku ne ezim, **bi** serê her şeş zarokên min be ku ne ezim... (Fîlîk, 2015: 64).

(b) Min **bi** şeref sond xwar û jê re got (Metê, 2014: 24).

(c) **Bi** min tu baş dizanî (Balî, 1992: 157).

(d) **Bi** vî nametê xwedê be ku şeş teneke bûn (Fîlîk, 2015: 35).

v. Neyînîya daçeka “bi”yê, daçeka “bê”yê ye. “Ev hêman jî ji peyvan cuda tê nivîsîn (Baran, 2012: 108). Dema ku ji hêla peywir û wateyê ve ev daçek bê analîzkirin wê bê dîtî ku ev daçek “Ji aliyê rêzimanî ve rola herdukan (rola “bi” û “bê”) jî yek e. Lê belê, her wekî têtê zanîn, ew ji aliyê mane û naverokê ve du pirtikên beravajiyên hev in. Heçî bê ye, ew di maneya tunebûn, pêrenebûn û hwd de ye. Ew ji peyva “bêyî” hatiye kurt kirin û bûye “bê”. Car caran dibe “bêî” jî.” (Vghz. Ji Zîlan, Taman, 2018: 22).

(5) (a) ...wexta ku min **bê** hemdî xwe welat li pey xwe hişt
(Silêvanî, 2011: 12).

(b) **Bê** azadî jîyan erzan e (Baran, 2012: 108).

(c) Şêrgele hene: **bê** kêl û **bê** gorn

Şêrgele hene: şevçirax û heyve-ron

Şêrgele hene, ji azadiya bi gorn

Di bin axa sar de b' axîn razayî (Arî, 2008: 28)

(d) Mala **bê** zar û **bê** tîfal,

Mîna lempa **bê** şewq, şemal,

Mîna gûza pûç, **bê** kakil,

Mîna serê bêhiş-aqil,

Mîna baxçe **bê** gul, bilbil,

Mîna meriyê **bê** ruh û dîl (Hesên, 200: 36).

vi. Ev daçek dikeve navbera cotepeyvan.

(6) (a) Bi bayê re porê wê **pêl bi pêl** radibû û bi firê diket (Çifçi, 2016: 35).

(b) Wan bajar **beş bi beş, bihost bi bihost** bi min didan nasîn
(Dilken, 2016: 23).

(c) ...**roj bi roj** çardeh sal û nîv **gav bi gav** çardeh sal û nîv
(Fîlîk, 2015: 38).

(d) ... wisan **qefle bi qefle** sekinîbûn (Zeraq, 2009: 29).

vii. Daçeka “bi”yê bi paşdaçeka “de”yê re tê bikaranîn û bi vî awayî bazindaçek çêdibe. Ev bazindaçek wateyên wek “li ser” û “navberê” li hevokan zêde dike.

(7) (a) Baran dibare **bi** hundirê me **de** (Nemir, 2009: 41).

(b) ... **bi** wan **de** hilkişîn an rûxandina wan qet ne guncav bû
(Dilken, 2016: 24).

(c) ...ez **bi** şûn **de** vekişandim...(Metê, 2014: 43).

(d)... ne hewce ye ku hun **bi** heste û pûşiyê **de** bikevin (Çifçi, 2016: 19).

viii. Dema ku daçeka “bi” yê bi başdaçeka “re”yê re tê bikaranîn, wateyên wek “hevrebûnê”, “bi rêya tiştêkî” û “navberê” dide hevokan. Her wiha Taman (2018) ji bo wateyên ku ev daçek dide hevokan wiha dibêje: “.....ev daçek bêhtir wateya “digelbûnê” dide. Ev digelbûn carna wateya “liberhev”ê dide carna jî wateya dualî ya “beramberî”yê dide” (Taman, 2018: 24).

(8) (a)...diketim avê û min **bi** masîyan **re** sobarî dikir (Dilken, 2016: 24).

(b) **Bi** vekirina çavên xwe **re** hîseke ecêb **bi** min **re** çêbû (Zeraq, 2009: 27).

(c) Min li ber bû her tiştê xwe **bi** wî **re** hevpar bikim (Silêvanî, 2011: 59).

(d)...**bi** girtina derîyan **re** palikên çavên min dikevîne hev (Metê, 2014: 8).

ix. Dema ku ev daçek bi paşdaçeka “ve”yê re tê bikaranîn wateyên wek “hevrebûnê”, “aîdîyet” û “pêvebûn” ê dide hevokan.

(9) (a) Wêneyê wê **bi** pêşîya tabûta wê **ve** şidandibûn (Metê, 2014: 12).

(b) Qîra dawîya rojê **bi** solên min **ve** rabû (Husên, 2015: 18).

(c) ...xwendevanên dibistana zanistan a keyserîyê **bi** hostayên xwe **ve** ...(Dilken, 2016: 13).

(d) ...wekî mozeqirtikê **bi** min **ve** dizeliqe...(Zeraq, 2009: 33).

b) Daçeka Xwerû “Di” ;

Daçeka “di”yê wateyên cur bi cur dide hevokan. Ev daçek bi piranî digel paşdaçekan tê bikaranîn. “...ji bilî çend biwêjan bi tena serê xwe nayê bikaranîn. Di wan biwêjan de jî bi îhtîmaleke mezin paşdaçeka “de” bi domana demê re ji navê rabûyê” (Tan, 2011: 193, Taş, 2013: 157). Daçeka “di” yê, bi paşdaçekên “de” û “re”yê ve tê bikaranîn, bi vê bikaranînê bazindaçek çêdibin. Bi giştî jî wateya “...têketina nav tiştekî an cihekî nîşan dide” (Baran, 2012: 114). Digel vê wateyê ev daçek...” ji bo dijûnan jî tê bikaranîn” (Taman, 2018: 27). Ev daçek bi paşdaçeka “ve” yê re nayê gel hev û bazindaçeka “di....ve” yê çênake.

i. “Dibe ku ew daçek pêwendiya lêkdan û wesfandinê bike” (Bedîrxan & Lescot 288: 2013).

(10) (a) Hespê **di** soro (Bedîrxan& Lescot 208: 2013).

(b) Çîyayên **di** bilind (Bedîrxan& Lescot 208: 2013).

(c) ...heke mirov **di** xwe negihêje wê çawa xwe nas bike...
Silêvanî, 2011: 62).

(d) Kurd **di** sûcê dijminên xwe zû diborin (Taş, 2013: 157).

ii. Daçeka “di”yê hin caran wateyên “dinavdebûn” û “liserbûnê” dide hevokan.

(11) (a) ...dike yek parî û **di** devê xwe datîne (Metê, 2014: 59).

(b) Destîna êvarê **di** nava min digere (Zeraq, 2009: 11).

(c) **Di** qiblenumaya helbestkarên mirî diramim (Nemir, 2009: 15).

(d) Serî ranekir ma **di** binê berfê, şîr gerand li ser şîrê (Nemir, 2009: 78).

iii. Dema ku daçeka “di” yê, bi paşdaçeka “de”yê re tê bikaranîn, wateya cihê ku tişt lê ye ango tê de ye dide hevokê. Ango mirov dikare bibêje ku wateya “lêbûnê” û “têdebûnê” dide hevokan. Ew cih ne cihekî bê

ser û ber e, cihekî bisînor û sînor nîşan kirîye. Ji bilî van wateyan bazindaçeka “di....de” yê wateyên wek “sedem” û “demê” (12. d) jî dide hevokan.

- (12) (a) Hinan **di** navberê **de** gilqedehên xwe dadigirtin (Dilken, 2016: 28).
- (b) Êdî sewext dibim **di** demeke kurt **de** ez ê xwe bigêhînim wir (Metê, 2014: 7).
- (c) Tu **di** wê roja tavîn û kelegermî **de**...(Zeraq, 2009: 23).
- (d) Nûrê li hespekî rewan siwar bûbû û **di** deşta temenê xwe **de** xweş dibeziya (Çifçi, 2016: 52).

iv. Dema ku daçeka “di” yê, bi paşdaçeka “re” yê re tê bikaranîn wateya “derbasbûna ji cîyekî/tiştêkî” nîşan dide û bazindaçek pêk tê.

- (13) (a) Dema ku em **di** derî **re** dikevî hundur...(Metê, 2014: 56)
- (b) ...**di** derîyekî din **re** derketin û ew ...(Dilken, 2016: 27).
- (c) ...mîna ku tîrên evînê **di** dilê mirovan **re** bike, dikenîya (Zeraq, 2009: 29).
- (d)... **di** porê dê **re** têkeve û bi devê bavê **re** derkeve wê bike fîqefîq û bikene (Fîlîk, 2015: 66).

c) **Daçeka Xwerû “Ji” ;**

Daçeka “ji” yê wateyên wek “jêbûn” (14.a-b), “berpêbûn” (14.c) û “derketina ji cîyekî” (14. d) dide hevokan. “Ji jî yek ji wan daçekan e ku zêde tê bikaranîn û wateyên cur bi cur dide” (Taman, 2018: 9). Ev daçek bi paşdaçekên “de”, “re” û “ve” yê ve tê bikaranîn bi vî awayî bazindaçek pêk tên û hin wateyên din jî ji hevokan zêde dike.

- (14) (a) Ez kaxizê **ji** dest wê nagirim...(Metê, 2014: 9).
- (b) ...meriv dibêje qey xwedê ew **ji** agir afirandîye...(Metê, 2014: 61).

(c) Zû **ji** rê derdikevin...(Metê, 2014: 30).

(d) De ka tu ji xêra bavê xwe re aveke **ji** kahniya sar bîne (Metê, 2013: 12).

- i. Dema ku daçeka “ji” yê bi paşdaçeka “re” yê re tê bikaranîn, van wateyan dide: “berpêbûn (15. b), armanc (15. a)” (Baran, 2012: 113), “karekî ku tê kirin (15. c) û arastekirina gotinê ji bo yekê (15.d)” (Tan, 2011: 192).

(15) (a) Ya rebî **ji** deng û qirika xelkê **re** bibîne (Yûsiv, 2006: 52).

(b) Ka ti **ji** vê nivîsê **re** got çî (Metê, 2014: 10).

(c) ...**ji** derî **re** derket çû ku bi hevalên xwe re li parkê bimeşe (Dilken, 2016: 7)

(d) Lîs û zaferanê zêmara pinpinîkan dinihurandin.

Ji xezalê **re**,

Ji peykerê Uğur **re**,

Ji yarîgeha Zîlan **re**,

Ji birîna reş a Mûsa **re** (Laleş, 2011: 31).

- ii. Dema ku pêşdaçeka “ji” yê bi paşdaçeka “de” yê re tê bikaranîn, “destpêkirina cih û hêla tevgerê” nîşan dide. Lê di vir de tiştê girîng ev e ku: Çûn û hatin bi dawî bûye (Baran, 2012: 113) ango ew kar û tevger qedîyaye.

(16) (a) **Ji** berbanga sibehê **de** amadekariya hevdîtinekê dike (Çifçi, 2016: 35).

(b) ...lew re **ji** hingê **de** ez bi kêmiyê razî dibim... (Silêvanî, 2011: 60).

(c) Belê **ji** sêzdeh saliyê **de**, havîn li ber min sar bûye...(Silêvanî, 2011: 15).

(d) ...bêyî ku bizanibim ka **ji** kêjan alî **de** hat...(Zeraq, 2009: 16).

iii. Daçeka “ji” yê carinan jî bi paşdaçeka “ve” yê re tê bikaranîn. Ev bazindaçek wateya “cîh û hêla ku bûyer dest pê dike û dewam dike” nîşan dide.

(17) (a) Ji aliyê rêvebirênê ve him aliyê çiyayên Torosan...(Dilken, 2016: 31)

(b)...**ji** nişka **ve** lampeyên polîsan derdikevin...(Metê, 2014: 8).

(c) **Ji** aliyekî **ve** Kabirayî ditirsiya û **ji** aliyekî din **ve** dilê wî bi min...(Silêvanî, 2011: 42).

(d) Li derve, heyva kevin wekî teşteke zengarî **ji** aliyê rojhilatê **ve** bilind dibû (Çifçi, 2016: 51).

d) Daçeka Xwerû “Li” ;

Ew daçek wateyên wek “lêbûn, berpêbûn û têdebûnê” dide hevokan. Her wiha “Ev daçek cîh û warên ku mirov lê ye dîyar dike û wateya berpêbûnê dide .” (Taman, 2018: 32). Taybetîyeke daçeka “li” yê ya girîng heye ku di kurmancî de ew daçek her û her bi tena serê xwe angê bêtî paşdaçek tê bikaranîn. Lewre bazindaçekên bi “li” yê di kurmancî de nîn in. Digel van taybetîyên “li” yê taybetîyeke daçeka xwerû “li” yê jî ew e ku: “... ji aliyê mayîn û lêbûnê da ev daçek û daçeka “di..da”yê xwedî heman fonksiyonê ne, lê “di..da” hundir û cihên sînorkirî nîşan dide, “li” cihên berfireh û nedîyar jî di xwe da dihevine”(Taman, 2018: 33).

(18) (a) Wexta Zeûs evîndar dibû, **li** Êmanê tofan, **li** keştiyan ferman, **li** eşqê behcbehcok radibû...(Laleş, 2011: 10).

(b) Lawir û têtêk ji ber êşê difikirin

Li daristanan janên me,

Li bajaran navên me,

Li beyaran vîna me,

Bêserûber belav dibe **li** jarkawiyê (Laleş, 2011: 13).

(c) Yan **li** kendalên dil bikole

Yan jî **li** perên xewle- çîyayekî

Şerm e şa'irekî çîyayî dahêjin gornê

Li goristaneke kêl- kerr

Li ber guhên zirr-bajarekî (Hesen, 2008: 62).

(d) **Li** Rewanê helbestên wî dixwînin (Baran, 2018: 122).

2.1.1.3. Daçekên Navî

Her wekî ku ji navê beşê jî diyar e, ev beşa daçekan ji navên kurdî hatinê dêranîn. Bi demê re ev navdêr bûne daçek. Îro tê dîtîn ku ji van daçekan hinekan têkilîya xwe bi navan re wenda kirîye. Hinek ji wan daçekan jî hem erka xwe ya navî hem jî erka xwe ya daçekî pêk tînin. Balî (1992) di pirtûka xwe de daçekên wek “ji, li, di” yê wek daçekên berê û daçekên wek “ber, nav, paş, pêş, rex û ser”ê wek daçekên nû şîrove dike. Sedema vê yekê jî ew e ku ev daçekên navî digel fonksîyana daçekan bi hin fonksîyonên din yê leksîkal (lexical) jî radibin.

Di gelek zimanan de daçek ji beşên din yê axaftinê peyvan werdigirin. “Lêker û hoker du çavkanîyên daçekan in, lê belê navder çavkanîyên daçekan yê yekemîn in” (Vghz. Ozyurt ji Heine & Kuteva 2007: r. 10). Di kurdî de jî heman rewş derdikeve pêşberî me. “Daçekên navî, di eslê xwe da navdêr in, lê wekî daçek hatine bikaranîn. Daçekên navî ji bo bi vê peywîrê rabin, lazim e têkevin rewşa daçekan, qertafên navdêran negirin û peyva piştî xwe bitewînin” (Taman, 2018: 14). Di vê mijarê de ji bo daçekan Givon (2001) jî wiha dibêje: Daçek ji du çavkanîyên leksîkal geş bûne: navderên lokasyonel û lêker. Di kurmançî de jî navdêrên wek ser, bin, jêr, jor...û hwd. Digel peywîra xwe ya navderî peywîra daçekan jî bi cih tînin.

Peyvên wek: *ser, bin, ber, nav, dû, rû, rex, nik, gel, jêr, bo, bona, pêş, paş, pêy, cem, wek, mîna, fena nola, heta, heya...*hwd. dikevin vê beşê. Divê bê gotin ku bikaranîna van daçekan ya bi tenê di kurmançî de kême. Ev daçek bêtir bi daçekên xwerû yê wekî bi, di, ji û li yê re tên bikaranîn. Di vê beşê de ji van daçekan yê ku herî zêde tên bikaranîn hatin destnîşankirin.

Daçekên navî û wateyên ku didin hevokan ew in;

i. **Ba**; Ev daçek wateya “licemhevbûnê” dide hevokan.

(19) (a) **Ba** min tiştê tu dixwaze nîne (Balî, 1992: 158).

(b) De, wa dayîka te li wir e, here **ba** wan keçika min (Çakar, 2019: 121).

(c) Rojekê du zilam hatin **ba** Silêman (Çifçi, 2016: 94).

(d) **Ba** min mêvanek heye (Karabax, 2013: 284).

(e) ... tu rasterast buçûyayî **ba** polîs...(Cewerî, 2015: 31).

ii. **Bal**; Ji hêla wateyê ve digel daçeka “ba” yê heman wateyê dide hevokan.

iii. **Bin**; Ev daçek wateya “jêr a kes an tiştan” dide hevokan.

(20) (a) Xweliya wê avête **bin** lingê bergîrê û vegeriya berewê (Çifçi, 16: 7).

(b) Silav dan mîr û derbasî **bin** kon bûn (Baran, 2016: 18).

(c) Fîstanekî xemrî bi ser bejna xwe de berdabû û heta **bin** piyên wê dihate xware (Çifçi, 2016: 91).

(d) Gulçîn hat **bin** dara mezin (Karabax, 2013: 284).

iv. **Cem**; Ev daçek ji hêla wateyê ve wateyên nêzî daçekên “ba” û “bal” ê dide hevokan.

(21) (a) Ku rêber vegerîya het **cem** me wî bi ...(Dilken, 2016: 27).

(b) Ez naçim **cem** wî (Balî, 1992: 159).

(c) ew nikare bê **cem** min (Karabax, 2013: 284).

(d)... hêdî hêdî gundîyên Tûreşîkê jî hatin **cem** me (Dilken, 2016: 19)

v. **Dû;** Ev daçek alîyê paş yê kes û tiştan nîşan dide . Ev daçek “Ji navê dûv yan dûmê hatîye” (Kurdo, 2013: 261).

(22) (a) ...ji nav dernekevin, bidin **dû** û li bersivan, li te bigerin...(Metê, 2013: 100).

(b) ...rêya ku min dabe **dû**, here min lat û di zinaran de werke jî...(Jiyan, 2018: 27).

(c) ...wan kesên xwedî desthilat dan **dû** kîne (Husên, 2015: 20).

(d) Çima di quncikên tarî de te daye **dû** min...(Çakar, 2019: 70).

vi. **Heta;** Ji hêla demê ve sînore rûdanê nîşan dide. Ev daçek “bi sê formên cuda tê bikaranîn” (Balî, 1992: 159). Daçeka “heta” yê carinan wek “ta” yê carinan jî di forma “heya”yê de dikare bê dîtin.

(23) (a) **Heta** kîngê bindestî yê hebe (Balî, 1992: 159).

(b) **Heta** demekê jî ez û ew, em li hundur li hewşa mala Xwedê behas wan mijarên...(Metê, 2013: 9).

(c) Lê bavê min î rahmetî yekî wusa bû ku **heta** mirina xwe ji min re behs nekir...(Metê, 2013: 22).

(d)...**heya** ku bavê min ji masîgirtinê vegerîya (Dilken, 2016: 12).

(e) Di danê wê roja dogehî de û **ta** êvarê kesekî behsa Amîdabada şewitî ...(Husên, 2015: 17).

vii. **Paş;** “Ji alîyê rêgez ve bi navê “paş” ve girêdayî ye” (Kurdo; 2013: 262). Hêla tiştan ya “paş” yan jî cihê tiştan dîyar dike. Ev daçek ji hêla demê ve jî wateya “paş” dide.

(24) (a) Ewil gundiyan xwe ji me da **paş**, dema bû sibe...(Oncu, 2017: 221).

(b) Herçendî min hinekî xwe da **paş**, lê Sandrayê dixwest ...(Yûsiv, 2015: 70).

(c) Rewşen çû **paş** dibistanê (Karabax, 2013: 284).

(d) Ji kêfan devê wî dihere **paş** guhê wî û bi nefret dibêje...
(Jiyan, 2018: 202).

viii. Pêy; Ev daçek wateya berdwama rûdanê dide hevokan. Li gor Kurdo (2013) ev daçek tenê di dîyalekta jorin de tê bikaranîn. Ev daçek bi forma “pey” û “pê” jî tê bikaranîn.

(25) (a) Çima hûn **pêy** doza xwe naçin?

(b) Osmên Pirs kire **pê**, got...(Oncu, 2017: 192).

(c) ...destê wam pare kelepçe kirin paşî xistin **pey** hev û birin zindanê (Oncu, 2017: 187).

(d) Tev evê êş û kêfxweşiyê, mîna ku tiştekî dabe **pey** min û ez jê direvimî mîna ku min dabe **pey** tiştekî û lê digirim (Metê, 2013: 127).

ix. Pêş; Ev daçek di hevokan de hêla tiştan ya “pêş” û “cihê” tiştan dîyar dike.

(26) (a) Ev rêya me **pêş** ve diçû dûr ku dûr (War, 2013: 73).

(b) ...lê ez nikanim van çavên xwe î beloqî ji agir û argûnê **pêş** xwe bikutim (Metê, 2013: 120).

(c) Sîyarê ku bûkê ra dihatin, **pêş** malê ve ketibûne cirîdê (Kurdo, 2013: 262).

(d) Xwe da **pêş** wî û got bimeşin (Baran, 2018: 124).

x. Pişt; Ev daçek jî wekî “paş” ê di hevokan de hêla tiştan ya “paş” dîyar dike. “Hêl û cihê ku tê nîşandan ne qadeke berfireh e” (Baran, 2018: 125).

(27) (a) Pisîk çû **pişt** derî (Baran, 2018: 125).

(b) Bêdengtir bû **pişt** derî (Çakar, 2019: 56).

(c) Bi meşa çar rojan xwe dan **pişt** çîyayên bilind.

(d) Wêneyek li diwarê **pişt** wê xar bûbû...(Çakar, 2019: 111).

x. **Rû;** Ji hêla wateyê ve girêdanek di navbera vê daçekê û navdêra “rû” yê ve heye. Ev daçek ji bo nîşandana rûyê amûr, alav...hwd tê bikaranîn. Digel vê wateyên wek, “cem, ba, bal, hember û nik” ê jî dide hevokan.

(28) (a) Di dersê de herdû heval **rû** hev rûniştin.

(b) Hat **rû** min û ji min re got: Biçe!

(c) Mezinên eşîrê her du ciwan anîn **rû** hev.

(d) Min xwest ez bêm **rû** te rûnim.

xi. **Ser;** Ev daçek wateya “bilindîyê , bilindbûnê û lêzêdekirinê” dide hevokan.

(29) (a) Pêşî şêrên xwe yên bişîûr berdan **ser** van dergehan (Nemir, 2009: 24).

(b) Min kêfa **ser** kelekê dikir û di dilê xwe de digot...(Zeraq, 2009: 24).

(c) ...keserekê vedide û xwe dizivirîne **ser** piştê (Metê, 2014: 19)

(d) ... wekî ku sertacekdanîbin **ser** serê wî (Dilken, 2016: 13).

xii. **Hember;** “Ev daçek ji bo cih û tiştan wateya ceberê, wateya rûqalê dide” (Baran; 2018: 125). Daçeka “pêşberê” jî xwedî heman wateyê ye.

(30) (a) Wê gavê E. M. Noel **hember** serbestîya jinên eşîrê yên servekirî...(Oncu, 2017: 207).

(b) **Hember** min mesekine!

(c) **Hember** gund newaleke mezin heye.

(d) Çendîn caran min got, ezê xwe bidim **hember** wî (Çifçi, 2016: 31).

xiii. Pêşber; Ev daçek digel daçeka “hember” ê xwedî heman wateyê ye.

xiv. Wekî; Ev daçek di hevokan de wateya “şibandinê” dide. Digel watedayînê girêdanê di navbera peyv an hevoka berî xwe û piştî xwe re çêdike. Ew daçek carinan di formên “weku”, “wek”, “weke” û “weku”yê de jî tê dîtin.

(31) (a) ...ku êdî ne **weke** nolineke xam e...(Metê, 2014: 20).

(b) Parastina wan ji ya vê bobelatê ji xwe re **wekî** peywira herî mezin didîtin (Çifçi, 2016: 90).

(c) ...**Wek** dîya xwe ya ku radiweşîne toza geşedanê (Nemir, 2009: 82).

(d) ...ew keçik jî **wekî** ya ku îro bi cêrîyên keybanûyê re ketibû qesra keybanûyê dikulîya (Dilken, 2016: 27).

(e) Dixwest karê xwe yê rojane ku **weku** avakarê piran, **weku** wergêr dihate binavkirin...(Yûsiv, 2015: 7).

xv. Nola, Fena û Mîna; ew her sê daçek jî wateya daçeka “wekî”yê didin. Ango mirov dikare bêje ku ew daçek wateya “şibandinê” didin hevokan.

(32) (a)mîna ku min çav berda be rastiya wî, **nola** ku ez bûme çavnebarê rastiya wî...(Metê, 2013: 102).

(b) **Mîna** lempa bê şewq, şemal,

Mîna gûza pûç, bê kakil,

Mîna serê bêhiş-aqil,

Mîna baxçe bê gul, bilbil,

Mîna meriyê bê ruh û dil (Hesen, 2008: 36).

(c) Tu jî **fena** min bêbextî.

(d) Ew **fena** guran êrîşî mirov dike (Tan, 2011: 189).

xvi. Ber; Ev daçek wateya “pêşîya cih, der an tişteki” dide hevokan. Taman (2018) ji bo peywira vê daçekê wiha dibêje : “Ev daçek, wateya cihê ku bûyer ber bi wê ve diqewime didêre” (Taman, 2018: 36).

(33) (a) Pêxemberên derewîn, serfirazî û serkeftinên bedbîn bidin **ber** guleyan (Laleş, 2011: 28).

(b) Em diçûn **ber** taqên bajaran me şîtafêk dida xwe (Nemir, 2009: 32).

(c) ...min ji bo me hemûyan nan û av daye **ber** wan...(Metê, 2014: 26).

(d) Ez gihîştim **ber** derîyê mezin ê Eddesayê...(Dilken, 2016: 12).

xvii. Nav; Ev daçek wateya “dinavdebûnê” dide hevokan.

(34) (a) Ev ketin **nav** avê (Karabax, 2013: 284).

(b) **Nav** konan paqij dike (Baran, 2018: 124).

(c) Osman Sebîr bi vê şêwazê xwe gihand **nav** gundên eşîra Îzolê Bendê (Oncu, 2017: 172).

(d) Em **nav** hev de bi xweşî û qencî bijîn (Kurdo, 2013:267).

2.1.1.4. Daçekên Hevdudanî

Daçekên hevdudanî dema ku ji daçekê zêdetir daçek bîna cem hev derdikevin holê. “Daçekên hevdudanî bi du awayan tên çêkirin. Di awayê ewil de, pêşdaçekên xwerû (bi, li, ji, di) tên ber daçekên navî (ber, bin, bo, dû, nav, nik, pêş, paş, rex, ser...) û daçekên hevdudanî tên çêkirin. Di awayê diduyan da jî daçekên navî dikevin nav bazindaçekan (bi...da, bi...ra, bi...ve, di...da, di...ra, ji...da, ji...ra, ji...ve) û daçekên hevdudanî tên çêkirin” (Baran, 2018: 125).

2.1.1.4.1. Daçekên Hevdudanî yê Koma Ewil

Her wekî ku hatîye destnîşankirin di daçekên hevdudanî yê koma ewil de daçekên wek “bi, di, ji û li”yê tên ber daçekên navî. Ew awa ji bo kurmancî hejmareke

zêde ya daçekan dide. Di vê beşa daçekan de ji xeynî daçeka “di”yê daçekên din yê xwerû gelek çalak in. Gelek nimûneyên daçekan ji wan û daçekên navî tên çêkirin. Lê belê ji bo daçeka “di”yê heman tişt nikare bê gotin. Daçeka xwerû “di” ji xeynî yek du nimuneyan bi daçekên navî re zêde nayê bikaranîn. Nimûneya daçeka “di gel”ê yek ji wan e .

a) Daçekên Hevdudanî ku bi Daçeka Bi û Daçekên Navî Çêdibin;

Daçeka xwerû “bi” û daçekên navî yê wek “ber, ser, pêş, paş, nav, bin...hwd” tên gel hev û daçekên hevdudanî yê koma ewil çêdikin. Ev daçek “ wateya çûna ber bi cihekî dide wan” (Baran, 2018: 126).

- (35) (a) Hevind di vê lîstikê de **bi bin** avê ketiye (Tan, 2011: 188).
- (b) ...zarokên **bi ser** lingan ketî dane pey siwariyên qesrê (Dilken, 2016: 11)
- (c) Bi xebatê xwe **bi pêş** xistin.
- (d) Çê û xirab **bi nav** hev ketin.
- (e) ... tu bi **dû** ketibûyî û qederê destê te xistibû destê vê xatûnê (Cewerî, 2015: 28).
- (f) Carinan ew jî **bi ber** çavên min diketin (Dilken, 2016: 23).

b) Daçekên Hevdudanî ku bi Daçeka Di û Daçekên Navî Çêdibin;

Her wekî ku li jor jî hat destnîşankirin daçekên ku dikevin vê binbeşê pir kêmtir in. Bêtir bikaranînen “di” yê bi daçeka navî “gel” ê re heye

- (36) (a) Dostên me **di ber** wî didin (Baran, 2018: 126).
- (b) Ez jî dixwazim **di gel** te werim.

c) Daçekên Hevdudanî ku bi Daçeka Ji û Daçekên Navî Çêdibin;

Daçeka xwerû “ji” û daçekên navî yê wek “ber, ser, pêş, paş, nav, bin û hwd.” tên gel hev û daçekên hevdudanî yê koma ewil çêdikin. Ev daçek “ wateya

jêderketinê dide wan” (Baran, 2018: 128). Hin caran jî wexta ku bi daçeka “ber” rê tê bikaranîn wateya “sedemê” (37-a) dide hevokê.

- (37) (a) **Ji ber** sermayê berê xwe dan cih û warên germ.
(b) **Ji nav** ciyan derketim...(Zeraq, 2009: 27).
(c) ...dev ji wan bernedida, **ji dû** wan venedigeriya (Jiyan, 2018: 234).
(d)... titûn **ji ber** çavên min wenda nabe...(Metê, 2014: 21).
(e) Ew **ji bal** we tê (Taş, 2013: 158).
(d) ...hem min dixwest li ba wî bim, hem min dixwest **ji ba** wî biçim... (Çakar, 2019: 92).

d) Daçekên Hevdudanî ku bi Daçeka Li û Daçekên Navî Çêdibin;

Daçeka xwerû “li” û daçekên navî yên wek “ber, ser, pêş, paş, nav, bin û hwd.” tên gel hev û daçekên hevdudanî yên koma ewil ku bi “li” yê çêdibin derdikevin meydana. Ev daçek “ wateya bûn û lêbûna cihekî dide wan” (Baran, 2018: 128).

- (38) (a) ...hatin **li ber** xaniyê ...li jêr perestgehê...(Dilken, 2016: 38).
(b) ...**li cem** mazûbên xwedî xatir e (Dilken, 2016: 49).
(c) Terîya mar çîrûsçîrûsî, **li nav** pîya kirasê qirûsqirûsî (Laleş, 2011: 60)
(d) ... **li ser** asîmanê ku sepeta hêjîr û tirî tê de.(Fîlîk, 2015: 41).
(e) ... min serê xwe rakir **li pey** wan nihêrî...(Dilken, 2016: 12).
(ê) ...**li paş** maseyên ji kevirên mermer gelek rûspî rûniştibûn (Dilken, 2016: 28).
(f) **Li bin** darê li kêleka kanîyê keçîkek rûniştibû (Dilken, 2016: 40).

2.1.1.4.2. Daçekên Hevdudanî yên Koma Duyem

Di vê komê de daçekên navî yên wek “ber, bin, bo, dû, nav, nik, pêş, paş, rex, ser”... û hwd. dikevin navbera bazindaçekan. Her wekî ku berê jî hatibû dîyarkirin bazindaçekên kurmancî ev in: “bi...de”, “bi...re”, “bi...ve”, “di...de”, “di...re”, “ji...de” û “ji...re”.

a) Daçekên Hevdudanî ku bi Bazindaçekên Bi yê Çêdibin;

Bazindaçekên ku bi “bi”yê çêdibin ev in: bi...de, bi...re, bi...ve, ev bazindaçek bi daçekên navî re tên hev û wateyên cur bi cur li hevokan zêde dikin.

- i. Bazindaçeka “bi...de”yê bi daçekên navî yên wek “bin, ser, paş û pêş” ê re tê bikaranîn. Di vê bikaranînê de wateya “ çûn û hatin, li ser û berpêbûnê dide wan” (Baran, 2018: 126). Di vê cureya daçekan de bi gelemperî di hevokan de pêşî daçeka “bi” yê di pey re jî daçekên navî tên. Lê belê ew, dema ku daçeka “bi” yê bi daçeka “ber”ê re tê bikaranîn diguhere. Her wekî ku di mînakên (39b) de jî xuya dibe pêşî daçeka “ber”ê piştî daçeka “bi”yê tê.

- (39) (a) Wê cara ku ew **bi ser** min **de** qirîyabû...(Zeraq, 2009: 27).
(b) Ez bi gavên bisemt **ber bi** koma mirovan **ve** dimeşîyam (Zeraq, 2009: 29).
(c) Tu nêzikî wê bûyî, ew **bi paş de** vekişîya (Cewerî, 2015: 25).
(d)...**bi nav** derengîya şevê **de** ajotin (Dilken, 2016: 44).
(e) **Bi** vegera xwe ya **cem** min **re**, her roj dixwest piştrast bike...(Yûsiv, 2015: 26).

- ii. Bazindaçeka “bi...re” yê bi daçekên navî yên wek “ser, dû, paş û pişt”ê re tê bikaranîn. Ev daçek di vê bikaranînê de wateya “ paşî yê dide ” (Baran, 2018: 127).

- (40) (a) ...dareke mazê ya mezin û sî fireh gulîyên xwe **bi ser** holê **re** vekiribûn (Dilken, 2016: 39).

(b) Ji pirsî hebûna wê bigire hetanî bi wateya wê û tiştên ku **bi dûv re** tên (Yûsiv, 2015: 19).

(c) ... lê te dîsa zûka destê xwe bi paş ve kişand (Cewerî, 2015: 28).

(d) Niha na, lê **bi dû re** wê li welatê Baktrîyayê di zindanê de biriziya (Jiyan, 2018: 27).

iii. Bazindaçekî “bi...ve” yê bi daçekên navî yên wek “du, paş, pişt, ber, ser û bin” ê re tê bikaranîn. Ev daçek di vê bikaranînê de wateya “ çûn û hatina ber bi cihekî, pêrabûn, zeliqandinê dide wan. ” (Baran, 2018: 127).

(41) (a) Artêş **ber bi** rojhilatî **ve** çû (Baran, 2018: 127).

(b) Çima tu derî **bi ser** derîyê me **ve** venabin ? (Laleş, 2011: 61)

(c) Çêlik **bi dû** mîrîşkê **ve** ne.

(d) ...weke porê wê reşekî **bi ser** morê **ve** bû (Metê, 2014: 12).

(e) Hinekî **bi paş ve** vekîşîya (Çifçi, 2016: 10).

b) Daçekên Hevdudanî ku bi Bazindaçekên Di yê Çêdibin;

Bazindaçekên ku bi di yê çêdibin ev in: di...de û di...re. Daçekên navî yên wek “ber, ser, du , pêş, paş, pişt” û hwd. dikevin navbera van bazindaçekan û wateyên cur bi cur didin hevokan. Daçekên hevdudanî ku bi vî awayî çêdibin û wateyên wan ev in:

i. Bazindaçekî “di...de” yê û daçekên navî yên wek “ber, bin, pişt, dû, pêş, rex, nik, nav, ser” û hwd tên bikaranîn û wateyên wek “têdabûn û şûnê dide wan” (Baran, 2018: 127).

(42) (a) Erdnîgariya ku **di bin** destê rêveberîya Meletîyê **de** bû...(Dilken, 2016: 31).

(b) Bi qasî quretiya wê, sînga wê jî **di pêş de** bû (Çifçi, 2016: 91).

(c) ...**di nav** odayê **de** çûm û hatim lê baş tê negîhiştim...(Zeraq, 2009: 27).

(d) ...**di ber** mirinê **de** min ê destê helala xwe bixwesta...(Metê, 2014: 20).

(e) Demodîn **di ser** paşîva xwe **de** bêtir xwar dibe...(Metê, 2014: 23).

ii. Bazindaçeka “di...re”yê û daçekên navî yên wek “ber, bin, pişt, du, pêş, rex, nik, nav, ser” û hwd tên bikaranîn û wateya “derbasbûnê dide wan” (Baran, 2018: 127).

(43) (a) ... ku dilê min kiribû warê mesîla xwe û **di nav** sînga min **re** diherikî (Zeraq, 2009: 23).

(b) ...perçeyê din jî **di bin** gulîyê porê wê **re** berjêr ibî...(Dilken, 2016: 40).

(c) Li vegeerê, ez **di ser** Fîlîstîn û Sûriyeyê **re** derbasî Anatolîyê bûm (Dilken, 2016: 30).

(d) **Di ser** deriyê vê dikana piçûk **re** tabelayeke...(Metê, 2014: 73).

(e) Wan **di pişt** xwe **re** zar û zêç hiştin (Taş, 2013: 159).

c) Daçekên Hevdudanî ku bi Bazindaçekên Ji yê Çêdibin;

Bazindaçekên ku bi ji yê çêdibin ev in: ji...de, ji...re û ji...ve. Daçekên navî yen wek “ber, ser, du, pêş, paş, pişt” û hwd dikevin navbera van bazindaçekan û daçekên hevdudanî çêdikin. Ev daçekên hevdudanî wateyên cur bi cur didin hevokan. Daçekên hevdudanî ku bi vî awayî çêdibin û wateyên wan ev in:

i. Bazindaçeka “ji...de”yê û daçekên navî yên wekî “ber, ser, du, pêş, paş, pişt” û hwd bi hev re tên bikaranîn û daçekên hevdudanî pêk tînin. Daçekên navî dikevin navbera pêşdaçekê û paşdaçekê. Bi vî awayî ev daçek wateya cihê ku “rûdan diqewimê” û “dest pê dike” dide hevokan

(44) (a) Kera me **ji bin** giranîya êzingan **de** ket.

(b) Gur **ji paş** devîyekê **de** revîya.

(c) Ew **ji ber** wî **da** dileyîzin (Baran, 2018: 127).

ii. Bazindaçeka “ji...ve”yê û daçekên navî yên wekî “ber, ser, dû , pêş, paş, pişt” û hwd bi hev re tên bikaranîn û daçekên hevdudanî pêk tînin. Daçekên navî dikevin navbera pêşdaçekê û paşdaçekê. Bi vî awayî ev daçek cihê ku “rûdan diqewimê û dest pê dike” dide hevokê.

(45) (a) Fîstanekî bi yek pîyî, hevreşîmî **ji ser** milekî wê **re** berdabû ... (Dilken, 2016: 40).

(b) **Ji paş** maşînê **ve** derket.

(c) Mal **ji bin** asasî **ve** hilweşî (Baran, 2018: 129).

(d) Mala me **ji bin** kokê **ve** çû.

iii. Bazindaçeka “ji...re”yê û daçekên navî yên wekî “ber, ser, du , pêş, paş, pişt” û hwd bi hev re tên bikaranîn û daçekên hevdudanî pêk tînin. Daçekên navî dikevin navbera pêşdaçekê û paşdaçekê. Bi vî awayî ev daçek wateya “cihê ku rûdan diqewimê û dest pê dike” dide hevokê.

(46) (a) Siwarî **ji ser** pireya Chabînas **re** derbas dibûn... (Dilken, 2016: 38).

(b) Pîncikên tûtin **ji bin re** jê ke.

(c) ...li zindana Sêrtê dibeha **ji dûv** bangê melê **re** hatibû înfaz kirin (Oncu, 2017: 187).

(d) Û **ji pişt re** jî wekî ji edetê pirsên... (Dilken, 2016: 48).

2.2. Daçek û Tewang

Tewang, taybetîyeke zimanê kurdî ye. Di zaravayê kurmancî de jî tewang bi awayekî berfireh tê dîtin. “Di kurdî de navdêr (cihnav, veqetandek, hinek rengdêr) di sê rewşan de derdikevin pêşberî mirov: rewşa xwerû (direct case), rewşa banglêkirinê (vocative case) û rewşa tewandî” (Tan, 2011: 90). Tewang di zimanê kurdî de bi du avayan çêdibe. Di awayekî de tewang bi qertafên tewangê (-ê, -î, an) çêdibe. Di awayê

din de peyv di hundir de diguherin. Bi bandora daçekan peyvên li pêy daçekan jî bi van herdu awayan ditewin. “Ji xeynî hevalnavên resen û ravekên hevalnavî hemû peyv û ravekên li du daçekan ditewin” (Taş, 2013: 160). Dema ku li pêy daçekekê navdêrek bê ditewe, li pey daçekan cihnavên tewandî tên bikaranîn.

- (47) (a) Min **ji te** re stranek gotibû.
(b) Zarok **li** kerê siwar dibû.
(c) **Ji** Solinê re diyariyek anî.
(d) Kes **li** Robêr nanihêre (Tan, 2011: 194).
(e) Av **di bin** qeşayê re diherike.
(ê) Zarok **li** bajêr dixebitin.
(f) Li bin **baran**
Li ser **berfan**
Ba û bager
Li şikeft**an**
Di bin dilop**an**
Bi lingê xwas
Bi canê tazî
Karwanê me diçe
Ber bi armanca **xwe** (War, 2013: 88).

2.3. Daçek di Çêkirina Peyvan de

Daçek digel wateyên ku li hevokan zêde dikin hin peywirên din jî pêk tînin. Ev cureyên peyvan di çêkirina lêker, cihnav, rengdêr hoker û gihanekan de xwedî rol in. Di kurmancî de cihnav û lêkerên ku bi daçekan tên çêkirin pir çalak in û pir tên bikaranîn. Her wiha gihanekên bi daçekan çêdibin jî rola daçekan ya girêdane derdixe pêşberî me.

2.3.1. Daçek di Çêkirina Navdêran de

Daçek, wekî gireyên peyvçêker, bi çêkirina navdêran radibin. “Ji bêjeyên ku heyberan, hestan, dîyardeyan, rewşan û fikran dîyar dikin re navdêr tê gotin” (Malmîsanîj, 2015: 67). Di çêkirina navdêran de hem daçekên xwerû hem jî daçekên navî tên bikaranîn. Deçakên ku bi vê peywirê radibin dikarin wekî pêşgir an jî wekî paşgir bîr bikaranîn.

Digel daçekên navî û daçekên xwerû ku peyvan çêdikin, cihnavên lihevxiştî yê wekî “lê, jê, pê, tê” yê jî bi çêkirina navdêran radibin. Û ev cihnav jî tê zanîn ku ji daçekan hatine darijtin.

Bêjeyên wek, *serçavî*, *bermal*, *bêmal*, *bêkar*, *bikir*, *bikûj*, *jêbir*, *pênûs*, *lênûsk*, *şerjêkirin*...hwd. ji navdêrên ku bi daçekan çêdibin hinek in.

- (48) (a) Av di **serçavîyê** de şelî bûye.
- (b) ...di navbera wî û leşkeran de şer û **pevçûnên** giran derketin (Oncu, 2017: 212).
- (c) Ev **tevlîhevî** hemu mîna birûskeke zivistaneke dîn di ser min re derbas bû (Yûsiv, 2015: 26).
- (d) Kurd tu caran ji **bikujên** xwe netirsîne.
- (e) Dadger ji bo **biçûkxistina** Ûzêr Axayê Silopî mafê axaftinê ...(Oncu, 2017: 186).
- (ê) ...bûyera ku hatî serê cîwanmêrên **bêguneh** re weke ku şînek li wir bê danîn...(Oncu, 2017: 188).

2.3.2. Daçek di Çêkirina Lêkeran de

Hêmana ku di hevokê de liv û tevgerê nîşan dide lêker e. Liv û tevgera di lêkeran de her û her devam dike. Gîvon (2001) peyvên di zimanan de dike du cure: koma major û koma mînor. Lêker di koma major de ne. Dû re dibêje ku tu ziman bê lêker nabin hemû zimanan de lêker hene. Li ser girîngîya lêkeran Tan wiha dibêje: “di nav cureyên peyvan de ya herî girîng û berfireh lêker e” (Tan 2011: 205). Dema ku hevokek bê lêker be, ji hêla wateyê ve ev hevok wê kêr be. Di kurmancî de hin

rêbazên lêkerçêkirinê hene. Bi daçekan lêkerçêkirin jî ji wan rêbazan yek e. Daçek bi erka xwe ya gireyî lêkerên nû ji lêkerên din çêdikin.

Lêkerên ku bi daçekan çêdibin ji hêla lêkolîneran ve bi navên cuda hatine dabeşkirin. Ev lêker ji hêla Tan ve wek lêkerên pêkhatî, ji hêla Baran ve lêkerên hevdudanî û ji hêla Mîr Celadet ve jî di bin beşa lêkerên hevedudani de hatîye vegotin. Di van hersê xebatan de xala sereke ew e ku daçek di çêkirina lêkeran de wekî gire xwedî roleke girîng in.

a- Daçek di Çêkirina Lêkerên Hevdudanî de

Ev cure lêker di kurmancî de zêde berbelav û çalak in. “Lêkerên hevdudanî bi lêzêdekirina hêmanên derlêkerî ku ji lêkerên xwerû tî zêdekirin tî bi desxistin” (Bedirxan & Lescot, 2013: 141). Li gor Tan “lêkerên hevdudanî ji çend hêmanên serbixwe pêk hatine” (Tan, 2011: 246). Di lêkerên hevdudanî de hêmana bingeîn lêker e. Hêmanên din ên derlêkerî ku ji lêkerê tî zêdekirin hêmanên wek daçek, navdêr, hoker û rengdêr in. Hêmanên derlêkerî her yek xwedî rol û wateyên cuda ne; lê belê di lêkaran de digel lêkerê bi hev re dibin xwedî wateyeke nuh.

Dema ku lêkerên hevdudanî bi daçekan tî çêkirin, daçekên xwerû, daçekên navî û daçekên hevdudanî dikarin di wan lêkeran de cih bigirin. Tê dîtin ku di wan lêkeran de hêmana derlêkerî carinan pêşdaçekeke xwerû, carinan bazindaçekek û carinan jî daçekeke navî ye.

Dibe ku di lêkerên hevdudanî de hêmana derlêkerî daçekeke xwerû be;

- (49) (a) Wî lawikî bi xeletî **li** hevalê xwe **xist** (Tan, 2011: 256).
(b) Dema ku we **bi tişteki girt** hûn bernadin (Tan, 2011: 256).
(c) Zarok **li hev nedihatîn**.
(d) Koçer li jora gund **bi cih bûn**.

Dibe ku di lêkerên hevdudanî de hêmana derlêkerî daçekek hevdudanî be;

- (50) (a) Çê û xirab **bi nav hev ketin**.
(b) Bavê min **bi ser min de hat**.

(c) Ez qet **li ber** mirovên wiha **nakevim**.

(d) Di hemû ezmûnan de **bi ser ket**.

Dibe ku lêkerên hevdudanî de hêmana derlêkerî cinavkeke lihevxiştî be;

(51) (a) Bi lorandinê **dest pê dike** werza aşitîyê (Laleş, 2011: 21).

(b) ...li ser pîyan ji wî re çepik **lêdabûn**...(Dilken, 2016: 12).

(c) ...çi pêdîvîya me hebe **pêk bînin** û ji me re bibin alîkar

(Dilken, 2016: 19).

(d) We gulîyên darê **jê kirin** (Baran, 2012: 173).

(e) ... di navbera herdû zinarên ku milên kelehê li ser hatibûn **lêkirin**...(Dilken, 2016: 23).

Lêkerên hevdudanî carinan dibin qalib û wateyên mecazî didêrin. “Lêkerên biwêjî ji çendîn hêmanên ne lêker (daçek, cînav, rengdêr, navdêr) û lêkereke xwerû yan jî ji lêkereke hevdudanî pêk tên” (Bedirxan & Lescot, 2013: 217). Lêkerên biwêjî ji hêla wateyê ve ji lêkerên hevdudanî cuda dibin. Lêkerên biwêjî wekî ku ji navê wan jî tê famkirin di forma biwêjan de ne. Ev lêker xwedî wateyên mecazî ne. Bedirxan & Lescot (2013) lêkerên biwêjî ji lêkerên hevdudanî vediqetînin û di bin beşeke cuda de dinirxînin.

Lêkerên wek: *lêsiwarbûn, lêşorkirin, devjêberdan, bawerîpêanîn, lêguhdarîkirin, bidûrketin, pêbilîbûn, têwerkirin*...hwd ji wan lêkeran hinek in.

(52) (a) Ji xeynê vê, bavê wî her çar birayên wî jî **lê sor kiribû**... (Jiyan, 2018: 15).

(b) Pêr êvarê **li xwe mikur hat** (Taş, 2013: 184).

(c) ...kuçikên gind bi hûr û giran **bi hev ketin** (Oncu, 2017: 182).

(d) Mirovekî bê ar e, qet li **ber xwe nakeve**.

(e) Ez **pê hisiyam** ku tabloya li ber mi tenê dilopek.. (Yûsiv, 2015: 33).

2.3.3. Daçek di Çêkirina Cihnavan de

Cihnav “Navlêkirina herî giştî ye. Ev navlêkirin, hemû heyber û bûyeran, ango temamê agahîyên mirovan, di serî de di pîvana mirov- heyber de di nav çend pîvanan de kom dike” (Karaağaç, 2013: 492). Di axaftin an jî di nivîsê de cihnav ji dewsa navdêran tên bikaranîn. Bê vê yekê hem axaftin hem jî nivîsîn bêtir herikbar dibe. Wekî ku hatîye destnîşankirin cihnav cihê navdêran digirin lewma “taybetîyên navdêran derbasî cihnavan dibin” (Tan, 2011: 121). Di kurmancî de taybetîyên navdêran yên wek zayend, yêkjimarî û pirjimarî, xwerûbûn û tewandîbûn di cihnavan de jî tê dîtin. Daçek di çêkirina cihnavên lihevxiştî de xwedî erk in. Lewma li jêr tenê qala cihnavên lihevxiştî hatîye kirin.

2.3.3.1. Cihnavên Lihevxiştî

Carinan daçek û hin cure cihnav tên cem hev û formeke cihnavan a nû pêk tînin. Di dema pêkanîna vê forma nû de hin guherîn hem di daçekan de hem jî di cihnavan de pêk tên. Û piştî guherîna bi herdû alî cureyeke cihnavan ya nuh der tê. Ev cure cihnav cihnavên lihevxiştî ne. Cihnavên lihevxiştî bi du awayan çêdibin:

a- Cihnavên Lihevxiştî bi Cihnava Berbihevîn

“Daçek û cihnavên berbihevîn (êk/hev) dibin yek û cureyeke cihnavên lihevxiştî pêk tînin” (Tan, 2011: 142). Bi vî awayî ev cihnav pêk tên:

i. **Ji û hev** tên gel hev û radicivin û cihnava lihevxiştî **jev** pêk tê.

(53) (a) Zarok bi zorê **jev** qetîyan.

(b) Xerîbîyê em **jev** dût xistin.

(c) Karkeran benik **jev** vediçirandin.

ii. **Bi û hev** tên gel hev û radicivin û cihnava lihevxiştî **pev** pêk tê.

(54) (a) Piçik û zereyên tozê **pev** difirin û bi ser min de tên... (Zeraq, 2009: 11).

(b) ... rokê **pev re** ranebûne û rûnenîştine hema digo... (Fîlîk, 2015: 13)

(c) Peyv û hevok ber bi binê risteyan ve **pev** direvin (Zeraq, 2009: 13).

(d) ... me fersend nedît ku em **pev** bişêwirin, bê ka em ê vî çî bikin (Fîlîk, 2015: 54).

iii. Li û hev tên gel hev û radicivin û cihnavaya lihevxiştî **lev** pêk tê.

(55) (a) Gul û sosin **lev** hatine.

(b) Mezinan zorokên ji hev xeyidî **lev** anîn.

(c) **Levdana** wan tiştekî sosret bû.

(d) Şal û şapik **lev** hatine.

iv. Di û hev gel hev û radicivin û cihnavaya lihevxiştî **tev** pêk tê.

(56) (a)...nemaze yê taxên dewlemend **tev** li xîş û cawên xwe yê giranbuha...(Husên, 2015:13).

(b) Pêşengên eşîrê kiras û meras **tev** tekûz kirin (Çifçi, 2016: 15).

(c) ... wê heval **tev** şaş bimînin...(Fîlîk, 2015: 57).

(d) ... bila heval **tev** werin mala me xwarinê bixwin (Fîlîk, 2015: 57).

v. Ji û êk tên cem hev, radicivin û cihnavaya lihevxiştî **jêk** pêk tê.

(57) (a) Destê kurik û bavê kurik **jêk** bû.

(b) Tu kes nikare destên me **jêk** bike.

(c) Neyarên hezkirinê û evînê em **jêk** cuda kirin.

vi. Bi û êk tên cem hev û radicivin û cihnavaya lihevxiştî **pêk** çêdibe.

- (58) (a) Em **pêk** ve ne gewdeyên me li dûrî biviran (Nemir, 2009: 16).
- (b) ...berê **pêk**guhertina keçikan bû, belê a niha ya derew û ... (Silêvanî, 2011: 16).
- (c) Ez û Zozan em ê **pêk** ve biçin (Tan, 2011: 143) .
- (d)... alavên cengê û yen çêkirina amanên xwarin, vexwarinê **pêk** dihat...(Dilken, 2016: 14).

vii. Di û êk tîcîm hev û radicivî û cihnavî lihevxiştî **têk** çêdibe.

- (59) (a) **Têk** de çî bû qey? Qal û Qireke bedew hişt lêk da,
Li gel gîyanekî nalebar, yekî har î sar **têk** da. (Nemir, 2009: 78).
- (b) ...Rênas tû rênas î, çiyayên enternasyonal **têk** de dinasî (Nemir, 2009: 36).
- (c) Te dît, çawa ew **têk** birin (Tan, 2011: 143) .
- (d) ...axaftineke sar şeva me – ya ku divê taybet be – **têk** da, wî got...(Silêvanî, 2011: 74).

b- Cihnavên Lihevxiştî bi Daçekan û bi Cihnavî “ê”

“Ev daçekên navborî bi cihnavî “ê” yê ve digihêjin hev û cihnavên lihevxiştî derdikevin holê” (Tan, 2011: 143). Dema ku daçek û cinavk tîcîm hev radicivî. Ji ber ku di pêkhatina cihnavên wiha de racivîn pêk te hewce ye ku di vir de bi kurtî qala racivînê bê kirin. “Ziman her ku diçe barê xwe sivik dike û pratîze dibe. Ji bo herikbarî û kurtbûnê, hinek kîteyên peyvan ciyên xwe didin dengdêrên dirêj ji vê yekê re racivîn tê gotin” (Baran, 2012: 30). Ji racivîna van daçek û cihnavî “ê” yê cihnavên lihevxiştî çêdibin.

Cihnavên lihevxiştî ku bi cihnavî ‘ê’ yê û daçekan çêdibin ev in:

i. Bi û ê tîcîm gel hev û radicivî cihnavî lihevxiştî **pê** pêk tê.

- (60) (a) **Pê** xweş dibû sed lal û şil
Pê ron dibû sed çav û dil

Pê rast dibû dal û mudil

Ey ku sirra şêx vêketê (Sadinî, 2013: 250).

(b) Vê kêlîyê ew **pê** dizane, hûn **pê** nizanin (Nemir, 2009: 24).

(c) Ji peyva hezkirinê **pê** ve tu tiştî nexwe (Laleş, 2011: 60).

(d) Vê carê jî dilê xwe **pê** raneke ha (Fîlîk, 2015: 14).

ii. **Li û ê** tên gel hev û radicivin cihna lihevxiştî **lê** pêk tê.

(61) (a) ...seyareyeke leşkerî hat li ber qonaxa em lê diman rawestiya (Dilken, 2016: 19)

(b) ... ku destê min vala bû ez ê **lê** bigerim... (Fîlîk, 2015: 13).

(c) ...em **lê** rûdiniştin(Dilken, 2016: 23).

(d) ... çav **lê** ye ku em jê re xenî bibînin hevala bibînin û tê de bi cih bikin (Fîlîk, 2015: 55).

iii. **Di û ê** tên gel hev û radicivin cihna lihevxiştî **tê** pêk tê.

(62) (a) **Tê** derdixî ku çawa çav dikevî hev (Nemir, 2009: 25).

(b) ...bi siwarî **tê** re dikete hundirê kelehê ew derî bû (Dilken, 2016: 12).

(c) ...asoya derûnê vedimirîne û agirê dojahê **tê** de hildike (Silêvanî, 2011: 52).

(d) ... çav **lê** ye ku em jê re xenî bibînin hevala bibînin û **tê** de bi cih bikin (Fîlîk, 2015: 55).

iv. **Ji û ê** tên cem hev û radicivin cihna lihevxiştî **jê** pêk tê.

(63) (a) ...û wek bêhna jinên li hundir **jê** were...(Dilken, 2016: 11).

(b) ...heke hûn nexwazin ez **jê** ava me û serektîya qawîşê didim we (Oncu, 2017: 131).

(c) Min navê Keyserê Zana **jê** re nivîsî (Dilken, 2016: 15).

(d) ... nexwe hay **jê** nîne cazûyê (Fîlîk, 2015: 13).

2.3.4. Daçek di Çêkirina Rengdêran de

Wekî navdêr, cihnav û lêkeran di çêkirina rengdêran de jî daçek xwedî rol in. Rengdêr “Ev cure peyv hevaltiya navdêrê dike û wê ji aliyê rewş, çendanî û çawanîyê dide nasîn” (Tan, 2018: 65). Her wekî ku ji pênaseya Tan jî xuya dibe rengdêr taybetîyên navdêran yên wekî: rewş, teşe, hejmar, reng û hwd. dîyar dîkin. Ji bo ku Bedirxan (2010) rola rengdêran zelaltir bike wiha dibêje: “Her wekî gava em “hespê reş, hespê beza, hespê xurt” dibêjin “reş, beza, xurt” rengdêr in”. Dîyar e ku ev rengdêr hin wesfên navdêran yên wekî reng û taybetî dîyar dîkin. Bi daçekan gelek rengdêr dikarin bên çêkirin.

Rengdêr ji hêla sazûnê ve”dibin du birên sereke; xwerû û nexwerû yên nexwerû jî dibin du cure: hevdudanî û pêkhatî.” (Tan, 2011: 160). Daçek rengdêrên xwerû û pêkhatî çêdikin.

a) Daçek di Çêkirina Rengdêrên Hevdudanî de;

Her wekî ku hat gotin rengdêrên hevdudanî cureyekê rengdêran e ku di sazûna wan de daçek xwedî rol in. “Hevalnavên² ji çend hêmanên serbixwe hatine pê. Peyvên ku wan pêk tînin jî bi serê xwe xwedîyê wateyekê ne, lê hevalnava nû wateyeke nû digire” (Tan, 2011: 160). Ev rengdêr wiha çêdibin; hin caran daçekeke navî tê ber navdêrêkê, hin caran jî daçekeke navî, daçekeke xwerû û navdêrekê tê gel hev. Tan (2011) ji bo vê wiha dibêje: “ Hin caran daçekekê tê ber navdêrêkê yan jî dikeve navbera du navdêran û hevalnavekê pêk tîne” (Tan, 2011: 161).

Rengdêrên wekî, *devbixwîn*, *dilbikûl*, *dilbîêş*, *berdest*, *çavîrê*, *liberşîr*...hwd ji van rengdêrên ku bi daçekan çêdibin hinek in.

- (64) (a) Evîndarê **dilbikûl** di nav bîranînên xwe de vedigevizî.
- (b) Dijminên **devbixwîn** her roj ciwanek qir dikirin.
- (c) Mirovên **berdestî** ne xwedî vîn in.
- (d) Zarokên **liberşîr** bêyî dîya xwe nikarin bijîn.

²Rengdêr ji hêla Tan (2011) wekî hevalnav hatine binavkirin.

(e) ...mîna korekî bêhiş bi dest û ling xwe avêt nav agirê Bêrîvana **lihevhatî** (Yûsiv, 2015: 21).

b) Daçek di Çêkirina Rengdêrên Pêkhatî de ;

Her wekî ku hat gotin daçek hin caran wek gireyên çêker tevdigerin û peyvên nû çêdikin ji van peyvan birek jî rengdêrên pêkhatî ne. Rengdêrên pêkhatî ji du hêmanan pêk tên. Ji wan yek bi wate ye ya din jî gire ye û bêwateye. “Daçekên “bi” û “bê” û hokerên mîna “ser-”, “bin-” , “ber-” tên ber navdêran û pê hevalnav çêdibin” (Tan, 2011: 162). Her çend ku Tan peyvên wek “ser”, “bin” , “ber”ê wekî hoker dîyarkiribin jî ev peyv di heman demê de daçek in jî. Daçek dema ku bi vê peywirê radibin tenê daçekên xwerû “bi, bê, ji, li” wekî pêşgir tên bikaranîn.

Peyvên wek *bêmal, bêkar, bikir, binav, bihêvî, bimûriz, likar, lirê, limal, jidil* ...hwd. ji wan rengdêran hinek in.

(65) (a) Ew kesê **bêcîr** bi kû da çû? (Taman, 2018: 58).

(b) Hin caran rêya me di ber kendalên **bêbinî** re jî derbas dibû... (Oncu, 2017: 220).

(c) Li ser vê yekê piştî xwe didin çîyayên **binamûs** heta îro jî...(Oncu, 2017: 211).

(d) Makîneya **likar** gelek kêrî me hat.

(e) Kesên **bêwîcdan** agir ber daristanên li çîyayan dida.

2.3.5. Daçek di Çêkirina Gihanekan de

Gihanek ew cure peyv in ku gihandina peyvan û hevokan radigirin ser xwe. Her wekî hat dîyarkirin daçek peywira gihanekan jî digirin ser xwe angî gihanekên nuh çêdikin û bi vê yekê peyvan û hevokan bi hev ve girê didin. “Hinek hêmanên ku bi daçekan çêbûne, carna bi peywira gihanekan jî radibin. Ev gihanekên ku bi alîkarîya daçekan hatine çêkirin bi piranî di nav du hevokan da cih digirin” (Taman, 2018: 57-58).

Gihanek û daçekên xwerû her du jî cureyên peyvan yên bê wate ne. Angî bi tena serê xwe wateya van her du cureyan jî nîne. Ev her du cure di nava hevokê de dibin xwedî wate. “Taybetîya herî berbiçav ya ku daçek û gihanekan ji hev vediqetîne

ew e ku daçek: wateyeke nuh dide peyvê angî hevokê, gihanek jî gihandinê (girêdanê) çêdike. Bê guman dibe ku di hevokê de roleke daçekan ya girêdane jî bê hîskirin lê ew rol her tim rola duyemîn e, rola bingeîn ku xuya dike ya daçeka watedayînê ye” (Ciwan, 1992: 161).

Gihanekên ku bi daçekan çê dibin ev in: “ji lew re, ji bo, ji ber, bi ser de”.

- i. **Ji lew re**; Ev gihanek wek “lewre, lewra, ji lew, lew û ji lew ra” jî tê dîtîn. Her wekî ku tê xuyakirin ji daçekan pêk hatîye. Ev gihanek “sedema bûyer”ê dîyar dike.

(66) (a) Selîm kêfxweş bû, **lewra** karê birayê wî baş diçû (Çifçi, 2016: 94).

(b) Me ew nebirin: **ji lew ra** erebe ne bi me ra bû. (Baran, 2018: 107).

(c) ...**lew re** newêrin zû bû zû biaxivin... (Silêvanî, 2011: 20).

(d) **Ji lew**, ji bo ewlehîyê leşkerên ku rojê carekê dihatin serdana me...(Dilken, 2016: 20).

(e) Em nehatin dibistanê **ji lew ra** berf dibarî (Taman, 2018: 58).

- ii. **Ji bo**; Ev gihanek di formên wek “ji bo ku” , “ji bona” û “bo”yê de jî tê bikaranîn. Hevokan ji hêla armanc û sedema bûyerê ve bi hev ve girê dide. Carinan di navbera navdêr an cihnavan de jî girêdanê çêdike.

(67) (a) ... **ji bo** wan jî barîna baranê bûbû derfeta bêhnvedanê...(Dilken, 2016: 21).

(b) Ê benê duduyan **ji bona** te ye (Metê, 2014: 27).

(c) Min **ji bo** Mîthras, Hermes, **ji bo** wan her yekî keşeyek wezîfedar kirîye... **ji bo** kesên ku beşdarî şahîyan dibin...

(Dilken, 2016: 71).

(d) Meryemxan, spas **bo** derfetê û însîyatîvê (Silêvanî, 2011:77).

iii. **Ji ber;** Ev gihanek di forma “ji ber ku” yê de jî tê bikaranîn. Hevokan ji hêla sedemê ve bi hev ve girê dide.

(68) (a) ...ez navê wî hilnadam **ji ber ku** wê kenan ez bim... (Fîlîk, 2015: 59).

(b) **Ji ber ku** min jî ji we re gotibû, eger tu bibêjî li serê Çîyayê Yezdanan çi heye... (Dilken, 2006: 85).

(c) **Ji ber** vê yekê, min xwest li ser kanîyê hinekî xwe qamişê xwe yê nivîsê ...(Dilken, 2016: 12).

(d) **Ji ber ku** ez di girtina defteran de alîkarîya wî dikim ew jî qedrê min digire (Oncu, 2017: 131).

iv. **Bi ser de;** Her wekî ku xuya dike ev gihanek di heman demê de daçekeke hevdudanî ye. Ev gihanek “asta bilindbûn û zêdebûna kirin û tevgerê nîşan dide û hevokan bi hev ve girê dide” (Baran, 2018: 110).

(69) (a) **Bi ser de** jî ev zigurtên nazî li cadeyan me rehet bernadin (Yûsiv, 2015: 113).

(b) Vê tîkçûnê mala Zak xera kiribû û **bi ser de** hedimandibû (Jiyan: 20018: 218).

(c) Keçîka biçûk a ku çavên wê jê hatibû girtin, dest bi girî kir, hema **bi ser de** derguşê berşîr jî...(Çakar, 2019: 182).

(d) Nanê me xwer **bi ser de** ava me jî vexwar.

v. **Digel:** ew gihanek bi daçeka “di” yê çêbûye. Di navbera hevokan de tîkilîyeke dijberî hev çê dike.

(70) (a) ...wî divê ji bîr bike, **digel** ku ew heyamên dijwar...dikarin bibin ciyê şanaziyê (Silêvanî, 2011: 71).

(b) **Digel** ku hîn negihabû mala xwe, mamoste peya bû (Çifçi, 2016: 37).

(c) **Digel** ku ne li ser rêya wî bû jî dîsa rêya xwe bi Tûya Ketin xist (Çifçi, 2016: 40).

(e) Her kes di xew da ma, **digel** vê yekê em dîsa çûn (Taman, 2018: 58).

2.3.6. Daçek di Çêkirina Hokeran de

Cureyekî peyvan ku di avakirina wan de daçek xwedî rol in jî hoker in. “Hoker, ji alîyê rewş, dem, mêjer û cihê ve bandorê li lêker, lêkernav, rengdêr û hokeran dikin” (Baran, 2018: 99). Her çend ku hoker bandorê ji gelek cureyên peyvan dikin jî herî zêde bandorê li lêkeran dikin. Taman (2018) ji bo hokeran wiha dibêje “Xusûsî wextê hêmanên hevokan ji hev tên veqetandin, pirsên wekî “çiqas”, “çawa”, “kengî” û hêmanên ku cih û alîyan nîşan didin dibin hoker” (Taman, 2015: 56).

(71) (a) Wan xwe avêtin ber zinarekî, nan **li wir** xwarin (Karabax, 2013: 277).

(b) ...sibeyekê bi banga melê re, **ji nişka ve** hatibûn darvekirin (Oncu, 2017: 188).

(c) **Ji mêj ve** me xwe li ser rûyê axa bav û kalan mîna parsek û bîyanîyan didît (Husên, 2015: 15).

(d) **Bi demê re** me hevdu nas kiribû (Yûsiv, 2015: 113).

(e) **Ji berê de** min ji tabûtan hez nedikir (Tilermenî, 2009: 167).

BEŞA SÊYEM

Di DEVOKA SEMSÛRÊ De DAÇEK û MÎNAKÊN WAN

Di vê beşê de bi kurtî qala Semsûrê û devoka Semsûrê hatîye kirin. Piştîre bi mînakên ku ji çîrokên gelerî û axaftinên rojane hatine girtin daçek bi taybetîyên bikaranîna daçekan ya di devoka Semsûrê de hatîye vegotin. Piştîre jî mînakên daçekan ên peyvçêkerîyê li gor cureyên peyvvan bi mînakan hatine dîyarkirin.

3. Semsûr û Devoka Semsûrê

Di vê binbeşê de bi kurtî qala Semsûrê hatîye kirin û taybetîyên devoka Semsûrê hatine vegotin.

3.1. Derbarê Semsûrê de Agahîyên Giştî

Semsûr dikeve başûrrojhilatê Tirkîyeyê. Semsûr di navbera bajarên Amed, Riha, Meletî, Dîlok (Entab) û Girgim (Mereş)ê de ye. Bajarê Semsûrê bajarekî gelekî kevn e. Semsûr, bajarekî qedîm û rengîn yê Kurdistanê ye. Li gor Yağınli “ Semsûr ji cih û warên dîrokê yê herî kevin ku tê zanîn e” (Yağınli, 2013: 1).

Tê zanîn ku Semsûr xwedî dîrokek pir kevn e. Di vê mijarê de Doğanwiha dibêje: “Dîroka bajarê Semsûrê digihêje heya 40 hezar sal berî zayînê”. (Doğan, 2012: 228). Di dîroka Semsûrê de dewletên mîna Hîtît, Asûr, Frîg, Pers, Med, Mîtanî, Hûrî, Hemdanî, Kommagene, Roma, Bîzans, Emewî, Abbasî, Eyyubî, Selçûkî, Selçûkîyên Anatolyayê , Memlûkî, Osmanî û hwd serdest bûne (Akar, 2000: 6). Çawa ku ew qas şaristanî û dewletên rengîn li ser vê axê jîyane, ew qas dîn û bawerîyên cuda jî li ser vê erdnigarîyê bi hev re jîyane. Semsûr di robara dîrokê de bûyê xwedî navên rengîn. Navê bajêr yê berî dînê îslamê Perre (Pîrîn) ye. Di dema Romayîyan de bi navê Klozya jî hatîye bilêvkirin (Akar, 2000: 7). Dema ku îslamîyet hatîye vê cografyayê bi

navê Hisn-î Mansûr'ê tê nasîn. Demekê ji Semsûrê re Wadî-î Leman jî hatîye gotin. Di dema Komara Tirkîyeyê jî navê bajêr bûye Adıyaman. Di dema Osmanîyan de bi ser senceqa Mereşê ve bûye. Di 1ê Mijdarê ya 1954an jî ji bajarê Meletîyê veqetîye û bûye bajar. Navçeyên bajêr: Kolik (Kahta), Bêhisnî (Besni), Serêgolê (Gölbaşı), Semsat (Samsat), Aldûş (Gerger), Sincik (Sîncîk), Tût (Tut) û Cêlika (Çelikhan) ye.

Gelheya Semsûrê bi piranî kurmancîaxêv in. Li navçeyên Serêgolê, Tûtê û çend gundên girêdayî navendê hinek tirkmen bi cih bûne. Ji bilî van hinek gundên Bêsnîyê û Kolikê ji eşîra Şêxbizênên Soran û parek mezin ya Aldûşê jî zaza ne. Ji bilî van yên din bi tevahî kurmanc in. Li navçeyên Sincik, Cêlika, Semsat û Kolikê kurmancî bi rêjeyeke pir bilind tê axivîn. Lê belê li navendê û navçeyên din rewş ne wekî wan deran e.

Li Semsûrê gelek eşîr jî bi cih bûne. Eşîrên wekî Kaw, Xidirsor, Balyan, Reşî, Şêxbizinan, Mirdêsan ji van eşîran ên mezin û berbelav in. Ji bilî van çend gundên herêma Gelera ku li ser navçeya Sincikê ye jî ji eşîra Berazan in.

3.2. Devoka Semsûrê

Nêzikî nîv sedsalê ye ku zanista sosyolînguîstîkê têgeheke bi navê dîalekt (zarava) vedikole. Sosyolînguîstîk ew zaniste ku têkilîyên di navbera ziman, civak û çandê vedikole. Bi kurtî zarava cihêwazîyên zimanekî yên awayê vegotinê ne. “Zarava dikare di bin du komên sereke de bê komkirin, zaravayên civakî û yên herêmî” (Methrie, 2000: 45). Lêkolînerên ku li ser zaravayan dixebitin sînorekî dixin navbera zarava û zimên. “Berevajî ku gelek kes bawerîya xwe pê tîne, sînorekî teqez di navbera zimên û zaravayê de nîne” (Tait, 1994: 5). Lê belê xuya ye ku ew sînor ne sînorekî teqez e. Gelek caran dikare bê nîqaşkirin. Li gor Hassani & Medjedovic (2016) parametreyên ku zimên û zarava ji hev cuda dikin ango sînorê navbera wan dîyar dikin ev in: hevşibîyên di bêjeyan de, têgihiştina hevpar, rêziman û bikaranîn.

Gelek ziman xwedî zarava ne, zimanê kurdî jî ji wan zimanan yekî pir zaravayî ye. Lêkolînerên ku li ser zimanê kurdî xebitîne bîyanî yan kurd li ser zaravayên kurdî li hev nekirine. Ji bo zaravayên kurdî hejmar û nêrînên cihêwaz anîne zimên. Dema ku em bi awayekî kronolojîk li meseleyê binêrin em ê bibînin kesê ku herî zû qala vê mijarê kirîye Şerefxan e. Şerefxanê Bedlîsî (2012) di Şerefnameyê de çar zaravayên

kurdî rêz dike: Kirmanc (kurmanc), lor, kelhur û goran³. Pey Şerefxan gelek kesan li ser zaravayên kurdî nêrînên xwe anîne zimên. Ji van lêkolîneran hinekên bîyanî goranî û zazakî weke beşek ji zimanên îranî hesibandine. Lê belê li gor Haig û Opengin (2014) zaravayên zimanê kurdî ev in: kurdîya bakur (kurmancî), kurdîya navendî (soranî), kurdîya başur (lorî-lûrî), goranî û zazakî. Dîsa ji bo zaravayên kurdî Adak (2016) wiha dibêje: “Baskê kurmancî di nav xwe de dibe du beş: kurmancîya jorîn û kurmancîya jêrîn: lê belê îro ji kurmancî bi tenê kurmancîya jorîn tê famkirin, ji kurmancîya jêrîn re soranî tê gotin. Baskê duyemîn ê kurdî goranî ye. Ev bask jî îro digel zazakî, wekî goranî-zazakî tê binavkirin. Baskê sêyemîn ê kurdî jî lûrî ye” (Adak, 2016: 17).

Di nav van zaravayan de yê herî berbelav zaravayê kurmancî ye. “Piranîya kurmancîaxêvan ji welatên cuda yên wekî Tirkîye, Sûrîye, Iraq, Îran, Ermenîstan û Lûbnanê bi cih bûne (Hassani & Medjedovic, 2016: 64)”. Ji bilî van deran li dîyasporayê jî civakeke mezin ya kurmancîaxêvan çêbûye.

Zaravayê kurmancî ango kurmancîya bakur di destpêka sedsala borî de gelekî pêşketîbû. “Yekemîn rojnameya kurdî û bi zaravayê kurmancî û rêzimana kurmancî berî zaravayên din bi zaravayê kurmancî hatibû nivîsîn” (Khalid, 2015: 29). Piştî ku di destpêka sedsala borî de Komara Tirkîyeyê tê damezrandin heta dawîya sedsala borî kurmancî ji hêla xebatên edebî, çandî û zanistî ve li Tirkîyeyê di cihê xwe de disekine. Heta destpêka sedsala 21em Komara Tirkîyeyê kurdî qedexa dike û nahêle karên edebî û çandî bi kurdî bên kirin. Ew rewş di roja îroyîn de bi vekirina beşên Kurdolojîyê û bi rabûna qedexeyên li ser zimên dibe dîkeya guherîn, pêşketin, xebat û lêkolînên bi kurdî.

Zaravayên kurdî, zaravayên pir-devokî ne. Kurmancî jî ji wan zaravayên kurdî zaravayekî pir-devokî ye. Ji ber erdnigarîya Kurdistanê ya rengîn, hejmara eşîran û pîrbûna bawerîyan bûye sedema zêdebûna devokan. Devok (Sub-dialect) guherînên dengî yên ku di zaravayan de tên dîtin re tê gotin. Xebatên akademîk ku li ser devokên kurmancî hatine kirin pir kêmtir in. Adak devokên kurmancî wiha rêz dike: “Bâyezîdî, Hekkârî, Botî, Aştî, Bâdînî, Mereşî-Meletî, Firatî-Berferatî, Mêrdînî, Efrînî, devoka Anatolyaya Navîn û Xorosanî” (Adak, 2016: 17 & Adak, 2014: 115).

³Şerefxanê Bedlîsî dema ku vê dabeşkirinê dike cudahîyên eşîrî û edetên wan li berçavan digire. Ji bo Agahîyên berfireh bnr. h.b r.100-103.

Li Semsûrê bêtir devoka Berferatî tê axivîn. Lê belê navçeya Serêgolê û qismekî jî navçeya Bêsnîyê devoka Mereşî tê axaftin. Devoka Berferatî li bajarên derdora Semsûrê yê wek Riha, Amedê jî tê axaftin. Ev devok hin taybetîyên dengî û rêzimanî di xwe de dihevin. Herwekî ku hat gotin Semsûr jî vê devokê bikar tîne. Taybetîyên devoka Semsûrê ev in:

- Cihnavê kesê yekem “min” gelek caran wekî “mi” tê bikaranîn. Ev rewş jî bo cihnavê “ez” jî wisa ye. Gelek caran wek “e” tê bikaranîn.

(72) (a) Kundirkî **mi** ra tiji av ke, kundirkî jî **mi** ra tiji danî ke (Ç.1).

(b) Sewtê xwa were **mi** ez ê te bixwim (Taştan, 2013: 12).

(c) **Mi**, digo mere !

(d) E hatim, **mi** zêr anîn, **mi** pere anîn (Ç.1).

- Di devoka Semsûrê de gelek caran “n” ya gireya pirjimarêyê nayê gotin.
- Cinavka vegerok “xwe” bi forma “xwa” yê tê bikaranîn. Lê belê kirpandin li ser tîpa “x” yê ye.

(73) (a) Sewê **xwa** hespik kirîye.

(b) Pez birîye mala **xwa**.

- Her ku meriv ji rojhilatê Semsûrê ber bi rojavayê Semsûrê ango Mereşê diçî dengê “a” nêzî dengê “o” derdikeve. Bêjeyên wek *ar, av, ap...* hwd. wek *op, ov, or...* hwd. tên gotin.
- Navçeyên wek Aldûş û Sincikê di hin bêjeyan de dengê “û” nezi “ü” ya Tirkî tê bilêvkirin. Peyvên wek *bûk, hûr, tû...* hwd. bi vî rengî; *bük, hür, tü...* hwd. tên bilêvkirin.

- Hejmar ji dehan heta nozdehan wiha tê gotin: deh û yek (11), deh û dudu (12), deh û sisê (13), deh û çar (14), deh û penc (15)⁴, deh û şeş (16), deh û heft (17), deh û heşt (18) û deh û neh (19).

- Di hin bêjeyan de “h” ya destpêka bêjeyê hîn likar e. Bêjeyên wek *huro*, *herê*, *hîşev*, *henî*, *helbik*, *hêşin*, *histûn*, *hanîn*, *histû*..hwd. bêjeyên bi vî rengî ne.

- Gireya îzafeyê ya nêr “ê” hin caran dibe “î”. Bo mînak: *bavî min*, *apî min*, *erdî me*...hwd.

(74) (a) **Bavî** mi, mi ra topik kirî.

(b) **Mi** apî xwa ra got.

(c) **Erdî** me şûnê deh tilman⁵ e.

- Di hin deverên elewî de ku li bakurê Semsûrê dijîn dema ku peyvên wek “Hesen, Hisên, Ehmed...hwd” bi lêv dikin bandora eyn (ع) û ha (ح) ya erebî pir kêr tê dîtîn. Bi “h” û “e” yeke nerm bi lêv dikin.

- Di şûna cinavkê îşarkî “ev” de, “va” tê bikaranîn(Tan, 1996 : 42). Ev rewş wiha derdikeve pêşberî me: *va lawikî*, *va merî*...hwd.

(75) (a) **Va** merî han me xist.

(b) **Va** lawikî topa me teqand.

(c) **Va** pitê mey merxur e, diwê dergûşa xwa dixwe (Ç.1).

- Di devoka Semsûrê de gelek caran dengê “b” û “w” bi hev diguherin. Ev taybetîyeke bingehîn a devoka Semsûrê ye (Akdag, 2017). Ev guherîn bêtir di dawîya peyvê de çêdibe, di destpêka peyvê de çênabe. Bo mînak: *siwe*, *diwê*, *diwîne*, *rawirîn*, *zeweş*, *tewat*, *heqîw*, *riw*...hwd.

⁴Ev hejmar carinan di hin qaliban de weke panzdeh tê gotin “de panze meri hatin mala me”. Lê belê dema ku hejmar tên jimartin hertim awayê deh û pencê tê bikaranîn.

⁵ Tilm: Ji bo pîvana erd û zevîyan tê bikaranîn. Tilmek, du donim e.

- Di devoka Semsûrê de di bazindaçekan de meyla pêşdaçekan li ser ketinê ye, û paşdaçek (de, re, va) jî dibin “da”, “ra” û “va”.
- Taybetîyeke din devoka Semsûrê ew e ku peyvên nêr heke ku di wan de tîpên “a” û “e”yê hebin tu caran gireyên dîyarîyê nagirin. Ev peyvên bi vî awayî di hindur de ditewin.

(76) (a) Mi ban⁶ Êgît (Egîtî) kir.

(b) Ez nên (nanî) dixwum.

(c) Em ê huro⁷ dîwêr (dîwarî) lêkin.

(d) Çûye wira, jinikek ber êr (agirî/arî) e, arî dadaye, danhûrik daye ser (Taştan, 2013: 9).

3.3. Mînakên Daçekan di Devoka Semsûrê de

Di vê binbeşê de li gorî dabeşkirina beşa duyem daçek hatine dabeşkirin û mînakên devoka Semsûrê hatine dayîn.

3.3.1. Daçekên Xwerû

Bikaranîna daçekên xwerû “bi, di, ji û li” yê tevî fonksîyon û guherînên ji hêla dengî û wateyî ve digel mînakan wiha ye:

a) Daçeka Xwerû “bi”;

Bikaranîna daçeka “bi” yê , û fonksîyonên wê ev in:

i. Di bikaranîna wateya alav û amûran de;

(77) (a) Zeweş **bi** (**pê**) kêrê hûr kir.

(b) **Pê** erebê çûn bajêr (Ç. 6).

(c) Mih **pê** ewrîyê meqisandin (Ç.4).

(d) Kaçik⁸ **bi** girî tara⁹ mal û digirîm, digirîm (Ç.9).

⁶Ban kirin: gazî kirin.

⁷Huro: îro.

⁸Kaçik: keçik.

⁹ Tara: diçe.

(e) Ey¹⁰ te ra siwê karikê **bi** xwaliyê çêkim hara (Ç.9).

Her wekî ku di mînakên (77a-e) jor de xuya dike daçeka xwerû “bi” di fonksîyona “bikaranîna alav û amûran” de bi awayekê çalak tê bikaranîn. Lê belê li Semsûrê ew daçek hin caran weke “**pê**” jî tê bikaranîn. Yanî weke ku li pêy daçeka “bi” yê “wî/wê” yeke veşartî hebe û hatibin cem hev û “pê” pêkanîbin.

ii. Daçeka “ bi ” yê di bikarîna wateya li gorî yê de;

(78) (a) **Bi** te huro berfê bibare ?

(b) **Bi** mi ev rê neçê ye (Ç. 4).

(c) **Bi** we sexilê¹¹ me ku da çûye.

(d) **Bi** we em kanin vî erdî rakin (Ç. 2)

Di vê bikaranînê de daçeka “bi” yê hatîye ber cihnavên tewandî. Bi vê bikaranînê herwekî ku ji mînakên (78a-d) jî xuya dibe wateya “li gorî” yê daye hevokê.

iii. Daçeka “ bi ” yê di sond xwarinan de:

(79) (a) **Bi** Quranê we mi tu tişt nedî (Ç. 4).

(b) Mi **bi** serî kurik kulfetî xwa sond xwar (Ç. 10)

(c) **Bi** Îmam Hisên mi perê te nedîne (Ç. 11).

(d) Yakê¹² gotiye sarê birê mi we mi nekiriye (Ç.9)

Daçeka “bi” yê di devoka Semsûrê de di sondan de tê bikaranîn. Herwekî ku di mînakên (79a-c) de jî tê dîtin. Carinan dibe ku ev daçek bikeve. Em vê rewşê di mînakê (79 d) de dibînin. Lê belê ketina daçeka xwerû ne rewşeke berbelav e.

iv. Bikaranîna neyînîya daçeka “bi” yê “bê” :

(80) (a) Welehîn ê me **bê**av bihile (Ç.1).

¹⁰Ey: ez.

¹¹ Sexil: Bo kerî an cola kar û berxan tê gotin.

¹² Yakê: yekê.

(b) Nav gund da ew tenê **bê**xwadî ne (Ç.3)

(c) **Bê** êmcîya¹³ em tenê nikanin vî tûtînî rakin.

(d) E li van dera **bê** pere digirim (Ç. 11).

Her wekî ku di mînanan(80a-d) de jî tê dîtîn. Wateyeke neyînî dide hevokê û dikare berî cinavkên tewandî û navdêran jî **bê** bikaranîn.

v. Daçeka “bi” yê di wateya dabeşkirinê û kombûnê de:

(81) (a) Ro ro tere hecîkê (Taştan, 2013: 14).

(b) Nirî ki ek **bi** ek, ek **bi** ek derketin (Ç.1).

(c) Dav tara¹⁴ qapiyê êxir vadike û tak tak mihiyan dipalikîne (Ç. 9).

(d) Em ê no **bi** no¹⁵ bidin ser piştî xwa benî¹⁶ (Ç.1).

Daçeka “bi” yê di Devoka Semsûrê de di navbera hejmaran de tê bikaranîn. Lê belê di mînanan (81a-c) de tê dîtîn ku carinan daçeka “bi” yê ketîye û nehatîye gotin. Berevajî vê yêkê di hin mînanan (78 b-d) de jî daçeka “bi” yê di cihê xwe de ye.

vi. Daçeka “bi” yê di navbera cotepeyvan de;

(82) (a) Farizî Çerçî gund **bi** gund digere.

(b) Mal **bi** mal mistik xwe digerîya (Ç. 6).

(c) Gi xwa tek tek davênê (Ç. 5).

(d) Sewa ki çend kîlo tûtîn bifroşin mal **bi** mal digerin.

(e) Gund **bi** gund digere (Ç. 9).

Her wekî ku di mînanan (82a-e) de tê dîtîn daçeka “bi” yê dikeve navbera cotepeyvan wateya “dabeşbûn” û “kombûnê” dide hevokan. Lê belê “bi” di hin

¹³Êmcî: Kesên ji bo kirina karekî bi pereyan tên girtin.

¹⁴Tara: diçe.

¹⁵No bi no: dor bi dor.

¹⁶Benî: (em ê) bibin.

mînakan (82c) de ketîye. Ango daçeka “bi” yê her tim di navbera cotepeyvan de nayê bikaranîn carinan tê dîtîn ku daçeka “bi” yê dikeve.

vii. Bikaranîna bazindaçeka “bi.....de” yê;

(83) (a) Bar kirin ûw **bi** welatkî **da** çû (Ç.1).

(b) Dav¹⁷ diwê ê ti yê ku **da** hara (Ç. 9)

(c) ... ku warin mala wa, kincên havalê min çayê **da** çwîn (Ç.9).

(d) Hurdi¹⁸ mêrika şûn **da** baz dan, hatin (Ç.1).

Her wekî ku di mînakan(83a-d) de jî tê dîtîn. Ev bazindaçek “bi...de” wateyên wek “li ser” û “navber” ê dide hevokan. Lê belê di mînakan de jî tê dîtîn ku pêşdaçek (bi) dikeve û di paşdaçekê de guherîneke dengî çêdibe û paşdaçek (de) dibe “da”.

viii. Bikaranîna bazindaçeka “bi.....re” yê;

(84) (a) Bavî¹⁹ mi ez xwa **ra** newirim dawetê (Ç.6).

(b) Wê şevê qurban **pê ra** şerjê kirîye (Ç.7).

(c) Ti here di telîsa mi **ra** ûne (Ç.1).

(d) ...were am ta **bi** kaçika paşê **ra** bizewicîn (Ç. 9)

Bazindaçeka “bi...re” yê wateyên wek “hevrebûn”, “bi rêya tişteki” û “navber”ê dide hevokan. Ev yek di mînakan(84a-d) de jî xuya dibe. Her wekî ku ji mînakan jî xuya dike pêşdaçek (bi) gelek caran dikeve û di paşdaçekê de guherîneke dengî çêdibe paşdaçek (re) dibe “ra”. Hin caran jî wekî ku pêşdaçeka xwerû (bi) ku dikeve forma “pê” yê, di bazindaçekê de jî heman rewş tê dîtîn.

ix. Bikaranîna bazindaçeka “bi.....ve” yê;

(85) (a)... az²⁰ ê biwê²¹ walle em rê **va** dihatin ku warin mala wa ... (Ç. 9).

¹⁷ Dav: Dêw

¹⁸ Hur di: her du.

¹⁹ Di devoka Semsûrê de îzafeyê navdêrên nêr hin caran bi “ê” yê çênabe. Dewsa “e”yê “î” tê bikaranîn. Bo mînak ji dewsa “bavê min”, “bavî min” ji dewsa “apê min” “apî min” tê gotin.

²⁰ Az: ez

(b) Xwa pê bigre, xwa **va** girêde (Ç.1).

(c) Pîr jî pêşa²² wî, **bi** xwa **va** girê dide ku mereve (Ç. 9).

(d) Wî, dirî **bi** boça xwe **va** kir, zeliqand, dor ra çû hat, toz dûman rawû (Taştan, 2013: 8).

(e) Paşa **bi** vêzîr **va** li seferê vedigerine (Ç. 6).

Bazindaçeka “bi...ve” yê wateyên wek “hevrebûn”, “aîdîyet” û “pêvebûn”ê dide hevokan. Ev yek di mînakên de jî xûya dibe. Di mînakên jor de pêşdaçek (bi) gelek caran dikeve û di paşdaçekê (ve) de jî guherîneke dengî çêdibe û paşdaçek (ve) dibe “va”.

b) Daçeka Xwerû “Di”;

Bikaranîna daçeka “di” yê , û fonksîyonên wê ev in;

- i. Bi qasî ku me bala xwe dayê di axaftinên rojane û çîrokên li ber destên me ku em li ser dixebitin daçeka xwerû “di” di peywîra wesfandin û lêkdanê de nayê bikaranîn. Ango em mînakeke ku bi vê peywîrê hatî bikaranîn rast nehatin.
- ii. Bikaranîna daçeka xwerû “di”;

(86) (a) Melem **di** kula kevota birîndar da.

(b) E²³ xwa difikrim.

(c) Mi bişewitîne, xalîyê²⁴ mi **di** avê ke... (Ç.1).

(d) Destê xway bi teni **di** çavê xelkê dide (Ç. 11).

(e) Siweda zû **di** bajêr kevin (Ç.1).

Di mînakên (86a- d) de jî xuya dibe ku ev daçek di mînakên li jor jî wateyên wek “dinavdebûn” û “liserbûn”ê dide hevokan. Lê belê hin caran daçek nayê bikaranîn. Di mînaka (86b) jor de xuyaye ku li pêşîya peyva “xwe” yê daçeka “di”

²¹Biwê: bibêjim

²²Pêş: daw.

²³ Ez: e.

²⁴ Xalî: li Semsûrê dewsa “arî”yê tê bikaranîn.

heye lê nehatîye bikaranîn. Berevajî mînaka (86b) duyem di mînaka (86a) yekem de daçek di şûna xwe de ye.

iii. Bikaranîna bazindaçekê xwerû “di...de” yê;

(87) (a) Goştê Hesnûnê **di** wir **da** ma (Ç.1).

(b) Gundî me **da** du sed mal hene²⁵.

(c) Pisik tara kizût **da** dimize û cînciqikî²⁶ dike nav xwaliyê (Ç.9).

(d) Herik²⁷ şe kir derzîyek qêf **da** kir xwar (Ç.1).

(e) Em derbkê **da** lêxinî bira arî me gîya bigire (Ç.2).

(ê) Qeraş diwê, az barê **de** hazir im (Ç. 9).

(f) Hesnûn **di** çîwêl **da** ban kir (Ç.1).

Her wekî ku ji mînan (87b-ê) xuya dibe gelek caran pêşdaçek dikeve û paşdaçek (de) jî dibe “da”. Lê belê kêman caran be jî di hin mînan (87a- 87g) de tê dîtîn ku pêşdaçek di cihê xwe de ye de. Vê bazindaçekê di mînan (87a-d) de wateya “têdebûnê” daye. Di mînaka (87) dawîyê de jî di wateya “demê” de hatîye bikaranîn.

iv. Bikaranîna bazindaçekê xwerû “di...re” yê;

(88) (a) Rê nav malan **ra** dihere (Ç. 8).

(b) ...digre û **di** her di çavan **ra** dike (Ç.9).

(c) Borî Malê Hêrîyê²⁸ **ra** derbas bûn.

(d) Diwê ki tîn dor minarê **ra** çex diwin lawik banê (Ç.1).

(e) Tara²⁹ dast **di** histiyê xwîşkê **ra** werdide... (Ç. 9).

²⁵Hin deverên Semsûrê daçek pir kêman tîn bikaranîn. Bo mînak li hêla Bêsnîyê ev hevok wiha tê gotin “Gundî me pencî mal hene”. Lê mînkûn e ku di vê hevokê de sedema nebûna paş daçekê ji ber bikaranîna daçekê “li” yê be. Lê ew daçek “li” jî bi demê re ketîye. Wê dema ev hevok wiha ye “ Li gundî me pencî mal hene”. Dîsa heman hevok li gundên nêzî Hewagê wiha tê gotin: “ Di gundî me da pencî mal heye”.

²⁶ Cînciq: Xar, gogên hûr yên bi gelemperî şûşeyî.

²⁷ Herik: Her ku.

²⁸ Borî Malê Hêrîyê: Ev derbasok li ser çemê Xalbêrcîyê ye. Ev çem di navbera gundê Omeran û Malê Hêrîyê re derbas dibe. Her du gund jî li ser şaredariya Kûmîrê ne û gundên eşîra Kavî ne.

Her wekî ku di hevokan de xuya dibe di devoka Semsûrê de bazindaçekê “di...re”yê di wateya “jîderbasbûna cihekî an tiştêkî” de tê bikaranîn. Lê belê pir caran pêşdaçek (de) dikeve û di paşdaçekê (re) de guherîneke dengî çêdibe û paşdaçek (re) dibe “ra”.

c) Daçeka Xwerû “Ji” ;

Di devoka Semsûrê de bikaranînen daçeka “ji” yê wiha ne;

- i.** Daçeka “ji” yê bi tenê tê bikaranîn û wateyên wek “jêçêbûn”, “jêderketin” û “berpêbûn”ê dide hevokê.

(89) (a) **Li** rîvi dang nayê (Ç. 9).

(b) Vay **li** me hustûrtir e (Ç.1).

(c) Paşa **li** hêlê radiwe (Ç. 6).

(d) He³⁰ oxil here **li** pitê mêzike ki digrî bileqîne (Ç.1).

Ji mînakan (89a-d) xuya dibe ku ji dewsa vê daçekê di devoka Semsûrê de daçeka “li” yê tê bikaranîn. Ev daçek (li) heman wateyên ku daçeka “ji” yê dide hevokê di xwe de dihevwîne û di van mînakan de wateyên “jêçêbûn”, “jêderketin” û “berpêbûn”ê dide hevokan.

- ii.** Bikaranîna bazindaçekê xwerû “ji...re” yê ;

(90) (a) Rîvi qerêş **ra** diwê, wî îşî ti mi **ra** bêlê (Ç. 9).

(b) Lêwik hu kiriye ku paşê ê ûne **li** wi **ra** rakiriye...(Taştan, 2013: 9).

(c) Diwê bîn berdide ûw pîrê **ra** dîwê ...(Ç.1).

(d) Rokê dê³¹ kinca dişo, lawikê xwa **ra** diwê...(Ç.1).

(e) Şivên **ra** diwê wara am qewalan veşêrin, ku kê dî bira tarkê xwa bide ê din (Ç.9).

²⁹ Tarra: diçe.

³⁰ He: hele

³¹Dê: forma peyva “dayik”ê ya tewîyayî ye.

(f) Pir narin rîvi tarra qerêş **ra** diwê (Ç. 9).

(g) ... rê va tiştî rindik dihwîne karê **ra** diwê çaaayîîş! (Ç. 9).

Di devoka Semsûrê de ev daçek wateyên wek “berpêbûn, armanc, karê ku tê kirin û arastekirina gotinê ji bo yekî” dide hevokan . Lê belê gelek caran pêşdaçek nayê gotin. Dema ku tê gotin jî wekî ku di mînakên (90b) de xuya dibe, ji dewsa “ji” yê daçeka “li” yê tê bikaranîn.

iii. Bikaranîna bazindaçeka xwerû “ji...de” yê;

(91) (a) Jor **da** ber dide, jor **da** ber dide li kokî minarê dêxe (Ç.1).

(b) Gur jor **da** hatin, pezê ma xwarin (Ç. 10).

(c) Wê rê **da** qirarê saatekê bimeşe tê bigihêjî gund.

(d) Markî reş xwa sîvnegê **da** berda jêr (Ç.2).

Ev daçek di devoka Semsûrê de jî wateya “destpêkirina cih û hêla tevgerê” dide hevokan. Lê belê di devoka Semsûrê de pêşdaçek (ji) ketîye û di paşdaçekê de guherîneke dengî çêbûye, paşdaçek (de) bûyê “da”.

iv. Bikaranîna bazindaçeka xwerû “ji...ve” yê;

(92) (a) De ki rê **va** hatin ...(Ç.1).

(b) Pêr **va** hatîye mala me û hîn neçûye (Ç.1).

(c) Sala çûnî **va** li benda te me.

(d) Kela bajêr dîr **va** tê xayînê (Ç.1).

Ev daçek her wekî ku di mînakên de jî tê dîtin wateya “demê” û wateya “cih û hêla ku bûyer dest pê dike û dewam dike” dide hevokan. Lê belê li Semsûrê pêşdaçek (ji) ketîye û di paşdaçekê de guherîneke dengî çêbûye, paşdaçek (ve) bûyê “va”.

d) Daçeka Xwerû “Li” ;

Bikaranîna daçeka xwerû “li” yê wiha ye;

(93) (a) Roza **li** mal xew da ye.

(b) Dihwîne ku şivanikî **li** wir e (Ç. 9).

(c) Paşê **li** haspê siyar diwe û bi rêvi va dikevin rê (Ç. 9).

(d) Jor da ber dide, jor da ber dide **li** kokî minarê dêxe (Ç.1).

(e) Dikeve şikeftikê ku davikî **li** wir e (Ç. 9).

(ê) Ha birango ti **li** wir çir dikî? (Ç.1).

Her wekî ku di mînanan(93a-ê) xuya dike di devoka Semsûrê de daçek a “li” yê bi awayekî çalak tê bikaranîn. Di van mînanan (90a-ê) de daçek a “li”yê wateyên wek “têdebûn” û “berpêbûnê” dide hevokan.

3.3.2. Daçekên Navî

Bikaranîna daçekên navî digel mînanan wiha ye:

i. **Ba**; bikaranîna daçek a navî “ba” yê;

(94) (a) ...ê go oxil ti di wir da mayî,..., çî **ba** te heye (Ç.1).

(b) ...ku rêvi tere ba hevalê xwe ku î qol e, boçik pê va tunê...(Taştan, 2013: 15).

(c) E dikim hem³² **ba** keçikî xwe... (Taştan, 2013: 15).

(d) Xwe ra çûne **ba** hevala (Taştan, 2013: 13).

(e) Ez qurban ez ê çitol³³ wem³⁴ **ba** te? (Ç.1).

Her wekî ku di mînanan(94a-d) de jî xuya dike daçek a “ba” yê di devoka Semsûrê de wateya “licembûnê” dide hevokan.

ii. **Bal**; Ev daçek wateya daçek a “ba” yê dide hevokan. Em di çarçoveya materyalên di vê xebatê de ji bikaranîna daçek a “bal”ê rast nehatin.

iii. **Bin**; Bikaranîna daçek a navî “bin” ê wiha ye;

(95) (a) Bere here xêni, **bin** leganê de (Taştan, 2013: 15).

³²Hem: Forma “herim”ê ya kurt e.

³³Çitol: çawa.

³⁴Wem: werim.

(b) Kurik gi³⁵ ketin **bin** ûw kurik raketin (Ç.1).

(c) ...mîz dike dide **bin** leganê (Taştan, 2013: 16).

(d) Şîr bere bide **bin** lewanê³⁶ ûw dûyê te jî rojinê da dar da ye bere (Ç. 5).

(e) Wexta ku nên dixwin, qeraş gûşt dixwe û hestîyan jî dikute bin balîvê (Ç. 9).

Her wekî ku ji mînakan (95a-f) jî xuya dibe daçek a “bin” ê di devoka Semsûrê de wateyên wek “binbûnê” û “jêrbûnê” dide hevokan.

iv. Cem; Bikaranîna daçek a navî “cem”ê wiha ye:

(96) (a) Em îşev hatin **cem** te ki xwa ra rûnin (Ç.6).

(b) Çûye **cem** keçikê uw, ki mêvanê keçikê hene ... (Ç. 5).

(c) Çûye **cem** keçikê, keçik hemîle bûye (Taştan, 2013: 9).

(d) Em ê xwinê wê kinca bidinî, **cem** paşê bênî³⁷ ..(Taştan, 2013: 8).

Daçek a “cem”ê di devoka Semsûrê de wateyên nêzî wateya daçekên “ba” û “bal” ê dide hevokan. Lê belê di mînakan (96b) de xuya dibe ku ev daçek ji bo wateya “cemhevbûnê” ango “hevrebûnê” xurttir bike bi peyva “hev” ê re tê bikaranîn.

v. Dû; Bikaranîna daçek a navî “dû”yê wiha ye;

(97) (a) Ralişt kunê xwa dû xwa xuş kir, bir çû ser kanîyê (Ç.1).

(b) Lawik **dû** nare terkî şîvê nake (Taştan, 2013: 13).

(c) Rawûye rokê kulor³⁸ kirine, kufte kirine, şîvin mîvin kirine **dû** keçikê çûye (Ç. 5).

(d) ...cotkarîyo bireve çîyê girî **dû** yê ê çûkî li pêşîyê ye (Ç. 5).

³⁵Gi: giş, hemû.

³⁶Lewan: legan.

³⁷Bênî: bibêjin.

³⁸Kulor: cureyekê nên e. Li ser sêlê tê çêkirin.

Di mînanan (97a- d) de jî xûya dibe ku daçeka “dû” yê ji hêla cih û hêlê ve wateya “paş” dide hevokê.

vi. Heta; Bikaranîna daçeka navî “heta”yê wiha ye;

(98) (a) Rûyê **heta** îvarê îşê xwa hew³⁹ bû (Ç.1).

(b) ...were îşev li me ra **heta** siweda sewî ki xewê me nê klama biwê... (Ç.1).

(c) Pîr dihere bin avê ra dike, tiji dike **heta** ki çar gava radine av diwê xuf xuf (Ç.1).

(d) **Hetanî** salê tînî kurikkî Xwedê dike bi we de (Ç. 7).

Daçeka “heta” yê di mînanan de jî ji hêla demê ve “sînore rûdanê” nîşan dide. Her wekî ku ji mînanan (98a-d) jî dîyar dibe. Di devoka Semsûrê de forma daçeka “heta”yê “ta” nayê bikaranîn û hinacaran di forma “hetanî” de tê bikaranîn.

vii. Paş; Bikaranîna daçeka navî “paş”ê wiha ye;

(99) (a)... pêşa xwa rakir ûw baz da ûw ket **paş** qêpi ûw (Ç.1).

(b) ... ê te vi ra bikim, ê xwe jî **paş** dergûşê bikim (Taştan, 2013: 17).

(c) Çûn, avitin **paş** pezê wan (Ç. 3).

(d) Çûye ketîye **paş** derkê ban kirîye gotîye... (Ç. 5).

Daçeka “paş” ê di mînanan de de wateya “cih û alîyê kes an tiştan yê paş” dîyar dibe.

viii. Pêy; Bikaranîna daçeka navî “pêy”ê wiha ye;

(100) (a) Rûya⁴⁰ da **pê** hev (Ç. 3).

(b) Berxa da **pê** bizinê (Ç. 7).

(c) Gundî **pê** mixtêr derin (Ç. 9).

³⁹Hew: ew.

⁴⁰ Rûya: rojan

(d) **Pê** wan çûn me ra ne kar e.

Daçeka “pêy”ê ku di devoka Semsûrê de wateya “berdewama rûdanê” dide hevokê. Her wekî ku ji mînakên (100a-d) jî xuya dibe tîpa dawî ya daçekê “y” di devoka Semsûrê de dikeve. Daçek di forma “pê” de bikaranîn.

ix. Pêş; Bikaranîna daçeka navî “pêş”ê wiha ye;

(101) (a) ...cara sisiya mêrik a ha mezdike dêv te **pêş** çava (Taştan, 2013: 12).

(b) Paş birî **pêş** birî dor sirtkî ra terin çava (Taştan, 2013: 15).

(c) Bazdanê da kes nikane **pêş** mi keve (Ç. 2).

(d) Pêz xwe da **pêş** devîya sîndanê⁴¹.

Daçeka “pêş” di devoka Semsûrê de her wekî ku ji mînakên jî dîyar dibe “cîh û hêla pêş” ya tiştan an jî kesan nîşan dide.

x. Rû; Bikaranîna daçeka navî “rû”yê wiha ye;

(102) (a) Wexta ku erebe **rû** hev di va rawirîn nenikê xwa li hev ketin (Ç. 13).

(b) ...êkî pêt ket ber birin çûn **rû** kenarê ferêt danîn (Ç.1).

(c) A va pêçî mi bide **rû** hev (Taştan, 2013: 12).

(d) Tere⁴² tîne pêçiya xwe dide **rû** hev (Taştan, 2013: 12).

Ev daçek di devoka Semsûrê de hin caran wateya daçeka “ba” û “cem” ê de tê bikaranîn. Di mînaka (102a) jor de bikaranîneke bi vî rengî heye. Ev daçek li Semsûrê bi awayekî berbelav tê bikaranîn.

xi. Ser; Bikaranîna daçeka navî “ser”ê wiha ye;

(103) (a) E⁴³ carê nerim⁴⁴, **ser** di barî xwa nedim (Ç.1).

⁴¹ Sîndan: Cureyekî daran e. Herdem şîn e. Pelên xwe naweşîne.

⁴²Tere: diçe, dihere.

⁴³ E: ez.

⁴⁴Nerim: neçim.

(b) Va har⁴⁵ sê kaçik⁴⁶ har rû⁴⁷ çwîne ser xêni ûya⁴⁸ çêkirine (Ç. 9).

(c) Rêvi hatîye **ser** rojinê ban kirîye (Ç. 5).

(d) Dawîya⁴⁹ Kêw Reşi **ser** kanîya Kûmîrê diwe (Ç.2)

(e) Diwê rok⁵⁰ di lawik tê topik kendirî xwa dikire ûw tê, dihere heldikişe **ser** minarekê (Ç.1).

Her wekî ku ji mînan (103a-e) jî xuya dibe ev daçeka di devoka Semsûrê de wateya “bilindîyê”, “bilindbûnê”, “lêzêdekirinê” û “alîyê jor ya tiştan” dide hevokan.

xii. Hember; Bikaranîna daçeka navî “hember”ê wiha ye;

(104) (a) Apê Firîz **hember** rawû pê (Taştan, 2013: 8).

(b) ...tiştê xwa nênika xwa danî **hember** xwa...(Ç.1).

(c) Welle ez ê **hember** vî kawranî⁵¹ dînim (Ç.1).

(d) Sewa hengirmê⁵² bikin kewê xwa dan **hember** hev (Ç. 2).

Bikaranîna daçeka “hember”ê di devoka Semsûrê de her wekî ku ji mînan (104a-d) jî xuya dibe wateyên wek “hevber, beramber û dijber” ê dide hevokan.

xii. Pêşber; Ev daçek di devoka Semsûrê de nayê bikaranîn. Di dewsa vê daçekê dedaçeka “hember”ê bi awayekî xurt tê bikaranîn.

xiv. Wekî; Bikaranîna daçeka navî “wekî”yê wiha ye;

(105) (a) Merîyekî **wek** xenzîr e (Ç.6).

(b) Em heta îvarî **wek** kuçikan şoxilîn (Ç. 12).

(c) Î **wekî** xenzîr e, nizane westîn çî ye.

⁴⁵ Har: her.

⁴⁶ Kaçik: keçik.

⁴⁷ Rû: roj.

⁴⁸ Ūya: neqşên ku bi ta û derzîyê li ser kitanan tî çêkirin re tê gotin.

⁴⁹ Dawî: doz, şer

⁵⁰ Rok: rojek.

⁵¹ Kawran: karwan, kerwan.

⁵² Hengirme: Jo bo xwendina kewan, ji hevsorkirina kewan re tê gotin.

(d) ...dû xwa jî bi benîştî benîştîkê va xwa va bizeliqîne **wekî** di nawe (Ç. 5).

Di devoka Semsûrê de her wekî ku ji mînan (105a-c) jî xuya dibe forma daçekê gelek caran dibe “wek”. Ev daçek bi gelemperî di şibandênên tiştên xirab de tê bikaranîn. Lê belê kêman caran be jî mirov dikare rastî bakaranîna vê daçekê ya ji bo tiştên baş jî bê. Her wekî ku ji mînakê (105-d) jî dîyar e ev şibandin jî hêla erênî ve hatîye kirin.

xv. Mîna; Bikaranîna daçeka navî “mîna”yê wiha ye;

(106) (a) **Mîna** şêra îşê xwa sax kirin (Ç. 4).

(b) **Mîna** kevirkî sar rûnişt, qet deng nekir

(c) Tu jî **mîna** mi bêbextî (Ç. 7).

(d) **Mîna** ki hen⁵³ ser girî Awî Şawê⁵⁴ (Ç.1).

Di devoka Semsûrê de daçekên şibandinê “nola” û “fena” nayên bikaranîn. Her wekî ku ji mînan (106a-d) jî dîyar dibe ji bo şibandinê kêman caran “wek” û pir caran jî daçeka “mîna” yê tê bikaranîn.

xvi. Ber; Bikaranîna daçeka navî “ber”ê wiha ye;

(107) (a) Qeraş radiwe rîvî⁵⁵ va dikevin rê, tên **ber** çakê⁵⁶ (Ç. 9).

(b) Tê santilkê⁵⁷ aha **ber** ave xî⁵⁸ û rakî, a hêli di jî ê hespê rawire⁵⁹ (Taştan, 2013: 10).

(c) Dipê, dinire ku dêvik têye **ber** qêpi⁶⁰ diwê yan bîçiya⁶¹ xwa dirêj... (Ç. 9).

⁵³Hen: herin, biçin.

⁵⁴Girî Awî Şawê: Kaşekî di navbera gundê Narincê û Omera da ye.

⁵⁵Rîvî: rovî, revî

⁵⁶Çakê: çayekê. Çemê biçûk.

⁵⁷Santil: sîtil, satil.

⁵⁸Xî: xistin.

⁵⁹Rawirîn: derbasbûn, raborîn.

⁶⁰Qepi: deri.

⁶¹Bîçi: pêçi.

(d) Çûye wira, jinikek ber êr e, arî dadaye, danhûrik daye ser (Taştan, 2013: 9).

(e) Rîvî û qeraş tèn **ber** qûnaxa⁶² paşê li haspa xwa dadikişê⁶³

(Ç. 9).

Ev daçek wateya “pêşîya cih, der an tişteki” dide hevokê. Di van mînakên de jî bi van wateyan rabûye.

xvii. Nav; Bikaranîna daçeka navî “nav”ê wiha ye;

(108) (a) Pinc naxwe dihere dikeve **nav** cîhê xwa (Ç.1).

(b) Beniştî beniştîkê kirîye ûw xwa va zeliqandîye çûye **nav** hevala (Ç. 5).

(c) Me meke **nav** însanên bilmez⁶⁴ (Ç.2).

(d) Hisê ardê xwa da **nav** destê xwa mist da, mist da ûw...(Ç.1).

Herwekî ku ji mînakên (108a-d) jî dîyar dibe ev daçek wateya “dinavdebûnê” dide hevokan. Di mînakên (108) de jî wateya “dinavdebûnê” daye hevokan.

3.3.3. Daçekên Hevdudanî

Ev daçek dibin du beş. Daçekên hevdudanî yên koma ewil û daçekên hevdudanî yên koma duyem. Di vê beşê de ev daçek bi mînakên hatîye şîrovekirin.

3.3.3.1. Daçekên Hevdudanî yên Koma Ewîl

Di ve komê de daçekên xwerû “bi, di, ji, li” bi daçekên navî re tèn cem hev û daçekên hevdudanî pêk tînin.

a) Daçekên Hevdudanî ku bi Daçeka Bi û Daçekên Navî Çêdibin

Bikaranîna daçeka xwerû “bi” yê û daçekên navî bi hev re wiha ye;

(109) (a) Diwê ki⁶⁵ pitik⁶⁶ **bi ser** nînga ket dihere kara dixwe (Ç.1).

⁶²Qûnax: qonax, qesr.

⁶³ Li haspa xwe dakişîn: ji hespa xwe peya bûn.

⁶⁴ Bilmez: nezan.

⁶⁵ Ki: ku

(b) Te rindîyek **bi ser** me xist (Ç. 11).

(c) Bi şoxil xwe **bi pêş** xistin (Ç. 12).

(d) Bizinê gundîya **nav** hev ketine (Ç. 4).

(e) Çû **bi paş** dirîyekê ket (Ç.1).

Di devoka Semsûrê de di vî cureyî daçekan de bi gelemperî daçeka xwerû “bi” û daçeka navî bi hev re hatîye bikaranîn. Lê belê carinan em dibînin ku daçeka xwerû di hevokê de nehatîye bikaranîn tenê daçeka navî heye. Ew yek di mînakê (109-d) de bi awayekî zelal xuya dike. Lê ew rewş ne rewşeke pir berbelav e.

b) Daçekên Hevdudanî ku bi Daçeka Di û Daçekên Navî Çêdibin

Di çarçoveya vê xebatê de em rast li vê cureya daçekan nehatin.

c) Daçekên Hevdudanî ku bi Daçeka Ji û Daçekên Navî Çêdibin

Her wekî ku berê jî hatibû diyarkirin di vê koma daçekan de daçeka xwerû “ji” û daçekên navî yên wek “ser, ber, nav, dû”...hwd. tîn cem hev û daçekan çêdikin.

Bikaranîna van daçekan wiha ye;

(110) (a) **Li pê** me tiştê nema go (Ç. 7).

(b) **Li nav** me yek deriwa dike.

(c) Wextê ki⁶⁷ derim⁶⁸ nav erd ew jî **li dû** mi tî.

(d) Kes **li ber** wî ranewûye (Ç. 2).

Her wekî ku berê jî hatibû gotin di devoka Semsûrê de dewsa “ji”yê daçeka “li” yê tî bikaranîn. Ev yek di mînakên (110a-d) jor de bi awayekî zelal xuya dibe. Ev daçek di hevokan de wateyên wek “jêderketinê”, “jêbûnê” dide.

d) Daçekên Hevdudanî ku bi Daçeka Li û Daçekên Navî Çêdibin

Bikaranîna van daçekan wiha ye:

⁶⁶ Pitik: Zaroka biçûk.

⁶⁷Ki: Forma gihaneka “ku”yê di devoka Semsûrê de ye.

⁶⁸ Derim: diçim.

- (111) (a) **Li pêş** me feq venane (Ç.2).
- (b) Gundî gi⁶⁹ **li dû** me şora⁷⁰ dike.
- (c) Rîvi tara derkê ku, pîrikik **li ber** qûnaxika mazin **li ber** naxirika mazin a (Ç. 9).
- (d) Îşev **li ba** mi bimîne (Ç. 4).
- (e) Ê **li hember** tê ye (Ç.1).
- (f) Tê **li ber** nahalê⁷¹ biskinî (Taştan, 2013: 9).

Ev daçek di van mînanan (111a-f) de wateyên wek “lêbûna cihekî” dide hevokan. Dikare bê gotin ku di daçekên hevdudanî de -ku bi daçeka xwerû “li”yê û daçekên navî çêdibin- her du daçek hertim bi hev re tên bikaranîn.

3.3.3.2 Daçekên Hevdudanî yên Koma Duyem

Di vê komê de daçekên navî yên wek ber, bin, bo, dû, nav, nik, pêş, paş, rex, ser... û hwd. dikevin navbera bazindaçekan. Ew daçek li Semsûrê wiha derdikevin pêşberî me.

a) Daçekên Hevdudanî ku bi Bazindaçekên Bi yê Çêdibin

- i. Di devoka Semsûrê de bikaranîna “bi...de” yê bi daçekên navî re wiha ye:

- (112) (a) Zîpikê⁷² mînanî gûza **ser** me **da** hatin.
- (b) Şivan **pêş** kerîyê **da** çû (Ç. 3).
- (c) Genimê me **bin** berfê **da** ma loma gi şewitîye.
- (d) Ezmana çûk **ser** te **da** hat (Taştan, 2013: 15).
- (e) Rakir bani **ser** gewrîya xwa **da** ber da (Ç.1).

⁶⁹ Gi: giş, tamam.

⁷⁰ Şor:peyv, bêje.

⁷¹Nahal: newal.

⁷²Zîpik: têrî.

Her wekî ku di mînan (112a-e) de jî tê dîtîn pêşdaçeka “bi”yê ketîyê daçeka navî xwe parastîye û paşdaçek (de) jî bûye “da”. Lê belê ketina pêşdaçekê û guherîna paşdaçekê ya dengî ji hêla wateyê ve tu guhertin di hevokan de çênêkirîye.

- ii. Di devoka Semsûrê de bikaranîna “bi...re” yê bi daçekên navî re wiha ye:

- (113) (a) Çima **dû** te **ra** kes nehat (Ç. 6)
 (b) Dewar **paş** me **ra** hat (Ç. 12)
 (c) **Pişt** pezî xwe **ra**, xwa ber nav çêm⁷³ da.

Her wekî ku di mînan (113a-d) de jî tê dîtîn pêşdaçeka “bi”yê ketîyê daçeka navî xwe parastîye û paşdaçek (re) jî bûye “ra”. Lê belê ketina pêşdaçekê û guherîna paşdaçekê ya dengî ji hêla wateyê ve tu guhertin di hevokan de çênêkirîye.

- iii. Di devoka Semsûrê de bikaranîna “bi...ve” yê bi daçekên navî re wiha ye:

- (114) (a) Me ew pinik⁷⁴ a jî **ser** êrd **va** berda (Ç. 12).
 (b) Sê cara **dû** hev di **va** go (Ç.1).
 (c) Em vê seçîmê⁷⁵ da **dû** we **va** ne (Ç. 8).
 (d) Golika ki kuçika tirsandî **ber** gund **va** direvî (Ç. 2).

Her wekî ji mînan (114a-d) jî xuyaye di devoka Semsûrê de di vî cureyî daçekan de pêşdaçek (bi) bi gelemperî dikeve û paşdaçek (ve) jî hertim dibe “va”. Divê bê gotin ku ketina pêşdaçekê û guherîna dengî ya paşdaçekê ji hêla wateyê ve tu guherînê di hevokan de çênake.

b) Daçekên Hevdudanî ku bi Bazindaçekên Di yê Çêdibin

- i. Di devoka Semsûrê de bikaranînan daçekên hevdudanî ku bi bazindaçeka “di...de” yê û bi daçekên navî yen wekî ber, ser, du , pêş, paş, pişt û hwd çêdibin wiha ye:

⁷³Çem: Li Semsûrê ji bo der û dorên bi av û dar ev bêje tê bikaranîn.

⁷⁴Pinik: erdê biçûk.

⁷⁵Seçîm: hîlbijartin.

- (115) (a) **Bin** darê **da** Gurri li sarê wê dinire (Ç. 9)
- (b) ...wê ave hev dixîne, **ser da** berdide (Taştan, 2013: 12)
- (c) **Ber** avê **da** hat ki merîyekî çîwêl dê , a tim diwê e nakim (Ç.1).
- (d) ...ê go oxil ti di wir da mayî, he go kanê çî **di paş da** heye (Ç.1).
- (e) Hisik **bin** pêşê **da** rûdinişt (Ç.1).

Her wekî ji mînan (115a-d) jî xuya dibe di devoka Semsûrê de di vî cureyî daçekan de pêşdaçek (di) bi gelemperî dikeve û paşdaçek (de) jî hertim dibe “da”. Di van mînan de ketina pêşdaçekê û guherîna dengî ya paşdaçekê ji hêla wateyê ve tu guherînan di hevokan de çênake.

- ii. Di devoka Semsûrê de bikaranînan daçekên hevdudanî ku bi bazindaçeka “di...re” yê û bi daçekên navî yen wekî ber, ser, du , pêş, paş, pişt û hwd çêdibin wiha ne:

- (116) (a) His ranakeve, **bin** lata⁷⁶ xwa **ra** dinire (Ç.1).
- (b) Ket zikê stûnê, stûn **ser ra** hat hev (Taştan, 2013: 18).
- (c) Î **di ber** derkê van **ra** wû (Ç.1).
- (d) ...çiwalkî me heye were zik keve, ez ê dêv **ser** te **ra** girêdim (Taştan, 2013: 8).

Her wekî ji mînan (116a-d) jî xuyaye di devoka Semsûrê de di vî cureyî daçekan de pêşdaçek (di) bi gelemperî dikeve û paşdaçek (re) jî hertim dibe “ra”. Divê bê gotin ku ketina pêşdaçekê û guherîna dengî ya paşdaçekê ji hêla wateyê ve tu guherînê di hevokan de çênake.

c) Daçekên Hevdudanî ku bi Bazindaçekên Ji yê Çêdibin

- i. Di devoka Semsûrê de bikaranînan daçekên hevdudanî ku bi bazindaçeka “ji...de” yê û bi daçekên navî yen wekî ber, ser, du , pêş, paş, pişt û hwd çêdibin wiha ne:

⁷⁶: Lat: nivîn, doşeg.

- (117) (a) Qantira mi **bin** giraniya barî êzinga da ket (Ç. 4).
- (b) Em **ber** kesî **da** narin ser avê (Ç. 11).
- (c) **Paş da** bêrik lêxist (Ç.6).
- (d) Xwa **ber** kesî **da** meşewitîne (Ç.1).

Her wekî ku bi mînakên (117a-d) jî eşkere dibe. Ev daçek wateya “cihê ku rûdan dest pê dike” û “diqewime” dide hevokan. Di devoka Semsûrê de di vî cureyî daçekan de daçeka xwerû “ji” dikeve û di paşdaçekê de jî guherîneke dengî çêdibe paşdaçek(de) dibe “da”.

- ii. Bikaranînan daçekên hevdudanî ku bi bazindaçeka “ji...ve” yê û bi daçekên navî yen wekî ber, ser, du , pêş, paş, pişt û hwd çêdibin wiha ne:

- (118) (a) Qiymeta wî **pêş va** sewi min ne tiştik e (Ç.2).
- (b) Kuçika xwa **paş va** avitin kerê ûw ker dirandin (Ç. 7).
- (c) **Dû** wan **va** baz da çû ser kanîyê.
- (d) Îskela me **bin** kokê **va** çû. (Ç. 13).

Her wekî ku bi mînakên (118a-d) jî eşkere dibe ev daçek wateya cihê ku bûyer jê dest pê dike dide hevokan. Di mînakên jor de daçeka xwerû “ji” ketîye û di paşdaçekê de jî guherîneke dengî çêbûye paşdaçek (ve) bûye “va”. Ev ketina pêşdaçekê û guherîna dengî ji hêla wateyê ve tu guherîn an jî kêmasîyê naxe hevokan.

- iii. Bikaranînan daçekên hevdudanî ku bi bazindaçeka “ji...re” yê û bi daçekên navî yen wekî ber, ser, du , pêş, paş, pişt û hwd çêdibin wiha ne:

- (119) (a) **Paş ra** lêwik xistiye (Ç. 10).
- (b) Ez î herim **dû** min **ra** ti were (Ç. 11).
- (c) Rûn **ser** şîr **ra** tê girtin (Ç. 6).

(d) Am⁷⁷ bi miqasê⁷⁸ kizût⁷⁹ hewkî **sar ra** jêkin û em bi te din (Ç.9).

(e) Mêrik **ber** pi **ra** girt (Ç.1).

Her wekî ku bi mînakan (119a-d) jî xuya dibe. Ev daçek wateya cihê ku bûyer jê dest pê dike û tê dide hevokan. Di mînakên jor de daçeka xwerû “ji” ketîye û di paşdaçekê de jî guherîneke dengî çêbûye paşdaçek(re) bûye “ra”. Ev ketina pêşdaçekê û guherîna dengî ji hêla wateyê ve tu guherîn an jî kêmasîyê naxe hevokan.

3.4. Daçek û Tewang

Her wekî ku hatibû gotin daçek peyvên pişt xwe ditewînin. Ji hêla tewangê ve devoka Semsûrê gelekî çalak e. “...hemû navdêrên mê rast têne tewandin û navdêrên nêreza jî bi tenê yên ku tê de tûpên /a/ û /e/ hene têne tewandin, ew her du deng dibin /ê/...(Tan, 1996: 42). Ev taybetîya di hundir de tewînê di mînakên jêr de xuya dibe.

(120) (a) Hisik carê derket ser **xêni** (Ç.1).

(b) Vana diherin **xwa** ra bi **çolê** dikevin (Ç.1).

(c) ...boçik **xêni** da darxistîye (Ç. 5).

(d) Hirç nav **gêris** da rawû, garisî.... (Taştan, 2013: 8).

(e)... tu herî çiyakê veqelêşî avê **mi** ra ûnî...(Taştan, 2013: 12)

(f) **Şivên** ra diwê wara am qewalan veşêrin, ku kê dî bira tarkê xwa bide ê din tarin (Ç. 9).

Her wekî ku ji mînakan (1120 a-f) xuya dibe daçekan bandorek li peyva pişt xwe kirîye. Dema ku ji mînakan bê nihêrîn dê bê dîtî ku di hin mînakan (120a- 120d) de daçeka navî di hevokê de cih girtîye û peyva pişt xwe tewandîye. Di hin mînakan (120b-c-d-e-f) de jî bazindaçek hatîye bikaranîn. Pêşdaçek di hevokan de ketîye lê belê dîsa jî peyva pişt cihê pêşdaçekê tewîyaye. Di mînakên (120a-c-d-f) de jî tewang li gor xususîyeta devoka Semsûrê çêbûye. Peyvan gireya tewangê negirtîye. Peyvên “xani, garis û şivan” di hundir de tewîyane û bûne “ xênî, gêris û şivên”.

⁷⁷ Am: Em

⁷⁸ Miqas: meqes.

⁷⁹ Kizût: bizot.

3.5. Daçek di Çêkirina Peyvan de

Her wekî ku berê jî hatibû gotin daçek bi çêkirina cihnav, lêker, gihanek û hokeran radibin. Di vê beşê de ev cureyên peyvan ku bi daçekan çêbûne bi mînakên hatin vegotin.

3.5.1. Daçek di Çêkirina Navdêran de

Daçek di çêkirina navdêran pêkhatî û hevdudanî de wiha derdikevin pêşberî me;

(121) (a) **Şerjêkirina** mîrişkan nawe qûrban, diwe loqme.

(b) Hîn kurikê xwa gîyê **bêkar** in.

(c) Em sewê **lêkirina** tûtî hatin vê derê.

(d) Ew erdî **bikir** tiştik lê hêşin nawe.

Di devoka Semsûrê de daçeka “ji” bi çî peywîrê be bila bibe ji bilî çend nimûneyan nayê bikar anîn. Ew nimûne jî bêjeyên wek “şerjêkirin û jexin⁸⁰” ê ne.

3.5.2. Daçek di Çêkirina Lêkeran de

Di devoka Semsûrê de mînakên lêkerên hevdudanî û lêkerên biwêjî wiha ne;

a- Lêkerên Hevdudanî

Daçek di lêkerên hevdudanî de wiha derdikevin pêşberî me;

(122) (a) Keçikê ben **şer jê kin**, bira e newînîm (Taştan, 2013: 9).

(b) Dêw bavê **lê dan**, **lê nedan**, dê **lê da**, bavê **lê da** çir kirin qapî venewû (Ç.1).

(c) Piştîyê Pincê **lê kirin** ûw (Ç.1).

(d) ...û li ser hespê, zînî hespê **lê dixê** û çim dike (Taştan, 2013: 10).

(e) Me ber Ap Ezîzê⁸¹ beranek **şer jê kir** (Ç. 12).

⁷⁹ Jexin: ji veguheztina “ji” û “xeynî” yê çêbûye û di devoka Semsûrê de jî tam di wateya “ji xeynî” yê de tê bikaranîn.

(ê) Her ku şekî **pê dixê** derzîkî xwar dike û cilpa golê dike (Taştan, 2013: 13).

(f) Gurzê xwa **li dest girt** (Ç.1).

Daçek di çêkirina lêkerên hevdudanî de xwedî rol in. Ew yek di devoka Semsûrê de jî wiha ye. Lê belê ji bilî peyva “şerjêkirinê” daçeka “ji” yê nayê bikaranîn. Dewsa “ji” yê “li” tê bikaranîn.

Daçek di lêkerên biwêjî de jî wiha derdikevin pêşberî mê;

(123) (a) Vana niva **bi xwa hesîn** (Ç. 3).

(b) Bi gîyê hew tenê ye ti **pê va diqarî** (Ç.1).

(c) Diwê carê tê xwa pê dinimîne, xwa **pê dinimîne** –aa- yaxin⁸² çuwê ye (Ç.1).

(d) Neyaran ciwan **tê wer kiribûn**.

(e) De **nifirêkî** xwengê **lê kiriye**, hat şûnê (Taştan, 2013: 21).

Di devoka Semsûrê de lêkerên biwêjî de daçek wek gireyên çêker gelekî çalak in. Ji xeynî daçeka xwerû “ji” yê daçekên din di van cureyên lêkaran de bi hêsanî tên dîtin. Herwekî ku li jor hatî destnîşankirin di dewsa daçeka xwerû “ji” yê de daçeka xwerû “li” tê bikaranîn.

3.5.3. Daçek di Çêkirina Cihnavan de

Ji ber ku daçek tenê di çêkirina cihnavên lihevxiştî de xwedî rol in tenê mînakên cihnavên lihevxiştî hatine dayîn. Cihnavên lihevxiştî jî bi du awayan çêdibin.

3.5.3.1. Cihnavên Lihevxiştî

Her wekî ku li jor hatîye gotin cihnavên lihevxiştî bi du awayan çêdibin. Mînakên van cihnavan ev in;

a- Cinavkên Lihevxiştî bi Cihnava Berbihevîn

Mînakên van cihnavan ev in;

⁸⁰ Ap Azîz: Endamekî ji malbata Axûçanan e. Di nav eşîra Kawîyan de wek kesekî pîroz tê hebandin. Gelek elewîyên wê deverê diçin ber gora wî qurbanan jê re diwedînin.

⁸²Yaxin: nêzik

i. **Jev:** Di çarçoveya vê xebatê de em di devoka Semsûrê de li bikaranîna “jev” ê rast nehatin.

ii. **Pev:** Di devoka Semsûrê de bikaranîna “pev” ê wiha ye:

(124) (a) Pêçî xwe derdixî ke bimijim: dernaxî ez ê te **peva** şikeftê bêrim, bixwim (Taştan, 2013: 9).

(b) Were, **peva** qantira, di qantir xwa bêr va bere here (Ç.1).

(c) Mangê⁸³ me garis **peva** xwar (Ç. 4).

(d) Pezê xwa ber nav îsota dawû, pêz îsot **peva** xwarûwûn (Ç. 11)

iii. **Lev:** Di çarçoveya vê xebatê de em di devoka Semsûrê de ji bikaranîna “lev” ê rast nehatin.

iv. **Tev:** Di devoka Semsûrê de bikaranîna “tev” ê wiha ye:

(125) (a) Rîvî⁸⁴, haspê⁸⁵ û kincan **tev** digire û tara⁸⁶ hinda qerêş (Ç. 9).

(b) Em **tev** çûn ser aşî Lîçên⁸⁷ (Ç. 12)

(c) Pîre ra diwe law, **tev** yaşemîş diwin, heyatê surmîş dîkin (Taştan, 2013: 13).

(d) Ap û amojna gurri tîn **tev** şîvê dîkin, digrin tarin (Ç. 9).

v. Di çarçoveya vê xebatê de di devoka Semsûrê de em rast li “Jêk” , “pêk” û “têk” ê nehatin.

Herwekî ku ji mînakan jî dîyar e. Di devoka Semsûrê de cihnavên “jêk”, “pêk”, “têk”, “lev” û “jev” nayên bikaranîn. Ji xeynî van yên din bi awayekî berbelav tîn bikaranîn. Hewce ye bê gotin ku cihnava “pev” bêtir wekî “peva” tê bikaranîn. Ew rewş di mînakan (124) de bi awayekî zelal dixuye.

⁸³ Mange: çêlek.

⁸⁴ Rîvî:rovî

⁸⁵ Hasp: hesp

⁸⁶ Tara: diçe.

⁸⁷ Aşî Lîçên: Aşekî avê ye, nêzî gundê Narincê ye. Gundê Narincê jî girêdayê şaredariya Kûmîrê ye.

b- Cihnavên Lihevxiştî bi Daçekan û Cihnavê ‘ê’

Mînakên van cihnavan di devoka Semsûrê de wiha ne;

i. **Pê:** Di devoka Semsûrê de bikaranîna “pê” yê wiha ye:

- (126) (a) Paşê mêrik kaçikê digre û tara mal û **pê** va dizewice (Ç. 9)
- (b) Lawik **pê** dikene du sê cara lê wir dike (Ç.1).
- (c) Dêv **pê** da çû xwa ra hen⁸⁸ xwa şikênandin dan ser hev (Ç.1).
- (d) A hînganê here cem derdî xwe **pê** ra bê (Taştan, 2013: 11).
- (e) ... postê wî ûne⁸⁹ ez ê şîrî xwe **pê** da bidoşim... (Taştan, 2013: 11).

ii. **Lê:** bikaranîna cihnavê “lê” yê wiha ye:

- (127) (a) **Lê** mezdike, keçikî mîna hîv û ro ye (Taştan, 2013:13).
- (b) Mêrik **lê** mez dike, diwê va ne jinka min e (Taştan, 2013: 14).
- (c) Tarka⁹⁰ xwa vir va **lê** dixê wir va xwa **lê** dixê, îşê têrka ye (Ç. 9).
- (d) Ûn ê him bi xwa jî lê têr buxin ûw em ê bikirinî ti jî pê mangex xwa bikirî (Ç.1).

iii. **Tê:** bikaranîna cihnavê “tê” yê wiha ye:

- (128) (a) Gurri li xwalyê dinire, şîşa ku sûr⁹¹ kirîwî **tê** da ye, digre û di her di çavan ra dike (Ç. 9).
- (b) Bira hemêzê⁹² xwe **tê** ra birin, lê şidîn, paç kirin⁹³ (Taştan, 2013: 21).

⁸⁸ Hen: hinek.

⁸⁹ Ûne: bine. Raweya fermanê ya lêkera “anîn”ê.

⁹⁰ Tarka- terke: Li Semsûrê pêz tê gotin.

⁹¹ Sûr: sor.

(c) Ez kî gurz tê çerpînîm (Ç.1).

(d) Em ê her ek⁹⁴ hena **lê** ra top kinî, piştî wê تمام kinî (Ç.1).

iv. **Jê:** bikaranîna cihnava “jê” yê wiha ye:

(129) (a) Lawik pê dikene, du sê cara **lê** wir dike (Ç.1).

(b) Teze⁹⁵ jî xwengê mi nexweş bû, derdek **lê** rawiye (Taştan, 2013: 10)

(c) Bere⁹⁶ her yekî çilkik av **lê** ke ê xwaş biwin (Ç.1).

(d) Vê rawû hespik **lê** ra berda (Ç.1).

(e) Boçikê rêvi pê va **jê** dikin û tînin tîn, didin pîrê (Taştan, 2013: 15).

Ji ber ku di devoka Semsûrê de wekî daçek “ji” nayê bikaranîn û ji dewsa “ji” yê “li” tê bikaranîn cihnava “jê” yê wek “lê” derdikeve pêşberî me. Lê belê hin deverên Semsûrê û bi taybetî der û dorên navçeya Sincikê û Aldûş gundên van navçeyan wek “jê” tê dîtin. Lê ew awa jî ne pir berbelav e û bikaranîneke pir bi sînore. Di van deveran jî tenê di peyva “jêkirin”ê de tê dîtin.

3.5.4. Daçek di Çêkirina Rengdêran de

Bikaranîna hin rengdêrên ku bi daçekan çêdibin, di devoka Semsûrê de wiha ye:

a) Rengdêrên pêkhatî;

(130) (a) Merîyên **bêar** sewê tiştê ha fedi nakin (Ç. 2).

(b) Çûye erdekî **bikir** xwa ra kirîye tûtîn (Ç. 4).

(c) Me piştî xwa da mêrê **binamûs**.

(d) Şîvê **bêgoşt** daweta da mekin.

⁹²Hemêz: hembêz.

⁹³ Paçkirin: Maçkirin, ramûsîn

⁹⁴Ek: yek.

⁹⁵ Teze: a niha.

⁹⁶ Bere: Bibe. Raweya fermanî ya lêkera “birin”ê .

b) Rengdêrên hevdudanî;

- (131) (a) Golika **liberşîr** belaş da (Ç.2).
(b) Dîkî **şerjêkirî** li bermalê hildipirtîkîya.
(c) E **lêkirina** tûtin kok⁹⁷ hez nakim.
(d) Em çûn **serçavîya** ava Hewşerîyê.

Daçek di devoka Semsûrê de bi çêkirina rengdêran radibin. Tenê daçeka “ji” yê dema ku rengdêran çêdike ji bilî çend bêjeyên wek “şerjêkirin û jexin”ê weke “li” tê bikaranîn ango ji dewsa “ji” yê “li” tê bikaranîn. Ev rewş ji mînakê (131-c) jî dîyar dibe.

3.5.5. Daçek di Çêkirina Gihanekan de

Gihanekên ku bi daçekan çê dibin ev in: “ji lew re, ji bo, ji ber, bi ser de”.

i. Ji lew re: Bikaranîna “ji lew re” yê wiha ye:

- (132) (a) **Loma** e anîme dîharê ferêt kirime çîwêl ke têkevim ferêt (Ç.1).
(b) Sar e **loma** mi mont xwa kirîye.
(c) **Loma** tu nihatî civatê?
(d) Kerê me mir **loma** me nikanîw⁹⁸ wê salê şixra⁹⁹ bikşînin.

“Ji lew re” li Semsûrê di forma “loma” yê de tê bikaranîn. Dikeve navbera hevokan û sedema bûyerê dîyar dike. Di çarçoveya vê xebatê de em rastî formên vê gihanekê yên wekî “ji lew re”, “lewra”, “lewre” û “lew”ê nehatin.

ii. Ji bo: Bikaranîna “ji bo” yê wiha ye:

- (133) (a) **Boyî** ti herî bajêr mi pere dan te.
(b) **Boyî** eqînîya¹⁰⁰ bavê xwa bêxe pir şor kirin¹⁰¹.

⁹⁷Kok: qet, hîç

⁹⁸Nikanîw: nikaribû.

⁹⁹Şixre: koma zad yên wekî ceh, genim...hwd ya hişk ku hatî çînîn.

¹⁰⁰Eqînîya yekî/ê êxistin: qanîh kirin

(c) Me va qurbana **boy** heq kir (Ç.2).

(d) Me **bona** te va şîva gi¹⁰² hazir kir. (Ç. 9)

Ev gihanek di devoka Semsûrê de ji hêla armanc û sedemê ve hevokan bi hev ve girê dide û carinan jî dikeve navbera cihnavan. Digel vê yekê di devoka Semsûrê de ev gihanek di forma “boyî”, “boy” û “bona” de tê bikaranîn.

iii. **Ji ber:** Di çarçoveya vê xebatê de di çîrokên li ber destê me û di axaftinên rojane de em rastî vê gihaneka “ji ber” ê nehatin.

iv. **Bi ser de:** Bikaranîna “bi ser de” yê wiha ye:

(134) (a) Nanê me xwar **ser da jî** me ra zêf¹⁰³ kirin (Ç. 8).

(b) Rêva narîye hîn **ser da jî** nahêle kem rê herin (Ç. 4).

(c) Erdê me najot **ser da jî** nawê¹⁰⁴ ki ez nikarim werim bajom (Ç. 11).

(d) Merlixîya¹⁰⁵ me bîr kir **ser da jî** dijaminîyê me ra dike.

Di devoka Semsûrê de di bikaranîna vê gihanekê de gelek caran “bi” dikeve û “de” her tim dibe “da”. Her wekî di mînakên de jî xuya dibe ev gihanek digel gihaneka “jî” yê tê bikaranîn.

vi. **Digel:** Ev gihaneka ku ji “di” û “gel” ê çêbûye di çarçoveya vê xebatê de rastî gihaneka “digel”ê nehatin. Ev daçek di zimanê rojane de jî deverên ku li ser xebat hatî kirin qet nayê bikaranîn.

3.5.6. Daçek di Çêkirina Hokeran de

Li Semsûrê mînakên hokeran ku bi alîkarîya daçekan çêdibin hinek jê ev in:

(135) (a) **Duh va** li benda me ye (Ç. 10).

(b) **Sala çûyî va** li wir e (Ç. 12).

¹⁰¹ Şorkirin: xebardan, axivîn

¹⁰² Gi: giş, hemî, tev

¹⁰³ Zêf: Sixêf, çêr

¹⁰⁴ Nawê: Nabêje.

¹⁰⁵ Merlixî: Merivantî.

(c) **Ku da** hatî wê da here (Ç.1).

(d) **Nişka va**, yak tirikê dike (Ç. 9).

(e) Genimê xwa **bi qalûcê** çinîn.

Her wekî ku ji mînakên (135a-b) xuya dibin daçek di çêkirina hokeran de xwedî rol in. Lê belê dema ku bazindaçek bi rola hokeran radibin tê dîtîn ku pêşdaçekên wan ketine paşdaçekên wan jî li guherîneke dengî rast hatine û “e” yê paşdaçekan bûne “a”.



BEŞA ÇAREM

BERAWIRDKIRINA DAÇEKÊN DEVOKA SEMSÛRÊ û KURMANCÎYA STANDART

Di vê beşê de xalên hevpar û yên cuda yên daçekan di navbera kurmancîya standart û devoka Semsûrê de li gor sernavên beşa yekem hatîye berawirdkirin. Pêşî xalên hevpar piştî jî xalên cuda yên daçekan hatine dîyarkirin.

4.1. Daçekên Xwerû

a) Daçeka Xwerû “bi”

Xalên hevpar û cuda yên daçeka xwerû “bi” yê di navbera kurmancîya standart û devoka Semsûrê de ev in;

i. Di bikaranîna wateya alav û amûran de;

Ev daçek ji hêla wateyê ve wekî kurmancîya standart tê bikaranîn. Lê belê di devoka Semsûrê de hin caran bi forma “pê” jî derdikeve pêşberî me.

ii. Daçeka “bi” yê di wateya “li gorî” yê de;

Di devoka Semsûrê de daçeka “bi” yê di vê fonksîyonê de wekî kurmancîya standart tê bikaranîn. Hîç xaleke cuda di navbera her du bikaranînan de nîne.

iii. Daçeka “bi” yê di sond xwarinan de;

Ev daçek ji hêla wateyê ve wekî kurmancîya standart tê bikaranîn. Lê belê bi rêjeyeke kêr be jî tê dîtin ku di sondan de ev daçek nehatîye bikaranîn.

iv. Bikaranîna neyînîya daçeka “bi” yê “bê” ;

Ev daçek wekî kurmancîya standart hevokan dike neyînî. Di devoka Semsûrê de jî bi her awayî wekî bikaranîna kurmancîya standart tê bikaranîn.

v. Daçeka “bi” yê di wateya dabeşkirin û kombûnê de;

Daçeka “bi” yê di devoka Semsûrê de jî weki kurmancîya standart wateya “dabeşkirin” û “kombûnê” dide hevokan. Lê belê di vê wateyê de hin caran daçek ketîye û nehatîye bikaranîn.

vi. Daçeka “bi” yê di navbera cotepeyvan de;

Di devoka Semsûrê de jî ew daçek weke kurmancîya standart wateya “dabeşbûn” û “kombûnê” dide hevokan. Tiştê ku bikaranîna vê daçekê ji kurmancîya standart cuda dike ew e; ev daçek hertim bi vê peywîrê di nav cotepeyvan de nayê bikaranîn. Awayê ketî yê vê daçekê jî di devoka Semsûrê de gelekî berbelav e.

vii. Bikaranîna bazindaçeka “bi.....de” yê;

Ev daçek wateya “li ser” û “navberê” dide hevokan. Ji hêla wateyê ve wekî kurmancîya standart e. Li Semsûrê meyla pêşdaçekê (bi) li ser ketinê ye. Tenê di yek nimûneyê (83-a) de pêşdaçek hat dîtin, ji yê din de pêşdaçek nîne. Paşdaçek jî di mînakên teva de rastî guherîneke dengî hatîye û “e” ya paşdaçekê bûye “a”.

viii. Bikaranîna bazindaçeka “bi.....re” yê;

Ev daçek wateyên wek “hevrebûn”, “bi rêya tiştêkî” û “navberê” dide hevokan. Ji hêla wateyê ve wekî kurmancîya standart e. Li Semsûrê meyla pêşdaçekê (bi) li ser ketinê ye. Tenê di yek nimûneyê (84-d) de pêşdaçek hat dîtin, ji yê din de pêşdaçek nîne. Paşdaçek jî di mînakên teva de rastî guherîneke dengî hatîye û “e” ya paşdaçekê bûye “a”.

ix. Bikaranîna bazindaçeka “bi.....ve” yê;

Ev daçek wateya “li ser” û “navberê” dide hevokan. Ji hêla wateyê ve wekî kurmancîya standart e. Li Semsûrê meyla pêşdaçekê (bi) li ser ketinê ye. Di hin nimûneyan (85c-e) de pêşdaçek hat dîtin, ji yê din de pêşdaçek nîne. Paşdaçek jî di mînakên teva de rastî guherîneke dengî hatîye û “e” ya paşdaçekê bûye “a”.

b) Daçeka Xwerû “di”;

Xalên hevpar û cuda yên daçeka xwerû “di” yê di navbera kurmancîya standart û devoka Semsûrê de ev in;

i. Daçeka xwerû “di” di peywira wesfandin û lêkdanê de;

Di çarçoveya vê xebatê de em mînakên ku daçeka xwerû “di” bi vê peywirê radibe rast nehatin.

ii. Di wateya “dinavdebûn” û “liserbûnê” de;

Ev daçek di devoka Semsûrê de jî wekî kurmancîya standart wateya “liserbûn” û “dinavdebûnê” dide hevokan. Ango ji hêla wateyê ve cudahî nîne. Lê belê di devoka Semsûrê de di axaftinên rojane de carinan “di” nayê bikaranîn. Hewce ye bê gotin ku ew awa ne pir berbelav e.

iii. Bikaranîna bazindaçeka xwerû “di....de” yê;

Ev bazindaçeka xwerû di devoka Semsûrê de jî wekî kurmancîya standart wateyên wek “têdebûnê” û “demê” dide hevokan. Lê belê ji xeynî du mînakên (87a-87g) tê dîtin ku pêşdaçek (di) –nehatîye gotin- ketîye. Dikare bê gotin ku meyla pêşdaçekê li ser ketinê ye, paşdaçek (de) jî rastî guherîneke dengî hatîye û “e” ya paşdaçekê bûye “a”.

iv. Bikaranîna bazindaçeka xwerû “di...re” yê;

Ev bazindaçeka xwerû di devoka Semsûrê de jî wekî kurmancîya standart wateyên wek “têdebûnê” û “demê” dide hevokan. Lê belê di hin mînakên (88a-c-d) de tê dîtin ku pêşdaçek (di) ketîye –nehatîye gotin- paşdaçek (re) jî rastî guherîneke dengî hatîye û “e” ya paşdaçekê bûye “a”.

d) Daçeka Xwerû “Ji” ;

Xalên hevpar û cuda yên daçeka xwerû “ji” yê di navbera kurmancîya standart û devoka Semsûrê de ev in;

i. Bikaranîna daçeka “ji” yê ya bi tenê;

Di devoka Semsûrê de daçeka xwerû “ji” nayê bikaranîn. Di dewsa “ji” yê de daçeka xwerû “li” tê bikaranîn. Wateyên wek “jêçebûn”, “jêderketin” û “berpêbûnê” bi daçeka “li” yê tên bidestxistin.

ii. Bikaranîna bazindaçeka xwerû “ji...re” yê ;

Wekî kurmancîya standart di devoka Semsûrê de jî ew daçek wateyên wek “berpêbûn”, “armanc”, “karê ku tê kirin” û “arastekirina gotinê ji bo yekî” dide hevokan. Lê belê di devoka Semsûrê de pêşdaçek gelek caran dikeve û paşdaçek (re) jî rastî guherîneke dengî tê, “e” ya paşdaçekê dibe “a”. Di devoka Semsûrê de kêman caran rastî mînakên (90-b) ku pêşdaçek di cihê xwe de ye jî tê dîtin. Hewce ye bê gotin ku di bikaranîna bi vî awayî de pêşdaçeka ku tê dîtin jî “li” ye, ne “ji” ye.

iii. Bikaranîna bazindaçeka xwerû “ji...de” yê;

Ev daçek di devoka Semsûrê de jî wateya “destpêkirina cih û hêla tevgerê” dide hevokan. Di çarçoveya mînakên (91a-d) de tê dîtin ku pêşdaçek (ji) hertim ketîye û ji ber guherîna dengî paşdaçek (de) bûye “da”.

iv. Bikaranîna bazindaçeka xwerû “ji...ve” yê;

Daçeka “ji....de” yê di kurmancîya standart de wateyên wek “dem” û “wateya cih û hêla ku bûyer dest pê dike û dewam dike” dide hevokan. Ji ber ku di devoka Semsûrê de daçeka “ji” yê nîne ew daçek wiha “li....ve” derdikeve pêşîya me û gelek caran pêşdaçek “li” dikeve. Ji hêla wateyê ve jî wekî kurmancîya standart wateyên wek “dem” û “wateya cih û hêla ku bûyer dest pê dike û dewam dike” dide hevokan.

e) Daçeka Xwerû “Li” ;

Daçeka xwerû “li” di kurmancîya standart de wateyên wek “têdebûn” û “berpêbûnê” dide hevokan û her û her bi tena serê xwe ango bêtir paşdaçek tê bikaranîn.

Ev daçek digel wateyên “têdebûn” û “berpêbûnê” wateyên wek “jêderketin”, “dem”, “destpêkirina cih û hêla tevgerê”, “armanc”, û “karê ku tê kirin” dide hevokan. Ji hêla bikaranînê ve jî berevajî kurmancîya standart hem bi tenê hem jî bi paşdaçekan re tê bikaranîn.

4.2. Daçekên Navî

Daçekên navî ku herî zêde tên bikaranîn û berawirdkirina wan li jêr hatîye dîyarîkirin.

- i. **Ba;** Ev daçeka navî di devoka Semsûrê de jî wekî kurmancîya standart wateya “licembûnê” dide hevokan.
- ii. **Bal;** Ev daçek di devoka Semsûrê de nayê bikaranîn.
- iii. **Bin;** Ev daçek di kurmancîya standart de wateyên wek “binbûnê” û “jêrbûnê” dide hevokê û di devoka Semsûrê de jî bi heman wateyî radibe.
- iv. **Cem;** Daçeka navî “cem” di devoka Semsûrê de wekî kurmancîya standart wateyên nêzî daçekên “ba” û “bal” ê dide hevokan. Digel vê yekê bi awayekî berbelav tê bikaranîn.
- v. **Dû;** Daçeka “dû” yê di devoka Semsûrê de jî wekî kurmancîya standart ji hêla cih û hêlê ve wateya “paş” û “pişt” ê dide hevokan.
- vi. **Heta;** Daçeka “heta” yê wekî kurmancîya standart di devoka Semsûrê de jî ji hêla demê ve wateya “sînore rûdanê” nîşan dide. Her wekî ku ji mînakên (98) jî dîyar e di devoka Semsûrê de forma daçeka “heta” yê “ta” nayê bikaranîn.
- vii. **Paş;** Daçeka “paş” ê di kurmancîya standart de “cih û alîyê kes an tiştan yê paş” dîyar dike. Ev daçek di devoka Semsûrê de jî her wekî ku ji mînakên (99) jî dîyar e heman wateyê dide hevokan.
- viii. **Pêy;** Daçeka “pêy”ê ku di kurmancîya standart de wateya “berdewema rûdanê” dide hevokan. Ev daçek di devoka Semsûrê de jî heman wateyê dide hevokan. Ev daçek di kurmancîya standart de bi forma “pey”ê jî tê dîtin. Lê belê di devoka Semsûrê de forma “pey” ê nayê bikaranîn û “y” ya dawîya “pêy”ê dikeve bi forma “pê” yê tê bikaranîn.
- ix. **Pêş;** Daçeka “pêş” di kurmancîya standart de wateya “cih û hêla pêş” ya tiştan an jî kesan nîşan dide. Ev daçek di devoka Semsûrê de jî bi heman wateyî radibe.
- x. **Rû;** Ev daçek di kurmancîya standart de ji bo nîşandana rûyê amûr, alav...hwd tê bikaranîn. Digel vê wateyên wek, “cem, ba, bal, hember û nik” ê jî dide. Ev daçek di devoka Semsûrê de jî heman wateyan dide hevokan. Di axaftinên rojane de bi awayekî berbelav tê bikaranîn

xi. Ser; Ev daçek di kurmancîya standart de wateya “bilindîyê”, “bilindbûnê” û “lêzêdekirinê” dide hevokan. Ev daçek di devoka Semsûrê de jî heman wateyan dide hevokan.

xii. Hember; Ev daçek di kurmancîya standart de ji bo cih û tiştan wateya “ceber”ê û “rûqal”ê dide. Ev daçek di devoka Semsûrê de jî heman wateyan dide hevokan.

xiii. Pêşber; Ev daçek di kurmancîya standart de wateya daçeka “hember”ê dide hevokan. Di devoka Semsûrê de ev daçek nayê bikaranîn.

xiv. Wekî; Ev daçek di kurmancîya standart de wateya “şibandinê” dide hevokan. Ev şibandin hem ji hêla erênî hem jî hêla neyînî ve ye. Lê belê di devoka Semsûrê de ev daçek bêtir ji bo şibandina neyînî tê bikaranîn.

xv. Nola, Fena û Mîna; Ev her sê daçek jî di kurmancîya standart de wateya “şibandinê” didin hevokan. Ji hêla wateyê ve bikaranîna van daçekan ya di devoka Semsûrê de wekî ya standart e. Lê belê di devoka Semsûrê de daçeka “mîna” yê pir berbelav e û daçekên “nola” û “fena” yê jî nayên bikaranîn.

xvi. Ber; Ev daçek di devoka Semsûrê de jî wekî bikaranîna kurmancîya standart wateya “pêşîya cih, der an tişteki” dide hevokan.

xvii. Nav; Ev daçek di devoka Semsûrê de jî wekî bikaranîna kurmancîya standart wateya ““di nav de bûnê”” dide hevokan.

4.3. Daçekên Hevdudanî

Taybetîyên daçekên hevdudanî, xalên hevpar û cuda bi kurmancîya standart re di bin du serenavan de li jêr hatine vegotin.

4.3.1. Daçekên Hevdudanî yên Koma Yekem

a) Daçekên Hevdudanî ku bi Daçeka Bi û Daçekên Navî Çêdibin;

Di kurmancîya standart de ev daçek dema ku daçeka xwerû “bi” û daçekeke navî tên gel hev çêdibin. Di devoka Semsûrê de jî bi vî awayî çêdibin. Ji hêla wateyê ve tu cudahî di navbera bikaranîna devoka Semsûrê û kurmancîya standart de nîne. Tenê di devoka Semsûrê de hin caran daçeka xwerû dikeve.

b) Daçekên Hevdudanî ku bi Daçeka Di û Daçekên Navî Çêdibin;

Di çarçoveya vê xebatê de em li vê cureya daçekan rast nehatin.

c) Daçekên Hevdudanî ku bi Daçeka Ji û Daçekên Navî Çêdibin;

Di kurmancîya standart de ev daçek bi daçeka xwerû “ji” yê çêdibin, lê belê di devoka Semsûrê de ev daçek bi daçeka xwerû “li” û bi daçekên navî çêdibin. Wateya ku daçeka xwerû “ji” dide hevokê li Semsûrê daçeka xwerû “li” dide hevokê. Ev daçek di her du bikaranînan de jî wateyên wek “jêderketin” û “jêbûnê” dide hevokan.

f) Daçekên Hevdudanî ku bi Daçeka Li û Daçekên Navî Çêdibin;

Ev daçek di van mînakên (111) de wateyên wek “lêbûna cihekî” dide hevokan. Ji hêla wateyê û ji hêla cihê bikaranînê ve tu cudahî di navbera bikaranîna van daçekan di devoka Semsûrê û kurmancîya standart de nîne.

4.3.2. Daçekên Hevdudanî yên Koma Duyem

Di vê beşa daçekan de di devoka Semsûrê de meyla pêşdaçekê li ser ketinê ye û di paşdaçekê de jî guherînen dengî çêdibin. Alîyên hevpar û cuda yên vê beşa daçekan bi kurmancîya standart re bi gelemperî li jêr di bin çar binbeşan de hatine vegotin.

a) Daçekên Hevdudanî ku bi Bazindaçekên Bi yê Çêdibin;

i. Bikaranîna bazindaçeka “bi....de” yê bi daçekên navî re;

Ev daçek ji hêla wateyê ve wekî kurmancîya standart tê bikaranîn. Di bikaranîna vê daçekê de li devoka Semsûrê pêşdaçek (bi) ketîye daçeka navî xwe parastîye û paşdaçek (de) jî rastî guherîneke dengî hatîye û bûye “da”. Lê belê ketina pêşdaçekê û guherîna paşdaçekê ya dengî ji hêla wateyê ve tu guhertin di hevokan de çênekirîye.

ii. Bikaranîna bazindaçeka “bi....re” yê bi daçekên navî re;

Ev daçek ji hêla wateyê ve di devoka Semsûrê de jî wekî kurmancîya standart tê bikaranîn. Di bikaranîna vê daçekê de di devoka Semsûrê de pêşdaçek (bi) ketîye daçeka navî xwe parastîye û paşdaçek (re) jî rastî guherîneke dengî hatîye û bûye “ra”. Lê belê ketina pêşdaçekê û guherîna paşdaçekê ya dengî ji hêla wateyê ve tu guhertin di hevokan de çênekirîye.

iii. Bikaranîna bazindaçekê “bi....ve” yê bi daçekên navî re;

Ev daçek ji hêla wateyê ve wekî kurmancîya standart tê bikaranîn. Di bikaranîna vê daçekê de di devoka Semsûrê de pêşdaçek (bi) ketîye daçekê navî xwe parastîye û paşdaçek (ve) jî rastî guherîneke dengî hatîye û bûye “va”. Lê belê ketina pêşdaçekê û guherîna paşdaçekê ya dengî ji hêla wateyê ve tu guhertin di hevokan de çênekirîye.

b) Daçekên Hevdudanî ku bi Bazindaçekên Di yê Çêdibin;

i. Bikaranîna bazindaçekê “di....de” yê bi daçekên navî re;

Dema ku ew daçek ji hêla wateyê ve bê berawirdkirin dê bê dîtî ku tu cudahî di navbera devoka Semsûrê û kurmancîya standart de nîne. Lê belê dema ku mirov bala xwe dide mînakên (115) dibîne ku gelek caran pêşdaçek (bi) dikeve, di paşdaçekê de jî guherîneke dengî çêdibe û paşdaçek dibe “da”.

ii. Bikaranîna bazindaçekê “di....re” yê bi daçekên navî re;

Wekî bikaranîna daçekê ku bi “di....de” yê çêdibin di vê cureyê daçekan de jî ji hêla wateyê ve tu cudahî di navbera kurmancîya standart û devoka Semsûrê de nîne. Tiştên cuda ew in ku; di temamê mînakên de tê dîtî ku pêşdaçek (di) ketîye û di paşdaçekê (re) de guherîneke dengî çêbûye û paşdaçek bûye “ra”.

c) Daçekên Hevdudanî ku bi Bazindaçekên Ji yê Çêdibin;

i. Bikaranîna bazindaçekê “ji....de” yê bi daçekên navî re;

Ji hêla wateyê ve wekî kurmancîya standart tê bikaranîn. Lê belê di devoka Semsûrê de ji dewsa “ji” yê “li” tê bikaranîn û ew jî gelek caran dikeve. Paşdaçek jî rastî guherîneke dengî tê paşdaçek dibe “da”.

ii. Bikaranîna bazindaçekê “ji....re” yê bi daçekên navî re;

Ji hêla wateyê ve wekî kurmancîya standart tê bikaranîn. Lê belê di devoka Semsûrê de ji dewsa “ji” yê “li” tê bikaranîn û ew jî gelek caran dikeve. Paşdaçek jî rastî guherîneke dengî tê paşdaçek dibe “ra”.

iii. Bikaranîna bazindaçekê “ji....ve” yê bi daçekên navî re;

Ji hêla wateyê ve wekî kurmancîya standart tê bikaranîn. Lê belê di devoka Semsûrê de ji dewsa “ji” yê “li” tê bikaranîn û ew jî gelek caran dikeve. Paşdaçek jî rastî guherîneke dengî tê paşdaçek dibe “va”.

4.4. Daçek û Tewang

Daçek bandorê li peyvên pişt xwe dikin. Her peyva mê ku pişt daçekê tê hem di kurmancîya standart de hem jî di devoka Semsûrê de ditewe. Peyvên nêr di kurmancîya standart de gireyên tewangê digirin. Lê belê di devoka Semsûrê de peyvên nêr tu caran gireyên tewangê nagirin. Heke ku di peyva nêr de dengên “a” û “e” yek an jî her du hebin wê demê guherîn di hundirê peyvê de çêdibe. Gava ku ji wan her du dengên yek hebe ew deng dibe “ê”, gava ku ew deng ji carê bêtir di peyvê de hebe dengê kêteya ewil ya peyvê di hundir de diguhere û dibe “ê”.

4.5. Daçek di Çêkirina Peyvan de

Wekî kurmancîya standart di devoa Semsûrê de jî daçek bi çêkirina cureyên peyvan yên wekî lêker, cihnav, rengdêr, gihanek û hokeran radibe. Li jêr taybetîyên daçekan yên bi vî rengî hatîne destnîşankirin.

4.5.1. Daçek di Çêkirina Navdêran de

Bi gelemperî daçek di kurmancî de wekî gireyên çêker gelekî çalak in. Bi her daçeka xwerû û daçeka neyînî (bê) gelek peyvên tîn çêkin. Di devoka Semsûrê de ji bilî daçeka xwerû “ji” yê daçekên din gelekî çalak in; lê belê bi “ji” yê tenê navdêrên “şerjêkirin” û “jêkirin”ê hene. Wekî din bi daçeka “ji” yê navdêrên ku tîn çêkin nayên dîtin.

4.5.2. Daçek Di Çêkirina Lêkeran de

Di devoka Semsûrê de jî wekî kurmancîya standart daçek bi çêkirina lêkerên hevdudanî radibin. Taybetîyên vê bikaranîna daçekan li jêr hatine vegotin.

a- Daçek di Çêkirina Lêkerên Hevdudanî de

Daçekên xwerû “bi”, “di” û “li” wekî kurmancîya standart tîn bikaranîn. Bi “ji” yê ji xeynî lêkera “şerjêkirin” û “jêkirin”ê lêker nayên çêkirin.

Di çêkirina lêkerên biwêjî de daçekên xwerû “bi”, “di” û “li” wekî kurmancîya standart tîn bikaranîn. Lê belê di çarçoveya vê xebatê de lêkerên biwêjî ku bi “ji” yê çêdibin nehatin dîtin.

4.5.3. Daçek di Çêkirina Cihnavan de

Daçek di devoka Semsûrê de di çêkirina hin cihnavan de gelekî çalak e, lê belê hin cihnavên ku bi daçekan hatine çêkirin di devoka Semsûrê de nayên dîtin. Li jêr bi awayekî berfireh ev mijar hatîye vegotin.

a- Cihnavên Lihevxiştî bi Cihnava Berbihevîn

- i. **Jev;** Berevajî kurmancîya standart ev cihnav di devoka Semsûrê de nayê bikaranîn.
- ii. **Pev;** Ev cihnav di devoka Semsûrê de bi forma “peva” yê tê bikaranîn.
- iii. **Lev;** Ev cihnav di devoka Semsûrê de nayê bikaranîn.
- iv. **Tev;** Cihnava “tev” di devoka Semsûrê de wekî kurmancîya standart tê bikaranîn.
- iv. **Jêk, pêk û têk;** Ev cihnav di devoka Semsûrê de nayên bikaranîn.

b- Cihnavên Lihevxiştî bi Daçekan û Cihnava “ê”

- i. **Pê;** Ev cihnav di devoka Semsûrê de jî wekî kurmancîya standart tê bikaranîn.
- ii. **Lê;** Ev cihnav di devoka Semsûrê de jî wekî kurmancîya standart tê bikaranîn.
- iii. **Tê;** Ev cihnav di devoka Semsûrê de jî wekî kurmancîya standart tê bikaranîn.
- iv. **Jê;** Ev cihnav di kurmancîya standart de bi awayekî çalak tê bikaranîn. di devoka Semsûrê de ev cihnav tenê di bêjeya “şerjêkirin” û “jêkirin”ê de tê dîtin. Ji bilî vê mînakê mînakek din nîne. Heke ku pêwîst bi cihnava “jê” yê hebe di dewsa “jê” yê de “lê” tê bikaranîn.

4.5.4. Daçek di Çêkirina Rengdêran de

Di devoka Semsûrê de ji bilî daçeka “ji” yê daçekên din yên xwerû wekî kurmancîya standart bi awayekî berfireh tên bikaranîn; lêbelê di devoka Semsûrê de bi “ji” yê rengdêr tune ne.

4.5.6. Daçek di Çêkirina Gihanekan de

i. **Ji lew re;** Ev gihanek wekî kurmancîya standart di devoka Semsûrê de jî dikeve navbera hevokan û sedema bûyerê dîyar dike. Formên vê gîhanekê yên wekî “ji lew re”, “lewra”, “lewre” û “lew”ê di devoka Semsûrê de tune ne. Ev gihanek di devoka Semsûrê de bi forma “loma”yê tê bikaranîn.

ii. **Ji bo;** Ev gihanek di devoka Semsûrê de jî wekî Kurmancîya standart ji hêla armanc û sedemê ve hevokan bi hevve girê dide û carinan jî dikeve navbera cihnavan. Di devoka Semsûrê de “ji” dikeve û formên wek “bo”, “boy”, “bona” û “boyî” tên bikaranîn.

iii. **Ji ber;** Di çarçoveya vê xebatê de di çîrokên li ber destê me û di sitran û axaftinên rojane de em rastî vê gihaneka “ji ber” ê nehatin.

iv. **Bi ser de;** Ev daçek di devoka Semsûrê de jî wekî kurmancîya standart heman wateyan dide hevokê û hevokan bi hev ve girê dide. Tenê cudahî ew e ku di devoka Semsûrê de gelek caran “bi” dikeve û “de” her tim dibe “da”. Ev gihanek digel gihaneka “jî” yê tê bikaranîn.

v. **Digel;** Ev gihaneka ku ji “di” û “gel” ê çêbûye di çarçoveya vê xebatê de rastî gihaneka “digel”ê nehatin. Ev daçek di zimanê rojane de jî deverên ku li ser xebat hatî kirin qet nayê bikaranîn.

4.5.7. Daçek di Çêkirina Hokeran de

Di kurmancîya standart de daçek di çêkirina gihanekan de gelekî çalak in. Him pêşdaçek him jî bazindaçek gihanelan çêdikin. Ev rewş di devoka Semsûrê de jî wiha ye. Lê belê di devoka semsûrê de dema ku bazin daçek di hokeran de cuh digirin tê dîtîn ku pêşdaçek dikeve û “e” ya paşdaçekan jî dibe “a”.

ENCAM

Di vê xebatê de hatiye dîtin ku di hinek daçekan de bikaranîn ji bikaranîna kurmancîya standart cihêwaztir e.

Rewşa bikaranîna daçekên xwerû di çarçoveya mînakên wiha ye:

Daçeka “bi” yê:

- Di bikaranîna alav û amûran de carinan wek “pê” tê bikaranîn
- Di navbera hejmar û cotepeyvan de carinan tê bikaranîn û carinan jî nayê bikaranîn.

Dema ku “bi” bi paşdaçekên xwerû yên wek “de”, “re” û “ve” yê ve tê bikaranîn tê dîtin ku bê îstîsna paşdaçek rastî guherîneke dengî tên û dibin “da”, “ra” û “va”. Di bazindaçekê de jî pêşdaçek di meyla ketinê de ye û di çarçoveya mînakên de tê dîtin ku pêşdaçek (bi) gelek caran ketîye û nehatîye gotin.

Daçeka “di” yê:

- Di peywira wesfandin û lêkdanê de nayê bikaranîn.
- Di wateya liserbûn û têdebûnê de tê bikaranîn.
- Di bazindaçekan de pêşdaçek (di) gelek caran dikeve û paşdaçek (de, re) rastî guherîneke dengî tên û dibin “da” û “ra”.

Daçeka “ji” yê

-Daçeka “ji” yê di devoka Semsûrê de bi rola xwe ya daçekî nîne û nayê bikaranîn. Ji bo ku bi peywirên daçeka “ji” yê rabe û wateyên wek jêderketin, jêçêbûn ...hwd ku daçeka “ji” yê dide bîrê bidestxistin daçeka “li” yê tê bikaranîn. Yanî her cihê ku pêwistî bi daçeka “ji” yê çêdibe daçeka xwerû “li” tê bikaranîn.

- Di sa di çarçoveya bazindaçekên xwerû ku bi “ji” yê çêdibin di çarçoveya mînakên de hatîye dîtin ku gelek caran pêşdaçek (ji) nayê bikaranîn. Heke ku bê bikaranîn jî, ji dewsa “ji” yê daçeka xwerû “li” tê bikaranîn. Di bikaranîna vê bazindaçekê de pêşdaçek (ji) gelek caran dikeve û paşdaçek (de, re, ve) rastî guherîneke dengî tê û dibe “da”, “ra”, “va”.

Daçeka “li” yê:

-Daçeka “li” yê her wekî ku li jor hatîye vegotin hem fonksîyona “ji” yê hem jî fonksîyona “li” yê tîne pê. Di fonksîyana xwe de tu guherîn ji hêla bikaranîn û wateyê ve di navbera bikaranîna vê daçekê di devoka Semsûrê û kurmancîya standart de nîne. Lê belê dema ku fonksîyana “ji” yê bi cih tîne bi paşdaçekan re jî tê bikaranîn.

Daçekên navî:

-Di devoka Semsûrê de ev daçekên navî: “ba, bin, cem, dû, pêş, rû, ser, hember, ber û nav” wekî bikaranîna standart tên bikaranîn.

-Daçake navî “bal”, di devoka Semsûrê de nîne dewsa wê “ba” tê bikaranîn.

- Daçekaên navî “pêşber, nola û fena” di devoka Semsûrê de nayên bikaranîn.

-Ji dewsa “nola û fena” yê daçeka “mîna” yê tê bikaranîn.

-Daçeka “wekî” yê pir caran ji bo şibandinên tiştên xirab tê bikaranîn.

-Daçeka “pey”ê wekî forma “pê” tê bikaranîn.

-Forama daçeka “heta” yê “ta” nayê bikaranîn.

Daçekên hevdudanî yên koma yekem:

-Di devoka Semsûrê de jî ev daçek bi awayekî çalak tên dîtin. Di vê beşa daçekan dê ketina daçeka xwerû (bi, ji, li) dikare bê gotin ku di asta îstîsnayê de ye. Lê belê di vê beşa daçeka de jî di çêkirina bazindaçekan de dewsa daçeka xwerû “ji” yê daçeka xwerû “li” tê bikaranîn.

- Di vê xebatê de em rastî daçekên hevdudanî yên koma yekem ku bi daçeka xwerû “di” û bi daçekên navî çêdibin nehatin.

Daçekên hevdudanî yên koma duyem:

Daçekên hevdudanî yên ku bi bazindaçekên “bi....de/re/ve” yê çêdibin:

-Di mînakên vî cûreyî bazindaçekan de hatîye dîtin ku gelek caran pêşdaçek (bi) nehatîye gotin û meyla pêşdaçekê li ser ketinê ye, paşdaçek jî rastî guherîneke dengî hatîye û paşdaçek (de, re, ve) bûne “da, ra, va”.

- Dîsa di çarçoveya mînanan de hatîye dîtîn ku di vî cureyî daçekan de ji hêla wateyê ve tu cudahî di navbera devoka Semsûrê û kurmancîya standart de nîne.

Daçekên hevdudanî yên ku bi bazindaçekên “di....de/re” yê çêdibin:

- Di mînakên vî cureyî bazindaçekan de hatîye dîtîn ku gelek caran pêşdaçek (di) nehatîye gotin û meyla pêşdaçekê li ser ketinê ye, paşdaçek jî rastî guherîneke dengî hatîye û paşdaçek (de, re) bûne “da” û “ra”.

-Di van mînanan de daçek ji hêla wateyê ve wekî kurmancîya standart hatine bikaranîn.

Daçekên hevdudanî yên ku bi bazindaçekên “ji....de/re/ve” yê çêdibin:

-Di van daçekên hevdudanî de bê îstîsna di hemû mînanan de pêşdaçek (ji) ketîye û paşdaçek jî rastî guherîneke dengî hatîye û paşdaçek (de, re, ve) bûne “da” “ra” û “va”.

-Wekî bazindaçekên din di van mînanan de jî ji hêla wateyê ve tu cudahî di navbera devoka Semsûrê û kurmancîya standart de nîne.

Daçek û tewang:

-Di mijara daçek û tewangê de, her peyva mê ku ji pişt daçekê hatîye bi gireyên tewangê hatine tewandin.

-Dema ku peyva nêr ji pêş daçekê tê, ku di peyvê de tîpên “a” û “e” yê hebin ew peyv di hundir de ditewe û ew tîp dibin “ê” heke ku ji wan tîpan her du an jî yek tune be ew peyv natewe.

Di çêkirina peyvên de daçek:

Di çêkirina navdêr û rengdêran de:

-Daçek wekî gireyên çêker di çêkirina navdêr û rengdêran de gelekî çalak in. Ji bilî daçeka “ji” yê bi her daçeka xwerû û daçeka navî di devoka Semsûrê de navdêr û rengdêr dikarin bîn çêkirin. Daçeka “ji” yê jî tenê di peyva “şerjêkirin”ê de bi awayê cihêna lihevxiştî dertê ji bilî vê mînakê tu derên din “ji” nayê dîtîn.

Di çêkirina lêkeran de:

-Hem di çêkirina lêkerên hevdudanî hem jî çêkirina lêkerên biwêjî de daçek cî digirin. Ev yek di mînan de xuya dike. Lê belê bi daçeka xwerû “ji” yê tenê “şerjêkirin” û “jêkirin” çêdibê, ji bilî van her du mînan tu lêkerên din ku bi “ji” yê çêdibin di devoka Semsûrê de nîn in.

Di çêkirina cihnavan de:

-Cihnav lihevxiştî bi cihnav berbihewîn: di çarçoveya mînan de em rastî cihnavên “jev, lev, jêk, pêk û têk” ê nehatin. Di vê beşa cihnavan de tenê “pev” û “tev” tên dîtin.

-Cihnavên li hevxiştî yên bi daçekan û cihnav “ê” yê: di çarçoveya mînan de hatîye dîtin ku “pê”, “tê” û “lê” ba awayekî xurt tên bikaranîn û “ji” jî tenê di peyva “şerjêkirinê” de heye. Di devoka Semsûrê de cihê ku “jê” pêwîst be dewsa “jê” yê “lê” tê bikaranîn.

Di çêkirina gihanekan de:

-Gihaneka “ji ber” û “digel” ê di devoka Semsûrê de nayê bikaranîn.

-Gihaneka “ji lew re” yê di devoka Semsûrê de ketîye forma “loma” yê û bi vê formê gelekî berbelav e.

-Gihaneka “ji bo” yê bi formên “boy”, “boyî” û “bona” tê bikaranîn.

-Di gihaneka “bi ser de” yê de jî hêmana pêşdaçekî “bi” dikeve û paşdaçek (de) dibe “da”. Digel vê guherînê ev gihanek di mînan de tê dîtin ku hertim bi gihaneka “jî” yê re hatîye bikaranîn.

Di çêkirina hokeran de:

-Heke ku hoker bi bazindaçekê çêbibe, pêşdaçek dikeve û “e” ya paşdaçekê jî dibe “a”.

Bi giştî dikare bê gotin ku wekî kurmancî di devoka Semsûrê de jî daçek gelekî çalak in û bi gelek peywiran radibin. Mirov dikare bibêje ku di devoka Semsûrê de di bazindaçekan de meyla pêşdaçekê li ser ketinê ye û “e” ya paşdaçekê jî her tim dibe “a”. Ji bilî daçeka navî “wek” ê ji hêla wateya daçekan ve tu cudahî di navbera devoka

Semsûrê û kurmancîya standart de nîne. Daçeka xwerû “li” him bi peywira xwe him jî bi peywira “ji” yê radibe.

Daçek di nav mijarên rêzimên de cihekî girîng digirin. Di kurmancî de daçek gelekî çalak in. Digel erka xwe yî ya têkildarkirinê bi çêkirina peyvên jî radibin. Her çend ku di pirtûkên rêzimên de qala daçekan hatibe kirin jî bi awayekî berfireh li ser tevahî devokên kurmancî xebat nehatine kirin. Ji bo ku daçek ji her alî ve bîr analîzkirin û nîqaşkirin lazim e xebatên dîtir li ser daçekan bîr kirin. Ev xebat bi armanca ku rewşa daçekan ya li vê heremê jî bê tespîtkirin û li ser daçekan qeîdeyên gelemperî bîr vegotin, hatîye amadekirin.



ÇAVKANÎ

Adak, A. (2014). *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk*. (Çapa 2.). İstanbul: Nûbihar.

Adak, A. (2016). *Kürtler Dil ve Edb. Maddesi*. Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi. Ek 2 Kâfûr, Ebûl'l- Misk-Züreyk, Kostantin. İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı Yayın Matbaacılık ve Ticaret İşletmesi.

Akdag, Z. (2017). *Dewlemendîyeke Zimanê Kurdî: Devoka Semsûrê*. Zend. Hejmar 3. r: 105-108.

Akar, M. (2000). *İnsanlığın Kültür Mirası Adıyaman*, Stenbol: Weşanên Perîyê.

Arî, A. (2006). *Eroûtîka*. Diyarbakır: Weşanên Lîsê.

Baran, B. (2012). *Rêzimana Kurmancî*. (Çapa 1.). Diyarbakır: Weşanên Belkîyê.

Baran, B. (2018). *Rêzimana Kurmancî*. (Çapa 2.). Diyarbakır: Weşanên Wardozê.

Balî, A. (1992). *Kürtçe Dilbilgisi/Rêzimana Kurdî*. İstanbul: Alan Yayıncılık.

Bedirxan, C. & Lescot R. (2013). *Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî)*. İstanbul: Doz Yayıncılık.

Bedirxan, C. (2010). *Bingehên Gramera Kurdmancî*. (Çapa 1.). İstanbul: Avesta Basın Yayın.

Bedlîsî, Ş. (2012). *Şerefname (Dîroka Kurdistanê)*. İstanbul: Avesta Basın Yayın.

Cewerî, F. (2015). *Maria Meleke Bû*. İstanbul: Avesta Basın Yayın.

Ciwan, M. (1992). *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi*. Stockholm: Weşanên Jiyana Nû.

Çakar, Y. (2019). *Ev Rê Naçe Bihuştê*. Diyarbakır: Weşanên Lîsê.

- Çifçi, T. (2016). *Zevîya Ramûsanê*. İstanbul: Nûbihar.
- Dilken, W. (2016). *Stêrka Xuricî Ferêt*. İstanbul: Peywend.
- Doğan, H. (2012). *Adıyaman Tarihi ve Kültürü Üzerine*. Konya: Kömen Yayınları.
- Filîk, Ş. (2015). *Bêbavî*. İstanbul: Avesta Basın Yayın.
- Fossum, L. O. (1919). *A Practical Kurdish Grammar and Vocabulary*. Mineapolis: The İnter- Synodical Ev. Lutheran Orient Mission Society.
- Givon. T. (2011). *Syntax* . (Volume 1). Amsterdam/ Philadelphia: John Benjamins Publishing Company.
- Gündüz, D. (2013). *Kırmancca / Zazaca Dildersleri (Türkçe Açıklamalı Kürtçe)*. (Çapa 3.). İstanbul: Weşanxaneyi Vateyî / Vate Yayınevi.
- Hesen, Ş. (2008). *Payiz û Ba*. İstanbul: Avesta Basın Yayın.
- Husên, F. (2015). *Amîdabad*. İstanbul: Avesta Basın Yayın.
- Jiyan, R. (2016). *Spitama*. (Çapa 3.). Diyarbakır: Weşanên Belkîyê.
- Karaağaç, G. (2009). *Edat Üzerine Düşünceler*. Gazi Türkiyat Türkoloji Araştırmaları Dergisi. Hejmar 5, r:157-169.
- Karaağaç, G. (2013). *Anlam (Anlam Bilimi ve İletişim)*. İstanbul: Kesit Yayınları.
- Karabax, A. (2013). *Rêzimana Kurdî ya Kurmancî – bi hîndarî-* . Lozan. <https://www.yekitiyanks.com/2018/12/rezimana-kurdi-ya-kurmanci-abdullah.html>. Dîroka Daxistinê: 15/10/2018.
- Khalid, H. S. (2015). *Kurdish Dialect Continuum, As A Standardization Solution*. Kurdish Studies 1:1, r. 27-39.
- Kurdo, Q. (2013). *Rêzimana Kurdî Kumancî – Soranî*. Wer: Zülküf Ergün. İstanbul: Nûbihar.

Kurzon, D. & Adler, S. (2008) *Adpositions Pragmatic, semantic and syntactic perspectives*. John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia.

Laleş, L. (2011). *Matmayînên Ronyayê*. Diyarbakir: Lîs Basin- Yayin.

Malmîsanij, M. (2015). *Kurmancca ile Karşılaştırmalı Kirmancca (Zazaca) Dilbilgisi*. İstanbul: Weşanxaneyi Vateyî / Vate Yayınevi.

Metê, H. (2014). *Pêşîrên Dayê*. Stenbol: Weşanên Peywendê.

Metê, H.(2013). *Gotinên Gunehkar*. Stenbol: Weşanên Peywendê.

Methrie, R. (2000). *Regional dialectology*. In: R. Methrie, J. Swann, A. Deumert & W. L. Leap, eds. *Introducing sociolinguistics*. Edinburagh: Edunburagh University Press, r. 44-75.

Nemir, K. (2009). *Salname*. Lîs Basin- Yayin.

Oncu, M. (2017). *Şihîna Hespên Azad*. Van: Weşanên Sîtav.

Ozyurt, G. M. (2016). *Adpositions Derived From Nouns In Iranian Languages*. in J-FLTAL, cild 3. Hejmar 1.

Öpengin, R. & Haig, G. (2014). *Regional variation in Kurmanji: A preliminary classification of dialects*. Kurdish Studies 2:2, r.143-176.

Sadinî, M. X. (2013). *Feqiyê Teyran Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*. İstanbul: Nûbihar.

Silêvanî, S. (2011). *Meryema*. Ankara: Lîs Basin- Yayin.

Tait, M. (1994). *North America*. In: R. E. A. M. T. Christopher Moseley, ed. *Atlas of the World's Languages*. London and New York: Routledge, r. 3-30.

Taman, B. (2018). *Daçek di Zaravayê Kurmancî Da*. Teza Lîzansa Bilind Ya Çapnekîrî. Zanîngeka Mardin Artukluyê.

Tan, S. (2011). *Rêzimana Kurmancî*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Tan, S. (1996). *Lêhûrbûneke biçûk li ser devoka Semsûrê*. Kovara Zend. 3, r. 41-46.

Tan, S. (2018). *Du Xebatên Destpêkî Yê Bi Îngîlîzî Yê Rêzimana Kurmancî: Analîzeke Zimanzanî û Rêzimanî*. Teza Lîzansa Bilind Ya Çapnekîrî. Zanîngeha Mardin Artukluyê

Taş, Ç. (2013). *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*. Stenbol: Weşanên Dîwan.

Taştan, Z. (2013). *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Semsûrê De*. Projeya Lîsansa Bêtez ya Çapnekîrî. Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artukluyê. Enstîtuya Zimanên Zindî.

Tilermen Y. (2009). *Sêbareya Mêrdînê: Qerebafon*. İstanbul: Do Yayınları.

Veroj, S. (2014). *Hevberkirina Gramerê Zazakî û Kurmancî: Dîyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî*. Diyarbakır: Weşanên Ava.

War, R. (2013). *Qedrî Can - Serencam*. Ankara : Weşanên Ava.

Yağınlı, A. A. (2013). *Adıyaman Merkez Ağzı ve Kültürü*. Adıyaman: Matsis Yayınları.

Yıldırım, K. (2012). *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî Lehçesi)*. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.

Yûsiv, H. (2006). *Tîrsa bê Diran*. İstanbul: Avesta Basın Yayın.

Yûsiv, H. (2015). *99 Morîkên Belavbûyî*. İstanbul: Weşanên Peywendê.

Zeraq, D. (2009). *Çilkên Pênûsê*. Diyarbakır: Lîs Basın- Yayın.

Kesên Çavkanî

Çavkanîya Yekemîn; Hanım Esen, Kewanîya Malê, 72 salî, Nexwende, Gundê Ûmeran/ Kûmîr, 19/12/2018.

Çavkanîya Duyemîn; Yusuf Esen, Malnîşîn, 83 salî, Nexwende, Gundê Narincê/ Kûmîr, 12/12/2018.

Çavkanîya Sêyemîn; Şeyho Demir, Malnîşîn, 84 salî, Nexwende, Gundê Gewa, 27/11/2018.

Çavkanîya Çaremîn; İsmail Çok, Cotkar, 45 Salî, Dibistana Seretahî, Gundê Çûka /Geler, 15/11/2018.

Çavkanîya Pencemîn; Gafure Ulaş, Kewanîya Malê, 35 salî, Seretahî, Gundê Balixa / Geler, 19/11/2018.

Çavkanîya Şeşemîn; Mahmut Demir, Cotkar, 39 salî, Dibistana Navin, Gundê Gewa, 25/11/2018.

Çavkanîya Heftemîn; Yusuf Çil, Malnîşîn, 68 salî, Dibistana Navîn, Gundê Pewrika / Kûmîr, 06/12/2018 .

Çavkanîya Heştemîn; Songül Sevindi, Cotkar, 32 salî, Zanîngeh, Malê Kêvir /Geler, 12/01/2019.

Çavkanîya Nehemîn; Eyüp Subaşı, Xwendevan, 26 salî, Gundê Atmê / Aldûş, 12/10/2018.

Çavkanîya Dehemîn; Erdal Arslan, Cotkar, 37 salî, Dibistana Navîn, Malê Berdu /Kûmîr, 11/12/2018. .

Çavkanîya Yazdemîn; İbrahim Polattaş, Malnîşîn, 68 salî, Dibistana Navîn, Gundê Êmera/ Kûmîr, 01/01/2019.

Çavkanîya Duwazdemîn; Talip Esen, Cotkar, 40 salî, Dibistana Seretehî, Gundê Narincê/ Kûmîr, 15/02/2019.

Çavkanîya Sêzdemîn; Abdullah Özkan, Karmend, 33 salî, Zanîngeh, Gundê Qorîyê, 23/02/2018.

PÊVEK

Berî ku nimûneyên çîrokan bên dayîn li jêr lîsteya çîrokan û jêderên wan hatîye dîyarkirin. Ev kesên ku navên wan li jêr, him jêderên çîrokan in him jî hin hevokên van kesan ên axaftinên rojane wekî nimûne hatine bikaranîn.

Hanim Esen; Çîroka Hesnûnê, Hespî Bê û Baranê, Pincê, Pîr û Rêvî, Elik Fatik, Hewhenark û Hisikê Newêrek.

Gafure Ulaş; Çîroka Pîrê û Rêvî.

Eyüp Subaşı, Kerê Xwelîyê, Qeraşê Ber Aşan, Gurî.

Yusuf Esen; Çîroka Çil Heste.

Şeyho Demir; Çîroka Alî Beg.

Yusuf Çil; Çîroka Gundê Şawerdîya û ya Evdîlxirawê.

Mahmut Demir; Paşa û Wezîr.

Bi van kesên li jêr re di çarçoveya xebatê de tenê axaftin hatine kirin û hinek hevokên van kesên li jêr wekî nimûne di xebatê de hatine bikaranîn.

Abdullah Özkan, Talip Esen, İbrahim Polattaş, Erdal Arslan, Songül Sevindi û İsmail Çok.

Nimûneyên Çîrokan

Hesnûn

Çi hew, çi tinewû.

Carê Hesnûnik hewû. Gi diçûn ber dewarî xwa. Dewarî xwa berdidan, diçûn ber. Dilê gîya goşt xwast.

Go: “Heso ki ti mangê xwa şer jê kî, em ê goşt bikirîni buxunî ûw. Ûn ê him bi xwa jî lê têr buxin ûw em ê bikirîni ti jî pê mangex xwa bikirî”.

Go: “Diwe”.

Hesnûn îvarî hat mal. Bû rûya di.

Go: “ Jinik ez kî mangê şer jê kim. Gundîyê got mangê şer jê ke. Him ûnê bi xwa lê têr buxun him em jî gîyê bikirin, buxinî ûw. Ên ê hen mangêk xway di bikin.

Jinikê go: “Haydî, haydî”.

Siweda rawûn ban gundê xwa kirin. Manga xwa avitin erdê, şer jê kirin. Her ekî henî xwa bir ûw. Li wir henî xwa dan ser êr. Gîya lê têr xwarin. Hena goşt bir, hena newir. Goştê Hesnûnê di wir da ma.

-Law we çima ha kir, ûn çima bi mi kenîn, mi manga xwa şer jê kir?

- Law me lê têr xwar bes e îşte Heso!

Go: “Temam.”

Goştê xwa henî xwa xwarin, henî xwa kirin qarme, hen gundê xwa xwar ûw. Siwe da.

Go: “ Jinik tu wî postî ûne ke bem bajêr bifroşim.”

Çû post lê ra anî. Hesnûnê ralişt postê xwa ba kir, daket binîyê gund. Ba kir, ba kir. Çû bi paş dirîyekê ket. Kaş kir, kaş kir hel newû.

-Vî mêratî çima ha kir? Vê mêratê boça xwa avit paş diri bernade. Ti yawiş kerê, ez ê herim mal. Têvir ûnim dirîyê helkim. Hat mal.

Go: “ Hele jinik têvir mi de.”

- Ti kî çirkî?

-Mangê boçika xwa avit paş dirîyê li derê han. Dimire lê nawe. Bernade. Hem dirîyê hel kim sewê ki berde.

Hat dirîya xwa hel kir. Ceq ceq lê xist. Ha kûpik zêr bi der neket. Kûpik zêr derket. Postê xwa li wir hişt. Ralişt kûpê xwayî zêra anî hat. Anî hat mal.

-Lo Heso te va kûpî zêra ku anî?

-Mi bir çû, post bi zêr da e hatim. Jinik here qînatê mala axê ûne kem bipîvînî. Ka çî qes in?

Jinik çû mala axê.

Go: “Qinatê bi mi din.”

-Ûnê çir kin?

-Em pê zêra bipîvin. Ka çi qes in?

-Zêrê çi ne?

-Hesnûnê postê mangê bir firot. Bi zêr da.

Mala axê xwa ra gotin qey deriva dikin. Zêrê li ku ne? Qinat danê. Qinat anîn hatin. Zêrê xwa pîvan. Cengik kirin binî qinatê.

Go: “ Jinik vana jî bere here mala axê de.”

-Law va çi zêr wûn.

-Heso te zêr li ku anîn?

-Law ûn nizanin. Mi post bir çû firot bi zêr da. Mangek tenêw, pir bûna, min ê hîn çar cara vî çind zêr bianîna.

-Lê em çir kinî?

-Gi dewarî xwa şer jê kin. Postî xwa ben hen bajêr, bi zêr bidin, ûnin werin.

Vana filîtinê dewarê xwa gi şer jê kirin. Ê qeret hîn zû şer jê kirin. Kun ket siwê, neketê gî çûn bajêr.

-Post ha! Post ha! Goşt ha!.

Çex kirin, dor kirin. Kî ki goşt bikire, kî ki post bikire.

- Welehîn Hesnûnê îşkî gir kir serî me.

Hatin mal.

Go: “Em çir kinî?

-Deng mekin. Kem îşev gi henî pacê Hesnûnê da birînî.

Vana çûn. Ki îvar bû. Vana şîv mîva xwa xwar nexwar. Vana çûn paca Hesnûnê pîs kirin.

Go: “Jinik teştê bide ber. Jinik ti teştê bide ber. Bide se êrgund.”

-Kulfet em vî guyî çir kinî.

-Ti deng meke. Ti here di telîsa mi ra ûne. Di telîs anîn, tiji kirin, dan derva ûw. Hînî ki şefaq mefaqê lê nexistûw.

Go: “Jinik ti were hînî ki siwada zû ye, hînî ki kes ranewûye kem barkinî. Ke berim herim.

Bar kirin ûw bi welatkî da çû. Nirî ki tuww êvare niva, ro mo çû ava, mixurbe erd helçînîya. Nirî ki kawrankî derkê danîye.

Go: “Welle ez ê hember vî kawranî dînim.”

Barê xwa wergerand wir ûw. Kerê xwa li derkê girê da. Qûna xwa da ser tuwê xwa. Hêl klama kir.-Hesnûnî zakirûw jî- Hêl klama kir. Kawarancîya mêzi kir ki law sewtik tê ye. Va çi sewtik xwaş e. Guh dan ser.

-Kem axayî xwa ra bêne. He sewtik li vir tê kem henî.

Çûn gotin axa:

-Sewtik hung xwaş derê han tê. Merîyekî barê xwa li derê han danîye.

Di merîya ra go: Herin bên; “Îşev were me ra klama bê.”

Di meri çûn. Î li wir e. Ser barê xwa rûniştîye, klamê xwa diwê. Banê kirin.

-Law ti kî yî kawarancîyo? Ti çir dikî ? Hele ka ti kî yî? Ku da têy? Ku da diherî?

-Here law îşê xwa mêzi kin. Çi ye, we xêr e?

-Axayî me got “ were îşev li me ra heta siweda sewî ki xewê me nê klama biwê”.

-Werim we ra. Sewê ki hen barî mi berin. Ên zanin barî mi çi ye?

-Barî te çi diwe hew zane. Em ê barî te bidinî.

-Na, e nême.

Çûn axê xwa ra gotin. Axê go here bê: “Barî te çiwû, em ê şûnê barkî di bara tedinî, sê bara tedinî”. Çûn

Gotin: “Were îşev me ra klama biwê. Em ê şûnî barkî di bara, sê bara te dinî.”

-Malî mi gi malî tîfariq e. Ne tê kirînê, ne tê firotinê.

-Em ê te dinî. Ki barkî te çû em ê dudiya te dinî.

Hesnûnê heta destê siwê lê ra klam gotine. Destî siwê gotîye:

-E carê nerim, ser di barî xwa nedim.

-Bira di kurik dêl te va hen.

Hema di kurika çûye, lê mêzi kirîye ki telîsê xway wira ne.

-Barê te yî li wir e.

Vaxta ew bûye, ki kawran barke. Va tê. Tê ser barê xwa. Zane ki barî xwa çi ye.

Go: “Heylo, heylo, heylo!” Li xwa xist. Gîrîya.

Ekî go axa:

-Ew feqîray î digrî, dike xwa bikuje

-Ha! Hele dudi baz din ka xêr e?

Dudi çûn.

Hesnûnê go: “He werin. Mi go e nême terkê barî xwa nakim. We çi kir serî mi. Hele mêzikin ki barî mi çi ye? Barê mi birine. Va gemora kirine şûnê.”

Hurdi mêrika şûn da baz dan, hatin.

Go axa: “-Hal medê xwa ha ne.”

- Pê ra bên deyng meke. Ne li xwa xe, ne ew bike. Were di qantir xwa bere here. Î wî jî gi pirti ye. Barî xwa li wir biterikîne, kerî xwa jî biterikîne. Were, peva qantira, di qantir xwa bêr va bere here.

Hesnûnê di qantir xwa anîn. Gi qumaş e, barî xwa. Anî hat. Xwa ra yawiş yawiş hat mal. Şev lê reş bû. Bi şev giheşt ber qêpi. Ban kir.

Go: “Jinik, jinik!”

-Ha!

-He rawe, rawe.

Rawû qapi vekir.

Go: “Heso te xêr e?”

- Lêy he were xwa bide ber bêr, kem barî xwa dîninî. Ti çi diwê “Heso te xêr e”.

Barî xwa datînin ûw. Hes tê xêni, vêdêsê. Nan manê xwa dixwe. Radimedîn. Siwe diwe. Radiwin bêr vedikin. Ho ho ti çi bixwazî ew hê. Li kinca ra pirtî tê dê, di bar in.

Diwê: “”-Jinik here herinê malê keyê ûne. Kem bipîvinî.”

Jinik dihere herinê tîne. Jinikê çû herin anî, pîvan, pîvan, sax kirin, pirtîyê xwa rakirin dan hev, dan xanîyê xwa. Hen jî herinê şidand, şidand.

Go : “Bere here malê keyê ra.”

Bir çû mala keyê ra.

Go: “Werê herina we.”

Lê nirîn.

Go: “Va çi ye we li herinê şidandî ye?”

- Hesnûnê çû va tişt a anî me pê pîva. Me hen jî li we ra anî.

Dîsa gundîya ban hev kirin.

-Hesnûnê va tişt a çû li ku anî? Va pirtîya tinê li va dena. Kem henî.

Hatin Hesnûnê gihêştin hev.

-Law Heso te çû va li kû anî? Henî me de.

-Nalet no! We rî, rî we hindik rî. We barik rî, mi di bar anîn. We çar bar rîwûna min ê heşt bar bianîna.

- Ê lê em çir kinî?

-Tî li ti dera mihlin, gî top kin. Siweda zû di bajêr kevin. Ê bikirin mi bir bajêr gi firot.

Vana li dor xanîya, li ti dera nihştin. Gênd gemora xwa top kirin. Li xwa ra rîn ûw, siweda zû î ki desmalik xwa, î ki turkî xwa, î ki çî gemor xwa top kirî kir. Birin çûn bajêr. Nav çarşîyê çex bûn, çûn hatin.

-Filan ha, filan ha filan, wenê ha wenê!

Bajar lê giheşt hev, li nav xwa kir der.

-Qulê va radano, gû li bajêr tinê we gû anîye bajêr.

Nav xwa derxistin. Revîn hatin mal.

Gotin: “Hesnûnê îşkî di jî kir serî me. Ka em ê çir kinî?”

-Law Heso! Em çûnî me şenekirî ti tiştî ûninî. Te çitol anî?

Welhasilî çex kirin, dor kirin.

Gotin: “Em îşkî serî Hesê kinî, Hesê ar bi kezewa me xistîye. Kem Hesê bigrinî di çîwêl kinî, destê me nanê kem bikujinî. Benî dêv jî girêdinî ser ra ûw a li dîharî ferêt bihlinî.”

Hatin Hes girtin, kirin çîwêl, dev ser ra girêdan, êkî pê ket ber birin çûn rû kenarê ferêt danîn. Hesî çîwêl dê, newêre bilive ki bilive dike ferêt keve. Nirî ki şivankî;

Go: “Ey hê, ey hêêêê. Ey kiş kir ûw hat se avê.”

Hesnûn di çîwêl da ban kir.

-E naaaakim. Ûn mi bikujin jî e naaakim.

Şivên go: “ Va çi sewt e, hele ke ber avê da hem”.

Ber avê da hat ki merîyekî çîwêl dê , a tim diwê “e nakim.”

-Law te xêr e, ti kîy, ti cin î, pêrî yî, ti çiy di vir da?

-Law e jî merîyek im, çi me! He çîwêl ser mi veke.

-Te xêr e?, Vir da çir dikî?

-Diwên kêşkê axê bike. E diwêm e nakim. Loma e anîme dîharê ferêt kirime çîwêl ke têkevim ferêt. E kêşkê axê nakim.

Şivên go: “Ke şûna te kevim. Ez ê kêşkê axê bikim.”

- Diwe.

Şivan ket şûnê, Hesnûnê dev ser ra pêt girê da. Şivên ban kir.

-Ez ê biiikim!

Tim ban kir. Go ez ê biiikim. Hen çûn dîharê ferêt.

Go: “-Ka Hesnûn ketêye, neketêye. Çûn ki î tim diwê “ez ê bi kim”.

Gotin: “Kunê va rado, î tim “diwê ez ê bikim”.

Leqmik lê xistin, tot ferêt kirin. Hesnûn jî rawû paş pêz gerî, bir çêrand îvarî kerîye pêz anî hat mal. Anî nav gund.

-Ey hêy, ey hêy. Kiş kir bir ber qêpi.

Gundîyê go “vî namûsûzî, hele li vê bêtarê, vê carê jî çû kerîyek pez anî”

-Law Heso te va kerîya pêz ku anî?

-Namûsizno we e kirim kenarê, we e avitiwûma ortê pirûw. Hîn minê pir bianîya.

- Lê em çitol bikinî?

- Welle hen xwa bavên, ûnê henî xwa ûnin. Siweda ke we berim tengê pêz. A xwa çengê kin, we kîcanî çiqesî xwa derxist.

Çûn, gêncaxwa avitê, dabiriqîn bini, xwa avitê dabiriqîn bini. Ha derê, ha derên.

-Çir dîkin çima der nê?

-Li pêz digerin, pêz tînine.

Lawikê pîrkê jî hewû, tek êkûw. Wî jî xwa avitê. Kir bilq, bilq dabirî binê ferêt.

Dîya lêwîk go: “Diwê çi Hesê mi?”

Go: “Diwê etêy e ê qoç ûnim, ê kol ûnim?”

Go: “Bê na na lawimî ê kol ûne, ê qoç ê kincikê me biqetînin.”

Go: “Herê, herê, ê ûne.”

Gund gi fetisî Hes li şûna gund rûnişt.

Çîroka mi çû dîhara rahme li dêw bavê guhdara.

Berhevkar: Haşîm ESEN

Çavkanî: Hanîm ESEN

Pîşe Kewanîya Malê

Temen: 72

Perwerdehî: Nexwende

Herem: Gundê Êmeran/ Kûmîr.

Dîrok: 19/10/2018

Pîr û Rêvi

Çi hewûye çi tinewûye Pîr kuw keçikkê va hewûne. Pîrê keçika xwa daye derik dût. Gotîye ke carê dû herim. Rawûye rokê kulor kirine, kufte kirine, şîvin mîvin kirine dû keçikê çûye. Çûye çûte rêk wang pir dût bûye çûye. Di rê pêşîyê hatine. Wê alixê rêvîk hatîye pêşîyê

Gotîye: Tûrî tey giran e Pîrêy, ûne e tûrî tel te helgirim.

Pîrê jî gotîye: Na, na tûrî miy sivik e. Ezê tûrî xwa xwa helgirim

Gotîye: Na, na va rêna pêşi dighê hev. Tur kî mide ez ê hilgirim te ra rîyê pêşi digê hev. Ez ê li wira jî te dim.

Tamam gotîye. Pîrê tûr dayêye uw. Rêva tiştê xwa xwarîye uw. Tiji kevir kuçik uw tûr da mîz kirîye uw....bîrîye daye pîrê. Pîrê tûr avitîye pî xwa uw.

Gotîye: Va tûray giran bûye ki mi day çîma ha sivik bûye?

Mêz kirîye ki tiştî tûr diherîye. Pêçîyê xwa vexistîye kirîye devî xwa.

Gotîye: Va gi rûn tiştê ki mî kirî şîvê bini derîye. Çûye cem keçikê uw, ki mêvanê keçikê hene uw.

Keçikê gotîye: Ooox dîya min ê hatîye, xelî tişt jî anîyê, e mêvanê xwa ra ûnim. Tûr vekirîye ki tûr gi kevir kuçik uw gûye rêvî tê da ye.

Gotîye: Anêy va tiştê hendê me hewû çîma te va tiştê anîye?

Neyse pîrê gotîye rêvîyo niha ez ê te bûnim. Çûye vegerîyê uw. Çûye derkê rêvî dîye uw boçik lêkirîye uw, boçik birîye mal uw mori mircanka xemilandîye uw boçik xêni da darxistîye.

Rêvi hatîye ser rojinê ban kirîye.

Gotîye: pîrêy, pîrêy dû mi mi de. Hevalê min ê mi ra diwêne “dû quto bin dû hilkuto”.

Pîrê gotîye: here şîrnî mi ra ûne.

Rêvi çûye, gotîyê: bizinê şîr mi de. Bem pîrê ra. Bira pîr dû mi mi de. Bira hevalê mi newên “dû quto bin dû hilkuto”.

Bizinê gotîye: here çilonî mi ra ûne.

Çûye darê ra gotîye: darê çilo mi de, bem bizinê ra, bizin şîr mi de bem pîrê ra, pîrê dû mi mi de bira hevalê mi newên “dû quto bin dû hilkuto”.

Darê gotîye: here avnê mi ra ûne.

Çûye kanîyê ra gotîye: kanîyê avnê mi de, bem darê ra, dar çilo mi de, bem bizinê ra, bizin şîr mi de bem pîrê ra, pîrê dû mi mi de bira hevalê mi newên “dû quto bin dû hilkuto”.

Kanîye gotîye: bira keçikê mala mîra wen ser mi bireqisin hînga ke avê te dim.

Keçika ra gotîye. Keçikê gotîye;

Terlika mi tinê terlikkê mi ra ûne.

Tê. Dukancîra gotîye terlikkê mi de.

Dukancî gotîye hêkna mi ra ûne.

Mîrîşkê ra gotîye: mîrîşkê hêka mi de, bem dukancî ra, dukancî terlika mi de, bem keçika ra, keçik ser avê bireqisin, kanî avê mi de, bem darê ra, dar çilo mi de, bem bizinê ra, bizin şîr mi de, bem pîrê ra, pîrê dû mi mide bira haval mi newên “dû quto bin dû hilkuto”.

Mîrîşkê gotîye: inca ti herî tenenî mi ra ûnî.

Çûye derkê ki ovak ha dûz bûye ki ekî wir cot dikîye.

Gotîye cotkarîyo: tene mi de bem mîrîşkê ra.

Cotkarî gotîye: e nadim.

Gotîye : e çirkim ke lê bistînîm. Çûye ketîye paş derkê ban kirîye gotîye: cotkarîyo bireve çîyê girî dû yê ê çûkî li pêşîyê ye, î tê. Bireve! Cotkarî tene cih hiştîye, revîye çûye. Vî tene birîye daye mîrîşkê. Mîrîşkê hêk kirîye birîye daye dukancî. Dukancî terlik daye, birîye daye keçika, keçik se avê reqisîne, kanîyê avê da ye, av birîye da ye darê, darê çilo daye, birîye daye bizinê, bizinê şîr daye, birîye pîrê ra. Banê kirîye ki pîr tinê.

Gotîye: pîrê ti li kuy?

Gotîye : e yî nav êrd im.

Gotîye: Mi şîrê te anî e çirkim?

Gotîye: Şîr bere bide bin lewanê uw dûyê te jî rojinê da dar da ye bere.

Gotîye: Temam. Çûye uw. Gotîye madam ki te li mi ha kir pîrê. Şîrê xwa vexarîye, tasê da mîz kirîye, daye bin teşte ûw dûyê xwa birîye.

Gotîye : Dû xwa jî bi beniştî beniştê va xwa va bizeliqîne wekî di nawe.

Beniştî beniştê kirîye uw xwa va zeliqandîye çûye nav hevala. Heval vir va wir va gotîye:

-Te va dûyî xwa yî ha rindik kû anîye şunê me ra bê kem jî henî yekî xway ha rindik ûninî.

Gotîye: wen ke we ra bêm. Birîye çûye ser gol kê.

Gotîye: mi vi ra derxist.

Ekî xwa avitîye.

Gotîye: lux lux fetisîye.

Gotîye: va diwê çî?

Gotîye: diwê wen virî tiji ye. Ê di jî xwa avitêye. Wî ji weng kirîye. Kî xwa davê weng dike. Gi xwa tek tek davênê. Rêvi tenê maye

Çîroka mi çû toqatê, rahmel bav dîyê.... e.

Berhevkar: Haşîm ESEN

Çavkanî: Gafure Ulaş.

Pîşe: Kewanîya Malê

Temen: 35

Perwerdehî: Dibistana Seretehî

Herem: Gundê Balixa/Geler/Sincik

Dîrok: 19/11/2018

Qeraşê Ber Aşan

Çi hewiye çi tunewiye, rîvîk û qeraşîk hewiye. Rûkê rîvi qerêş ra diwê, were am ta bi kaçika paşê ve bizewicîn! Qeraş diwê, halê me li ûrtê ye, em li ku kaçika paşê li ku! Rîvi qerêş ra diwê, wî îşî ti mi ra bihêle! Qeraş diwê tamam!

Siwetirê, rîvi qerêş ra diwê rawe em dikin harin keçika paşê bixwazin, xwa hazir ke! Qeraş diwê, az barê de hazir im, hare ware kincikî min haya, aw î jî li min e. Rîvi diwê, ti rawe hele am ê îşikî bikin! Qeraş radiwe bi rîvi va dikevin rê, tèn ber çakê. Rîvi, qerêş ra diwê kincê xwa derxe! Qeraş, diwê rîvi, ti şaş bwîye, çima a kincên xwa derxim, am ê xwa li çayê xin harin! Rîvi diwê, qeraşê mi ti guhu mi de, kincê xwa derxe! Rîvi dewam dike û diwê, qeraş, binir taza az ê harim mala paşê az ê biwê m walle em rê ve dihatin ku warin mala wa, kincên havalê min çayê da çwîn. Ku mala wa hawî, hwîn bikanin kincina bidin, az berim havalê xwa ra. Paşa diwê tamam! Paşa radiwe kincini fûdîl dide rîvi, diwê, ha va kincan bere havalê xwa ra bira li xwa ke! Rîvi paşa diwê dixwaze bira çend peyayên mi jî rev te warin! Rîvi paşê ra diwê, garak nake, diwê hwîn tanê hespikê bi mi din bas a. Paşa wê ra jî diwê tamam û hespikê didin rîvi. Rîvi, haspê û kincan tev digire û tarra hinda qerêş. Qeraş wexta ku dihwîne rîvi bi kincên xwaş û haspik dîri va hat, şaş diwe! Qeraş diwê, havalê rîvi, te av kinc û haspa li ku hanîn? Rîvi, hal meselê pê ra diwê.

Qeraş kincan xwa dike û şun da, pir pê camêr diwe. Paşê li haspê siyar diwe û bi rîvi va dikevin rê. Wexta tarin digîjin mala paşê, paşa dihwîne ku peyakî tîye ti çitlî biwê werg e! Rîvi û qeraş tèn ber qûnaxa paşê li haspa xwa dadikişê. Paşa, qerêş ra diwê ti derbasi quncê jûrin we. Qeraş tarra rwîdine û pir narre nan tê. Wexta ku nê dixwin, qeraş gûşt dixwe û hestiyên jî dikute bin balîvê. Paşa rîvi ra diwê çima wa hestiyên dikute bin balîvê? Rîvi diwê li malê pisik misikê wî hana, wê sewê aw wer dike. Axa e'mel dike. Nanê xwa dixwin û şun da, rîvi kaçika paşê sewa qerêş dixwaze. Paşa diwê çima ne, diwê az ê li wa rintir wekî din kê bihwînim!?

Qeraş û rîvi, kaçika paşê digrin û tarin. Rê va, qeraş nîzîkî rîvi diwe û diwê: Havalê rîvi, ma kaçika paşê girt lê am ê vê berin têkin ku? Ma ne xani ye ne qûnax e! Rîvi dîsan diwê, ti wî îşî mi ra bihêle, az ê hal kim! Qeraş diwê tamam! Pir narin rîvi tarra qerêş ra diwê a dikim pîşiyê da harim haziriyê bikim sewa we. Qeraş diwê tamam, diwe! Ti hare am ê jî hîdî hîdî warin.

Rîvi tarra derkê ku, pirikik li bere qûnaxika mazin li ber naxirika mazin a. Rîvi nîzîki pîrê diwe, diwê xaltiyê, va naxir û qûnaxa ê kê ne? pîr diwê, ê min in, xêr we?! Rîvi diwê xaltiyê, askarên paşê vir ve tene, çi teye pîşiya wan dikujine. Pîrik ditirse, diwê, rîviyê min ûxil, az çir kim? Rîvi diwê, xaltiyê, wara têkeve bin vê gidişê. Tarra dikava bin gidişê şun da, rîvi tarra arikî berdide gidişê û pîrê dişewitîne. Paşê naxir û qûnaxa pîrê jî xwa ra digre. Rîvi diwê, me şina manê jî hal kir, maka az ber vi qerêş harim mîzginiyê bidimê. Ber vi qerêş tarra, diwê, qeraşê mi, mi şina manê jî hal kir. Qeraş pir şa diwe û kaçika paşê digrin tarrin dikavin qûnaxa pîrê.

Rûkê, rîvi diwê ha naka, a xwa carê mirin nim hala vana diwên çi!? Rîvi tarra xwe mirin dine. Qeraş dihwîna ku rîvi eyni mîna miriyan dirêj bwîye, tarra diwê rîviii, rîviii! Li rîvi dang nayê! vir da dike wê da dike li rîvi dang nayê! Diwê te dî, rîvi miriye! Bangi jinika xwa dike, diwê, jinê ‘paçan bigre destan, bûçê bigre bavê kaşan!’ Jinik tarra pêç digre ku pê bûçika rîvi bigre bavê, rîvi radiwe ser xwa û diwê: “Qeraşê beraşano, mi ti kir êniştê paşano, taza jî ‘paçan bigre destan, bûçê bigre bavê kaşan!’ diwê dême werg a hêê!” Paşê kaçika paşê diwê dêma az bi qeraşikî va zewicîme!? Radiwe ku su hare, rîvi tarra pîşiyê, diwê ku da? Diwê te bi xwa negût “qeraşê beraşano mi ti kir êniştê paşano”. Rîvi diwê, xwîşka min, em birê hav in, wexta am li hav diqarên, am her tiştî hav re diwên! Ti çime dike rawe sewa wê qisa mi su hare!? Kaçika paşê e’ mel dikevadigere tê mala xwa.

Rûkê rîvi rastî dimire, bin dikeviyê, kurm dikevinê lê qeraş nawêre tiştikî biwê!..

Berhevkar: Eyüp SUBAŞI

Çavkanî: Asmar SUBAŞI

Pîşe: Kewanîya Malê

Temen: 63

Perwerdehî: Nexwende

Herem: Gundê Açme/Aldûş

Dîrok: 12/10/2018



T.C.

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANA BİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

ADİYAMAN KÜRTÇESİNDE EDATLARIN KULLANIMI

(Sincik, Gerger ve Kömür Bölgeleri Örneğinde)

Haşim ESEN

16711008

Danışman

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mardin- 2019

T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
İNTİHAL RAPORU

Tez Başlığı

DAÇEK DI DEVOKA SEMSÛRÊ DE(Nimûneya Deverên Sincik, Aldûş û Kûmîrê)

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam 130 sayfalık kısmına ilişkin 11/07/2019 tarihinde tez danışmanım tarafından turnitin adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orjinallik raporuna göre, tezin benzerlik oranı alıntılar dahil % 5

Uygulanan Filtrelemeler:

Kaynakça hariç

Alıntılar dahil

5 Kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç açıklamalar

Açıklamalar.....
.....

Mardin Artuklu Üniversitesi Turnitin adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Haşim Esen

Öğrenci No: 16711008

Tarih ve İmza: 11/07/2019

Programı: Kürt Dili ve Kültürü

Statüsü: Yüksek Lisans

Danışman Onayı

Prof. Dr. Abdurrahman Adak



A.B.D. Başkanı Onayı

Prof. Dr. Abdurrahman Adak

